

HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

- * Helbest - “Çardehê Nîsan” - Ehmedê XANÎ.....
- * Rexne û Rexnegirî - Mehmed UZUN.....
- * Bilbil û Gul — Oscar WÎLD.....
- * Berhemkarî Huner — Lokman POLAT.....
- * Mîr Sureya Bedir - Xan û XOYBÛN — B. GORAN.....
- * Romana Gerîla û Serîhildanên Neteweyî
- * Nivîskarê Navdar : Yaşar KEMAL — A. MÎRAN.....
- * Edebiyata Netewî û Rola Zimên - N. ZAXÛRANÎ.....
- * Hevpeyvîn Bi Nivîskar Medenî FERHO re.....
- * Rexneyek Li Ser Pirtûka Sîyamend û Xecê - A. DURAN.....
- * Antolojiya Kurdî Derket / Nivîskarên Sirgûnê - S. ŞAHÎN....
- * Rojnamevanî - Nivîskarî - Gabar Çiyan.....
- * Munaqeseyek Nûh, Balkêş û Girîng û Gelek Nivîsên Din.....

Hejmar / No: 2



Sal / Year : 1995

HEL WEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdî

Utgivare

Modern Kultur Förlaget

Xwedî

Weşanên Çanda Nûjen

Birêvebirê kovarê

Lokman POLAT

REDAKSIYON

N. Zaxuranî

Gabar Çiyan

Mehabad Kurdî

M. Yilmaz

Dawê Xanê

Lokman Polat

Alîgir

B. Goran / Xêzan Şîlan

Hejmar : 2

Sal / Year : Kanûn - 1995

Çap : Baran Trykerî

Abonetî

Salek : 150 Kr.

Postgîro : 9 13 31 — 9

ISSN — 1400 - 9404

Berpîrsiyariya her nivîsê, ya
nivîskarê/a wê ye.

Navnîşan / Adress:

Tensta Alle 43 - 2tr.

16364 Spånga /Sweden

Tel / Fax:08-7618433

NAVEROK

* 2 - Bi Xwendevanan re.....

* 7 - Helwest - G. Çiyan.....

* 9 - Berhemkarî - L. Polat...

* 11 - Munaqeseyek Nû.....

* 13 - Antolojiya Kurdî.....

* 15 - Siyabend û Xecê.....

* 18 - Edebiyata Netewî.....

* 23 - Helbest - A. Xanê.....

* 26 - Bilbil û Gul - O. Wild...

* 31 - Rexne - Mehmed Uzun.

* 33 - Nivîskarê Sirgunê.....

* 34 - Pîrsgirêkên Ziman.....

* 41 - Mîr Sureya - B. Goran..

* 44 - Berhemên G. Çiyan.....

45- 80 -Û Gelek Nivîsên Din....

Kovara **HELWEST** ji alî xwendevanan ve gelek baş hate dîtîn. Hate ecibandin.

Gelek xwendevan wexta ku kovara **Helwestê** girtin destê xwe, gotin; Çi kovareke xweş e. Xwendevanekî kovara **Helwestê** bi hevala xwe ya **Swêdî** nîşan da, keçika Swêdî kovarê girt destê xwe lê temaşe kir û got; **Fînt**. Yanê xweş e.

Ji bo naveroka kovarê jî xwendevanan raya xwe diyar kirin û gotin; Ji alî naverokê ve jî başe. Hinek xwendevanan jî gotin “divê rûpelê wê zêde be.” Me jî daxwaza xwendevanan hanî cîh û rûpelên kovarê zêde kir. Ev hejmara Kovara **Helwestê** 80 rûpel e. Ji bo kovarê gelek nivîs hatine. Em ji yên ku nivîs şiyandine re gelek sipas dikin. 80 rûpel qîmê hemû nivîsên hatî nake. Em dê nivîsên din di hejmarê sêyem de biweşînin. Li benda hejmarê sêyem bin.

BI XWENDEVANAN RE — Xwezayî (Tebîet, Natur) valahî qebûl nake —

Xwendevanên Hêja

Xwezayî valahî qebûl nake. Divê ew valahî bê tijîkirin. Kovara **Helwest** bi weşana xwe dixwaze hindik be jî valahiya munaqêşe û rexneyên edebî tijî bike. Helbet ev kar tenê bi kovara **Helwestê** nabe. Divê kovarên din jî hebin û bi giranî li vê pirsê mijûl bibin. Weşana kovara **Helwestê** di vê hêlê de hewldaneke destpêkê ye, pêngavek e.

Kovara **Helwest**, ji alî xwendevanan ve baş hate dîtîn, hate ecibandin. Ji niha ve gelek aboneyê kovarê çêbûn. Kovara **Helwest** hejmara duyem bi naverokeke xurt û piralî ve tê weşandin. Ji bîsfî zêdetir nivîsên pircure di vê hejmarê de hene. Giraniya nivîsan li ser gelek mijarên çandî û babetên edebî, munaqêşe û rexne ne. Lê, digel nivîsên munaqêşe û rexneyan gelek nivîsên ku xwendevan jê tiştên nûh fêr bibin hene. Helbet mirov jî nivîsên munaqêşe û rexneyan jî gelek tişt fêr dibe. Lê, nivîsên li ser pirs û problemên zimanê Kurdî jî gelek girîng in û dê di her hejmarên kovara **Helwestê** de nivîsên weha îlmî-zanîstî bêne weşandin.

Di her hejmarê kovara **Helwestê** de bi nivîskarek Kurd re dê hevpeyvîn hebe. Di vê hejmarê de bi nivîskar Medenî Ferho re hevpeyvîn heye. Hevpeyvîn li ser rewşa edebiyata Kurdî ye. Roman-

Bi Xwendevanan re

nivîskar û helbestvan **Medenî FERHO** bersîvên pirsên me dide. Kovara **Helwestê** bi romannivîserê hevdem Mehmed Uzun re hevpeyvînek dirêj çêkir e. Em dê vê hevpeyvînê di hejmara sêyem de biweşînin. Portreya nivîskaran jî di vê hejmarê de berdewam dike. Hejmara çûyî de nivîskarê navdar **M. Emîn BOZARSLAN** hebû. Di vê hejmarê de jî nivîskariya **Gabar Çîyan** û berhemên wî heye. Di hejmarên pêşerojê de em dê berhemên gelek nivîskaran bidin danasînê.

* * * *

Em dê di beşa danasîna pirtûkên edebî de du cûre pirtûkan bidî danasînê. Pirtûkên ku ji alî nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê pirtûkên xwe bi zimanê tirkî nivîsîne, yên din jî pirtûkên ku hem nivîskarên wan Kurd in, hem jî pirtûkên xwe xwerû bi Kurdî dinivîsînin.

Di vê hejmarê de me pirtûka nivîskarê navdar **Yaşar KEMAL** daye danasînê. Ev pirtûk bi zimanê Tirkî hatiye nivîsandin. Yaşar Kemal dibêje: *"Nivîskar bi kîjan zimanê binivîsîne nivîskarê wî zimanê ye."* Em berhemên ku nivîskarên wan bi eslê xwe Kurd in, lê pirtûkên wan bi zimanê tirkî hatine nivîsandin, di nav edebiyata Kurdî de nahesibînin. Mexseda me ya danasîna van pirtûkan ev e ku, bila xwendevan bizanibin filan nivîskar bi eslê xwe Kurd e û bi zimanê tirkî berhemên edebî nivîsiye û naveroka berhemên wî/ê jî li ser van bûyeran hatine honandin.

* * * *

Di hejmara duyem a kovara **Helwestê** de nivîsên çend nivîskarên nûh hene. Ev nivîskarên ku di hejmara yekemîn de nivîsên wan tunebû û di hejmara duyemîn de nivîsên wan hene ev in: **A. Mîran, B. Goran, Merwan Jîndan, Xêzan Şîlan, G. Çîyan, S. Merwan, M. Bozan, A. Duran, R. Rewşen û D. Xanê** ne. Em jî bo nivîsên wan jî wan re spas dikin û em jî bo hejmara sêyem jî li benda nivîsên wan in.

* * * *

Anonsa nûh derketina kovara **Helwestê** di rojnameya hefteyî **RONAHÎ** û di **ROJê** de derket. Bi îmza **Merwan JÎNDAN** nivîsek danasînê jî di Roj-

Bi Xwendevanan re

nameya ROJê de hate weşandine. Di rojnama rojane OZGUR POLÎTIKAYê de jî nivîsek danasînê hate weşandin. Di kovara NÛBIHAR û rojnama WELATÊ ME de jî nivîsê nûh derketina kovara HELWESTê hat e weşandin. Em ji van hemû kovar û rojnameyan re spas dikin. Em ji bo nivîsa danasîna kovara Helwestê ji Merwan Jîndan re jî sipas dikin. Em nivîsa danasîna kovara Helwestê a ku Merwan Jîndan nivîsandibû û di rojnameyên Kurdî de derketibû di rûpela dawiyê de diweşînin. Di rojnameya rojane Ozgur Politikayê de jî anonsa kovara Helwestê û ji bo danasîna kovara Helwestê nivîsek bi îmza Abdurahîm AYAZ hate weşandinê. Nivîsek baş bû. Em ji bo nivîsê ji Abdurahîm Ayazî re û ji rojnameya Ozgur Politikayê re sipas dikin. Radyoya Kurdî jî di bernameya xwe de kovara Helwestê da danasînê. Em ji xebatkarê radyoyê re jî sipas dikin. Hemû weşanên Kurdan biratiya xwe bi kovara Helwestê re nîşan dan. Ev helwesta wan ya dostaniyê me dilşad kire.

* * * *

Kurd ji rexneyan hez nakin. Dijî rexneyan in. Bi qasî ku li dijî rexneyan in, ewqas jî ji rexneyan ditirsin. Piştê ku kovara Helwest hate weşandin, hinek kesên malûm dest bi dedîqodûyê kirin. Ji wan re tam mijarek vebûbû ku devê wan vala neseke, dest bi dedîqodûyê bikin. Dedîqodiyê wan têne guhê me, lê em nagirin cidiyê. Em guh nadin rexneyên ku bi gotinan û li pey me têtê gotin. Rexneyên weha sewiya wan nîşan dide. Rexneyên ku bi nivîskî bêne kirin, ku em hewce bibînin em dê bersîva wan bidin. Lê ,ji rexneyên bê sewiye re bersîv nedayin bi serê xwe helwestek e. Hewce nîn e ku mirov bersîva dedîqodiyên çavnebar û hesûdan bide.

* * * *

Di nav hinek ronakbir û nivîskarên Kurdan de dîtinek ecêp heye. Ew hemû tişfî li gor pîvana zimanzaniyê an jî zimannasiyê dinirxînin. Li gor vî dîtina ku têtê parastin, divê îla her nivîskar zimannasek be. Heger ew

Bi Xwendevanan re

zimanzan an zimannas nebe divê nivîs nenivîse. Her nivîskar hewce nîn e ku zimanzan be. Gelek nivîskarên tirk yên navdar zimanzan nebûn. Îcar rewşa zimanzanên Kurd jî li holê ye. Çend berhemên van zimanzan heye ku xwendevan û nivîskarên ne zimanzan jî wan feyde bibînin. Panela li ser zimên tête amadekirin, lê kesên ne zimanzan beşdarê panelê dibin. Tiştên ku di panela zimên de tête gotin qaşla gozê tijî nake. Ev rewş jî dide xuyakirin ku bi gelemperî rewşenbîr û nivîskarên Kurd û bi taybetî jî zimanzanên Kurd xitimîne. Tiştên nûh naafirînin. Di şûna xwe de dijmêrin û wek gerînekê di der û dora xwe de diçin û tîn, asoya wan her diçe teng dibe. Di rojnameyekê Kurdî de têt e gotin ku: *"Li welatên Ewrûpa Kurd, wext ji pêşxistina çanda xwe re jî, bi awakî firehî, vediqetînin. Yek ji van xebatan, derxistina kovara.."* ne. Lê, yên ku jî karên weha re wext vediqetînin bi piranî ew kesên ku bi amatorî vê karî dikin û dimeşînin. Yên pîspor di karên xwe yên sexsî (kesanî) de ne. Wexta wan jî karên çandî, edebî û zimanî re ewqas tune ye (!).

* * * *

ji bo nûhderketina kovara Helwestê gelek nas û dostan nameyê pîrozbahiyê şiyandin û telefonê vekirin derketina kovarê pîroz kirin. Yên ku bi telefon û nameyan me pîroz kirin re em gelek sipas dikin. Wan bi helwesta xwe ya dostanî em dilşad kirin. Em jî bo vê helwesta wan ya dostaniyê jî wan re sipas dikin. Dîtinên van dostan li ser kovarê bi kurtahî ev in:

- 1- Kovarek weha pêwîst bû. Di vê hêlê de valahiyek hebû. Ev gaveke baş e ku hatiye avêtin.
- 2 - Edebiyata Kurdî hewcedariyê kovarek edebî bû ku têde pirsên li ser edebiyatê bê munaqesekirin.
- 3 - Di sernivîsa "HELWESTA REXNEGIRIYÊ" de dîtinên rast haniye zimên. Divê kovar li ser vê xeta xwe ya îlmî-zanîstî bimeşe.
- 4 -Di nivîsa "Rewşa Nivîskarên Kurd" de bi çavekî realist rastiya nivîskarên Kurd hanibû zimên. Divê li ser rewşa nivîskarên Kurd û edebiyata Kurdî nivîsên weha realist bêne weşandin.

Bi Xwendevanan re

Kovara **Helwest** gelek qîmet dide dîtinên nas û dostan, dîtinên xwendevanan. Van dîtinên giranbiha ji bo pêşveçûna kovara **Helwestê** dê gelek bibe alîkar. Pêşniyazên ku di xala sêyem (3) û çarem (4) de hatiye zimên, em dê bi cîh bînin.

* * * *

Hejmara duyem ji alî naveroka xwe ve ji hejmara yekem dewlemendtir e. Ji alî teknîk û mîzampajê ve jî, ji hejmara yekem baştir e.

Gelek nivîsên edebî û helbestên evînî ji me re hatin. Em dê di hejmara sêyem de cîh bidin wan nivîsan. Nivîsên ku ji kovara **Helwestê** re bêne rêkirin, heger li gor naveroka kovarê be, em dê miheqeq biweşînin. Di hinek kovar an jî rojnameyên Kurdî de (yên ku dibêjin em kovar an jî rojnameyên kulturî, edebî ne) nivîsên ku tu eleqederê wê bi lîteratorê ve tune ye tête weşandin. Kovara **Helwest**, dê hewl neda ku tiştên weha di nav rûpelên wê de bêne weşandin.

* * * *

Em sohbeta bi xwendevanan re bi van gotinên rast didin girêdanê. *"Xwendevan ji bo weşanekê, ji aliyê giringiyê ve di dereca yekemîn de ne. Sebebê derketina weşanekê ew e ku xwe bide xwendin. Piştî ku xwe neda xwendin, tu wateya derketina wê namîne. Ji ber vê yekê, li gorî giringiya xwendevanan, pêwîst e em guh bidin daxwaz û pêşniyazan"* Em her tim ji daxwaz, rexne û pêşniyazên xwendevanan re vekirîne. Ji kerema xwe re daxwaz û rexneyên xwe ji me re bişeynin.

Hetanî hejmara sêyem hûn bimînin di xweşiyê de.

Kovara HELWEST

Têbinî : Redaksiyona kovara **Helwestê** hate amadekirin. Endamê redaksiyonê N. Zaxûranî, M. Yilmaz, Mahabat Kurdî, Gabar Çiyan, D. Xanê û Lokman Polat in. Alîgirê redaksiyonê jî B. Goran û Xêzan Şîlan e. Wêneya Berga Paşîn : Hunermend Fevzî Bîlge çêkiriye.

HELWEST

Gabar Çıyan

Diyar e, di demeke wisan de ku pêwîstiya me bi organên rexneyî heye, derketina kovareke mîna "Helwest", karekî hêja û biwate ye. Gava Helwest, bi helwesta neteweyî rabe, bi firehî û çavekî objektîf nêzikî pirsax rexnegiriyê bibe, dikare bibe meydana munaqeseyan û gelek pirsax têde bê zîmên. "Helwest" dikare bibe dibistanek mutewazî ku rê ji rexnegirên berendam re vebike. Wan perwerde bike û bi tecrûbeyên rexnegiran bike kesên tîr û tîj e. 𐤀

Firehbûn û tengbûna mêjiyan bi azadiya hizirkirinê ve girêdayî ye. Welatên ku mêji têde azad be, pêşketin, piralî çêdibe: Toleransên navxweyî zêde dibin, bûyer ne bi hestan(hîsan), lê bi zanyariyê dihên nixandî, dezgehên wî cihê herku diçe, pêşdikevin û civat, ji awira jiyana sosyalê ve, di nava xweşiyê de xerq dibe.

Welatên ku hizirkirin, bi pevçûn, lêxistin, îşkence, qanûnên qedexekirinê û zindanan ve beramber hevûdu dibe, mêji, nema dikare azad bifikire. Mirov, xwe bi xwe, xwe sînor dike, herku diçe di çarçevaya zagonan de çalakiyên xwe dike, mêji piştî demeke din kor dibe û jiyana wî welatî, ber bi tarî û nexweşiyê ve diçe.

Hizirkirin û kirin bi hev re dimeşin. Hizirkirin, kirina di mêji de ye, anku teorî ye. Paşê mirov teorîyan dixê jiyane. Gelek caran hizirkirin şaş in. Dikare hizirkirin şaş bin. Paşê jî, tiştên li ser wê teorîyê hatibe avakirin, çewt û ne di rê de hatibin avakirin. Şaşîfî, bi rexneyên pozîtîf û zanyarî dikare berevajî bibe. Nexwe rexnegirî û rexne, ji bo pêşxistina civatan rolên piralî dilîzin.

Di welatê me hejmara rexnegiran pir hindik e. Rexnegirî weke karek, weke meslek baş rûnenîştî ye. Lewma ye ku pîvanên me yê rexnegiriyê carna ji adetê derdikevin. Ji bo pîvaneke objektîftir, ji bo rexneyên

Gabar Çiyan – HELWEST

dostanî û zanyarî, pêwîstiya me bi rexnegir û organên rexnegiriyê heye.

Diyar e, di demeke wisan de ku pêwîstiya me bi organên rexneyî heye, derketina kovareke mîna "Helwest", karekî hêja û biwate ye. Gava Helwest, bi helwesta neteweyî rabe, bi firehî û çavekî objektîf nêzikî pirsra rexnegiriyê bibe, dikare bibe meydana munaqeseyan û gelek pirs têde bîn zimên. "Helwest" dikare bibe dibistanek mutewazî ku rê ji rexnegirên-berendam re vebike. Wan perwerde bike û bi tecrûbeyên rexnegiran bike kesên têr û tij e.

"Helwest" û organên rexneyî, divê bi berpirsiyariya xwe zanîbin. Ew li hember gel, welat û dîrokê xwedî berpirsiyariyên mezin in. Bi vê zanîne divê rabin û nêzî pirsan bibin. Ji ber ku me kurdan, car caran di bin navê rexnegiriyê, rexneyên tûj û ne ilmî li hevûdu barandiye. Ev şaşî bûye sedem ku nêzîkbûna me li hev bi derengî bikeve.

Pêwîste rexneyên ramyarî û lêgirtina şeweyên wan baştir bête munaqesekirin. "Helwest" bi sînorkirî jî be, karîbe çih bide rexneyên di vî alî de, yê ilmî dê baş dibe. Lê bi baweriya min, rexneyên politîk di organên partiyên me de piralî tê kirin. "Helwest" gava bêhtir berê xwe bide rexne û pêşniyazên li ser pirsên ziman, çand, tore û dîrokî, dê valahiyê di vî alî de dagire. Bibe meydana demokratîk ku her rexnegir karibin xwe têde îfade bikin. Ji ber ku, ji me re organek wisan serbixwe pêwîst e ku hemû rengên pênuşa sûdan bigihêjin neteweya me.

Derketina kovareke rexneyî pêwîst bû û em bi derketina "Helwestê" kêfxweş bûn. Meydana demokratîk ya "Helwestê", bi rexneyên xwe yê zanyarî û dostanî me hemûyan dê xûrtir bike. Em bi saya organên wisan di vî alî de dê gelek tiştan ji hev fêr bibin û ji tecrûbeyên hev sûdan werbigirin.

Em bi xêr hatina kovara "Helwestê" dikin û serkevtina wê dixwazin.

BERHEMKARÎ HUNER E

Lokman POLAT

Min di kovara çandî, edebî û hunerî "**Berfîn Bahar**"ê de xwend. Nivîskar **Muzaffer Îzgu** 86 pirtûk nivîsiye û weşandîye. Ji van 86 pirtûkan 7 roman, 24 kurteçîrok û 55 pirtûk jî ji bo zarokan e. Piştê xwendina vê nivîsê ez li ser nivîskarên Kurd fikirîm. Tu nivîskarekî Kurd hetanî nûha 30 - 40 pirtûk nenivîsiye. Di nav nivîskarên Kurd de yên herî berhemkar **Mehmed Emîn Bozarslan**, **Mehmed Uzun** û çend kesên din in. (Livir meqседа min nivîsandina berhemên edebî ne. Di hêla berhemên sîyasî de yên ku pirtirîn pirtûk nivîsîne **Abdullah Ocalan**, **Kemal Burkay** û nivîskarên **Rizgariyê** ne.)

Ev herdu nivîskarên edebî di hêla edebiyata Kurdî de xizme-

tek hêja kirine, gelek berhemên edebî afirandine. Nivîskarên din yên Kurd gelek kêr -hinek jê pir hendik, yek an jî du pirtûk- nivîsîne.

Nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê bi zimanê tirkî nivîsîne yê ku herî pir pirtûk nivîsiye **Yaşar Kemal** e. Gelek nivîskarên bi eslê xwe Kurd yên bi berhem ji dehî zêdetir pirtûk nenivîsiye.

Nivîskarên Kurd yên ku xwerû bi Kurdî dinivîsînin, gelo çima berhemên wan hendik in? Gelek sedemên van tiştan hene. Em nikarin yeko yek li ser wan hemûyan rawestînin. Lê ev tişt rastiyek e ku; nivîsandina pirtûkên Kurdî bi pir alî hêj nûh e. Westayê edebîyata Kurdî **Ahmedê Xanî** 300 sal berê bi Kurdî berhem afirandîye, lê ji ber sedemên rewşa welat

Berhemkarî Huner e

nivîsandina berhemên Kurdî ber-dewam nekiriye. Di vê pêvajoya 300 salî de gelek kêr pirtûkên Kurdî hatine nivîsandin. Nivîsîna pirtûkên Kurdî bi giranî piştê salên 1980yê dest pê kir. (Livir mabest nivîskarên Kurdistana bakûr in.) Piştê salên 80yî ta îro gelek nivîskarên Kurd yên nûh derketin. Ev nivîskarên Kurd yên nûh berhemên xwe -pir hendik be jî- bi Kurdî afirandin. Gelek pirtûkên kurteçîrok, helbest û roman bi destê van nivîskarên nûh hatin afirandin. Nivîskarên nûh yên Kurd ku piştê salên 80yî berhemên Kurdî afirandin gelek in. Niha bi giranî jî ev nivîskarên nûh bi Kurdî dinivîsîn. Gelek berhemên edebî ji alî van nivîskarên nûh ve hate afirandin.

Di nivîskariyê de berdewama nivîsandinê gelek girîng e. Nivîskar divê nivîsandina berhemên edebî-Kurdî ji xwe re

bike wek huner. Tim binivîsîne. Henîk nivîskarên Kurd hene, yek-du pirtûk diweşînin û hendî nanivîsîn, pirtûk naweşînin. Divê weha nebe. **Azîz Nesîn** 104 pirtûk nivîsand. Nivîskarên Kurd jî her çiqas bi qasî Azîz Nesîn nebin jî, divê her nivîskarek en hendik deh-bîst pirtûk binivîsîne û biweşîne. Berhemkarî hunerek e. **Huner afirandin e, afirandin du car jiyandin e. Her afirandin jiyandina cîhanek nû ye.** Pir nivîsandin û afirandina berhemên edebî-kurdî, çand û edebiyata Kurdî dewlemend dike, zimanê Kurdî hîn jî pêşte dixê. Nivîskarên bi berhem bi vê kar û xebata xwe, bi keda xwe ya mejî, vatîniyên cîvakî û netewayî tînin cîh. Nivîskar bi hunera bi berhemî di nav cîvakê de rolekî girîng dileyizin. Ji bo hişyarbûna netewan û guherandina cîvakan pirtûk rolekî xwe dileyize. 📖

MUNAQEŞEYEK NÛH, BALKÊŞ Û GIRÎNG

ROJ, rojnameyek hefteyî ye. Di nav xebatkarên **Rojê** de gelek hunermend, helbestvan û edebiyatnas hene. Pirraniya wan jî helbestvan in-şaîr in-. Lê, çi heyf e ku ew helbestên xwe bi zimanê Tirkî dinivîsînin.

Di nav wan helbestvanên xebatkar yên **Rojê** de bi navê **Sefa FERSAL** şafrek heye. Helbestvan Sefa Fersal di rojnameya **Rojê** hejmarê 8an de nivîsek gelek balkêş li ser çand û hunerê nivîsand û munaqeşeyek nûh vekir.

Munaqeşeyên Sefa Fersalî bi girîngî li ser van babetan bû. Çand û huner ji hev cuda ne an na? Di rojname û kovaran de rûpelên çand û hunerê hene, ev rûpel divê tenê rûpelê çandê bin an yên çand û hunerê bin?

Sefa Fersal nêrînê xwe di van mijaran de tînê zimên û bersîva pirsên ku li jor me nivîsîbû, dide. Nivîsa wî bi zimanê tirkî ye. Em dê tenê bi kurtayî qala (behsa) ramanên wî bikin. Ew dibêje; Li ser kelfîma "Çandê" gelek munaqeşe hatine kirin. Mirovên zanyar li ser çandê gelek rawestiyane. Di lîteratora sosyalîstan de bêjeya "Çanda burjuva û proleter", "Çanda sosyalîst", "Çanda neteweyî û navneteweyî" bêjeyên îdeolojîk in û bûne wek tabû.

Di dema me de bêjeya çandê bi maneya xwe ketiye nav rûpelên Ferheng û Ansiklopediyan. Gotina çandê Asoyekî xwe heye. Ji bo berfirehiya wê, di gelek beşan de tête bi kar anîn. Wek; "Çanda rêzanî-siyasî", "Çanda sosyolojîk", "Çanda felsefî", "Çanda Ansiklopedîk".

Li gor **Taylor** maneya çandê ev e: "Çand, wek endameke civakê zanistîya mirovî, bawerî, huner, axlaq, hukuk û ananeya tradîsyona (kevneşopiya) ku mirov dihewise (fêr dibe) ye. Tevbûna van hemû tiştan e."

Di hinek rojname û kovaran de li ser rûpelê tête nivîsandin rûpelê "Çand û Hunerê". Huner bi gelemperî girêdayê bi çandê ve ye. Di hundirê çandê de cîh digire. Ji bo vê yekê mirov hunerê ji çandê veqetîne, ji wê cuda bigire, ew gav huner ji çandê cuda, bi serê xwe tiştek tête fêmkirin. Ji bo vê yekê divê mirov di seriya rûpelan de "Çand û huner" nenivîsîne. Tenê çand binivîsîne. Yanê tenê rûpela çandê.

Marx jî ji bo çandê dibêje: "Çand li hember xilûqandinên xwezayî, hemû afirandinên mirovan e." Çand fêr dike. Çand dîrokî ye û her berdewam e. Çand civakî ye. Û çand qaîde û hoy in, şert û

Munaqesheyek Nû û Balkêş

şût in, sîstemî ne. Çand dige-hurîne.

Piştê nivîsa Sefa Fersal ku di roj-nameya **ROJ** hejmar 8 de derçû bû sedem ji munaqeseyan re. Di destpêka munaqeseyan de gelek mirovan bi devkî be jî, gotin dîtînen Sefa Fersalî rast in. Birêvebirên rojnameya **ROJê** jî dîtînen wî rast dîtînin ku, loma jî di rûpela "**Çand û Hunerê**" de êdî tenê nivîsandin rûpela "**çandî**". Hunerê ji pêşîya "**Çand û huner**" rakir in. Di hejmarên berê yê çûyî de çand û huner hatibû nivîsandin.

Kovara **Helwestê** jî vê dîtîne - nêrîne- ji bo ku rast didît (Me di kovara "**Hêviya Gel**" de tim dinivîsandin rûpela "**Çand û Wêje**" yanê rûpela çandî û edebî) di bin sernavê xwe de nenivîsiye kovara "**Çand, huner û edebî**" Kovara **Helwestê** hunerê ji çandê cuda nekir û nivîsî kovara "**Çand û Edebî**".

Lê, di hinek weşanên Kurdî de hêj jî tête nivîsandin ku kovara "**Çandî, hunerî û edebî**" ne, an jî rûpelên "**Çand û huner**". Mînak: "**Nûdem** kovara hunerî, çandî û edebî"ye.

Wek ku me di destpêka vê nivîsê de jî gote, nivîskarê rojnameya **ROJê** Sefa Fersal nivîsa xwe ya li ser çand û hunerê bi zimanê Tirkî nivîsandibû û munaqeseyek weha vekiribû. Kovara **Helwestê** dixwaze li ser vê babeta çand û hunerê munaqeseyek bi Kurdî veke. Divê

zanyar û nivîskarên Kurd li ser vî tiştî munaqesê bikin. Huner ji çandê cuda ye, an na? Di rûpelên kovar û rojnameyan de tenê "rûpela çandî" bê nivîsandin an ya çandî û hunerî? ji bo nasnameya naveroka kovaran bê nivîsandin kovara "**Çandî, hunerî, edebî**" an kovara "**Çandî û edebî**" divê çi bê nivîsandin?

Kovarên ku di bin navê xwe de dîyar kirine ku "kovara kovarek çandî, hunerî, edebî" ye, divê nêrînen xwe li ser vê mijarê binivîsin. Li ser vê munaqesê çi nivîs ji me re bê (xwendevan jî nêrînen xwe dîyar bikin dê gelek baş be), em dê wan di kovara **Helwestê** de biweşînin.

Em li benda nivîsên we ne. De heydê dest bi munaqesê bikin. Munaqesê zelalî derdixe holê. Rastî di encama munaqeseyan de derdikeve. Heger hûn naxwazin her tişt wek qalibê berê berdewam bike, heger hûn li tiştên nûh digerin û hûn dixwazin **di her babetê de xwenûhkirin** çêbibe, divê hûn gelek tiştan munaqesê bikin. ☞

Kovara Helwest

Mizgîn Li Xwendevanên Kurd

ANTOLOJIYA EDEBIYATA KURDÎ DERKET



Mehmed Uzun bi navê "Antolojiya Edebiyata Kurdî" berhemek nûh amade kir. Ev pirtûk li Tirkîyê di nav weşanên "Tum Zamanlar Yayıncılık" de hate weşandinê. Mehmed Uzun ji bo amadekirina vê berhemê çar sal xebitiye. Di antolojiyê de 30 nivîskarên Kurd, bi nivîsên xwe 100 nivîskarên Kurd didin danasînê. Antolojî bi lêkolînek e li ser dîroka edebiyata Kurdî dest pê dike. Di dawiya antolojiyê de jî ferhenga Kurmancî-Soranî û Zazakî-kurmancî heye. Ji bo vê berhema nûh em Mehmed Uzunî pîroz dikin.

Antolojiya edebiyata Kurdî ama-

dekirin xizmetek gelek hêja ye. Cîhgirtina bi sedan nivîskarên Kurd yê edebî di nav antolojiya Kurdî de tiştek baş e, girîng e.

Mehmed Uzun di amadekirina antolojiya edebiyata Kurdî de metodek zanîstî bi kar anîye. Di Antolojiyê de ji sala 1900 vir de nivîskarên ku di edebiyata Kurdî de berhem afirandine, cîh girtine. Ev cara yekem e ku antolojiyek Kurdî derdikeve.

Piştê ku pirtûka Antolojiyê li Stenbolê derçû ji bo danasîna Antolojiyê li Stenbolê şevê hate amadekirin. Di şevê de bi giştî gelek mirovên hunermend, nivîskar û rewşenbîrên Kurd hebûn. Pirtûk piştê ku hate weşandinê di demeke kin de hate firotin û li piyasê qediya. Weşanxane dê cara duyem pirtûka Antolojiyê çap bike.

Ne hewce ye ku mirov gotinên dirêj li ser girîngî û pêwîstiya amadekirina berhemen weha bi qîmet û bi rûmet bike. Karekî weha ji bo xwendevanên Kurd û ji bo danasîna edebiyata Kurdî xebatek gelek hêja ye.

Divê xwendevanên Kurd vê berhema hêja bixwînin.

KOVARA HELWEST

DIVÊ LI SER BÊJEYA

“EKOL”Ê

MUNAQEŞE BÊ KIRIN

Gelek Kurd, yên ku nivîs dinivîsînin maneya bêjeyan (kelîme - peyv - gofîn) nizanin û wan di nava nivîsa xwe de bi nav dikin.

Bêjeya “EKOL”ê jî yek ji wan gotinan e ku jî afî gelek kesan ve têtê binavkirin, lê di maneyek din de. Hinek kes Kurdî axifîninê wek ekol dibînin. Ekolê bi pîrsa zimên ve girê didin. Li gor wan “Di Swêdê de hemû kes bi Kurdî diaxifin, wan “Ekola Swêdê” çêkirinê û dixwazin vê “ekolê” li derên din pêk binin. Di Almaniyê de, di civînan de yên jî “Ekola Swêdê” dibêjin bi Kurdî biaxifin. Bila civîn bi Kurdî be û hwd.” Binêrin nivîsa Gunay Aslan - Yenî Polîtîka - 28 Temûz 1995

Di hemû qada jîyanê de Kurdî axaftin, di civîn, konferans û kongreyan de Kurdî peyvandin tiştê gelekî baş e. Lê, Kurdî axaftin “Ekol” nîne. Ji bo ku Kurdên li Swêdê Kurdî diaxifin “Ekola Swêdê” çênebûye. Ekol di Felsefê de, di Edebiyatê de û di Huner de dibe. Di zimên de ekol nabe. Divê mirov pêşî bizanibe ekol çi ye? Piştî bi rasfî jî “Ekola Swêdê” heye an tune ye, binirxîne.

Di rojnemaya rojane Ozgur Gundemê de (paşê jî Ozgur Ulke û Ozgur Polîtîkayê de) çend kes bi pênûsên xwe yên tûj êrişê “Ekola Swêdê” kirin. Gelo wan jî xwe re di serê xwe de “Ekola Swêdê” çêkiribûn û êriş dikirin (wek lehengên romana Don Kîşot), yan jî tiştê weha hebûn û loma wan êriş dikirin? Di êrişên wan de dihat xuyakirin ku ew “Ekolê” bi ziman ve girêdidin. Wan qala (behsa) edebiyata Kurdî nedikirin. Edebiyata Kurdî di kîjan rewşê de ye? Hetanî nûha di edebiyata Kurdî de çend “Ekol” derketine? Nûha di edebiyata Kurdî de “Ekolek” heye? An tune ye? Bersîva van pîrsan di nivîsên wan de tune ye.

Rewşenbîr - Ronakbîr - û nivîskarên Kurd (her rewşenbîr nivîskar nîne) divê pîrsa “Ekolê” munaqêşe bikin. Ji Ahmedê Xanê heta îro di dîroka edebiyata Kurdî de çend “Ekol” hebûne? Ji bo hebûna “Ekolek” pîvan çi ye? Heger “Ekola Swêdê” heye, li ser kîjan hîmî vejîye? Bingeha avakirina vê “Ekolê” li gor kîjan pîvanî pêk hatiye?

Divê xwendevan, ronakbîr û nivîskarên Kurd li bersîva van pîrsan bigerin û li ser “Ekolê” nivîs binivîsînin û jî kovara HELWESTê re bişeynin. Nivîsên li ser “Ekolê” dê di hejmara sêyem de bite weşandinê.

Kovara HELWEST

REXNEYEK LI SER PIRTÛKA SÎYAMEND Û XECÊ

Ji bo weşandina wê ya bi zimanê Tirkî

A. DURAN

Ji vir çend sal berê nivîseke A. Duranî li ser pirtûka **Sîyamend û Xecê** ji bo weşandina wê ya bi zimanê Tirkî di kovara Niştîmanê hejmar 12 de derketibû. Îro jî ji bo ku hîn jî nivîskarên bi eslê xwe Kurd berhemên edebî bi zimanê Tirkî dinivîsînin, loma jî me pêwîst dît ku em vê nivîsê carekî din biweşînin. Nivîskarên bi eslê xwe Kurd, **efsanên Kurdan** bi Tirkî dinivîsînin, piyesa şanoyî ya **Mem û Zînê**, destanên **serihildana Şêx Seîd û Dêrsimê**, helbestên mêrxasiyên Kurdan, **romana serihildana Dêrsimê** hemû jî bi zimanê Tirkî dinivîsînin. Ji bo vê yekê mijara vê nivîsê û nêrînên ku di nivîsê de hatine zimên rastîya xwe îro jî didomîne. Carna mirov hewce ye ku tiştên rast dubare bike, an jî du car biweşîne.

Kovara HELWEST

Di salên çûyî de, pirtûkeke **Huseyin Erdem** ya bi navê "**SÎYAMEND Û XECÊ**" ku çîrok û serpêhatîyeke Kurdî ye, bi pêşgotina **Klaus Liebe - Harkot û Gunter Wallraff**, bi zimanê Tirkî û Almanî derket bazarê.

Nivîskarên Alman yên naskirî, di destpêkê de dibêjin "Mesela biyanîyan, di eslê xwe de mesela Tirkan e" û berdewam dikin "Kê karî bû qala helbestên Tirkî, yên bê Nazim Hîkmet, pêkenînên Tirkî yên bê Azîz Nesîn, Nivîsên Anadolîyê yên bê Yaşar Kemal bike...!"

Paşê kêmmayîna nivîsandina devokî û parastina gel, ji bo nivîskar û zimanzanên Kurd. Wezîfeke mezin û girîng e. Di nekirina vî karî de ku maneya wê rizgarkirin û parastina çandê ye, wê têkoşîna Kurdan ya ji bo yekîtiya polîtîk û serxwebûnê

Siyamend û Xecê

bêkok bimana û tu girêdaneke wê bi dîroka xwe ya xas re nemana.

Paşê jîhemwelatiya Tirkîyê avêtina Huseyin Erdem û xebata wî ya li hember polîtîka çandî ya fermî (resmî) eşkere dikin û bi şanazî jê qal dikin û dibêjin: Rêxistinên Kurdan hemî weşanên xwe bi zimanên serdest diweşînin.... Sedema wê vekiriye, ji bo ku bi firehî bighinin koma xwendevanan. Hejmara kesên ku bi Kurdî dixwînin, kêm e. Ji alîyê din di Kurdî de zaravayên cûr be cûr hene” û her wekî din.

Di pêşgotina ku nêt tede berpêş bûne de “Bi vê; insanekî di warê hunermendiya zanistî de biserkefî...” Tê dîtin. Û xebata Huseyin Erdem hildiperînin ezmanan....

Divê meriv bipirse ! Bi zimanekî serdest rahiştina bêjeya Kurdî, çima? Di kîjan warî de fêda wê li bêja Kurdî dibe? Ev, dewlemendî û comerdiya çi dide? Sînorên bêjeya Kurdî, çawa bi tiştên hêsan tên tengkirin û firehkirin?

Mercên objektîf û subjektîf yên têkoşîna Kurdan ya ji bo yekîtiya polîtîk û serxwebûnê û pevgirêdana wan ya bi dîroka wê ya xas re çi ne?

Bêguman; ne rast e, ku em gunehên van teva têxin stuyê Huseyin Erdem. Lê belê; ev rastî baş bê zanîn û têgihîştin. Bêje xwe dipêre awa û zagonên (kanûnên)

xwe yên xas. Li aliyekî tadeyên polîtîkî û bandora (tesîra) xirab ya merivên polîtîkî tê û diçe. Nivîskar jî miweqet e. Helbest, roman, çîrok û destanên wî yên di dema jiyana wî de hatine nivîsandin ji neslên nû re dimînin. Bi vê nevê, bi welatparêzîkê bêhempa, bi sed-salan toreyên Kurdî -çand-awayê jiyana civakî- di destên hin hunermend û nivîskaran de wek alake neketî heta bi îro hatiye. Di vî warî de afirandin kêmin, lê hê jî germiya xwe dipareze ! Êdî bêje û hunermendiya Kurdî ber daye û ketiye bergeheke -merheleke- nû. Gelek afirandin hê wê saxtî û nemiriya xwe diparêzin.

Wek têt zanîn, ji berê de welatên ku Kurdistan perçe kirine û neteweya Kurd xistine bin destê xwe çanda Kurdî talan kirine û hê jî dikin.

Îro li şanoyên-salonên- Awrupayê, serdestên Tirkîyan listîkên gelê Kurd wek “çanda Tirkîyan” didin xuya kirin û dixwazin biaşkirînin-îspat bikin-, ku ew çand ne ya Kurdan e, lê ya Tirkîyan e. “Êdî bila şopa hespê û şopa kûçik” ji hev bê veqetandin.

Bi zimanê Tirkî û Elmanî nivîsandina serpehatiya **SİYAMEND Û XECÊ** çewt e, kêmasîyek e. Wê fwek **“FERHAD Û ŞÊRÎN”** bibe malê welatên serdest û biçê. Em nete-

Sîyamend û Xecê

weyeke ji neteweyên din cuda ne û xwediye ziman, çand û hebûnên bi rengên din in. Ji bo me, keftelest û bidestxistinek piçûk jî, serketinek e. Gelo em destê xwe datînin ser bextê xwe û ji bo vê hinekî taqatê didin xwe?

Gelşa (problema) bingehîn di vir de ye. Gotina “Kesên bi Kurdî dixwînin û dinivîsin kêm in” û lipaşxistina meselê hêsan e -rehet e-. Ji xwe dijmin jî vê dixwazin. Ew dê wek her tim bêjin “Ji ber ku kesên bi Kurdî dixwînin û dinivîsin kêm in, Kurd ne Netewe ne, ew ne gel in, lê gelok in, hindik in.”

Em karin bi hêsanî bêjin “Kesên bi Kurdî dixwînin û dinivîsin kêm in” û xwe ji nava meselê bikşînin. Lê, nêzîkî 30 milyon Kurdên din!.... Em dê çawa vê veşêrin?...

Di warê xwendekaran de şaşiyê mezin heye. Ger, rêxistinên ku li ser neteweyê derketine rê, di bername xwe de cîh bidana meselê ziman, îro wê rê li zimanê serdestan bihata girtin û weşanên xwe bi wî zimanî dervedixistin.

Netewa, di nava xwe de zaravakî navên di bi kar neynê, meriv dê çawa qala yekîtiya ya rêxistinên di nava wê de bike? serakatiya partiyên sîyasî, wê çawan bibin alternatîfê?

Bi ya min, ev mesele li paş

mayiye. **SÎYAMEND Û XECÊ** bi tenê birîneke piçûk e, ku xwîn jê tê.....

Pesnê Nazim, Azîz Nesîn, Yaşar Kemal tê dan. Li gor min, ev qehr e û Huseyin erdem jî derdixin qata azmanê, ku ew lê rûniştine.

Lê, ya rastîn, nivîskarên ji Tirkîyê, bi saya însanên Kurd û jiyana wan, cîhên xwe di vê merhelê de girtine. Lê ramyariya (îdeolojiya) çepel (şoven) ya çîna serdest, lehengên -qehremanên-helbest, pêkenî û romanên tim di aşê xwe de hûr kirine û xistine rewşa herî piçûktir.

Anadolu, gotine, rohilat gotine, lê gelek hacet jê derxistine û bi barê qantiran dewlemendiya wê talan kirine. Çaxa pê dihisin, ku nema karin bi temamî vê çerxê ji bo xwe bigerînin, îcar dibêjin “welatê me perçe dikin” û deremêtên xwe diteqînin. Ango hem tirî distînin, hem jî li xwediye rez dixin û tim ew bûne xwedî maf!

Li gel fikrê şewqê hêviyê derdikeve meydanê. Li ciyekî tê gotin, ku Kurdiya vê serpêhatiyê di destê Huseyin Erdem de heye. Heger ew wilo be, bê ku wext bê windakirin, divê ev afirandin bi zimanê xwe yê xas bê weşandin. Ez bawerim wê kara wê bêtir be.

Ez bawerim ji rawestîna pê ve çareke din tune ye.....

EDEBIYATA NETEWÎ

û

ROLA ZIMÊN

N. ZAXÛRANÎ

Weke ku em ji dîroka netewan fêr dibin her netewa hunerên xwe yên cûrbicûr – mîna edebiyat, şêir, roman û yê din– bi zimanê xwe diafirîne. Lewra ziman ji bo afirandina berhemên hunerî organeke serekî ye. Bi saya vê organê serekî him yekîtiya neteweyî bi vegotina berhemên edebî bedewtir dibe, him jî kultura netewî li seranserê welêt mîna kulîlkên bihara rengîn li Kurdistanê tete xemilandin. Ji ber vê yekê jî neteweyên ku hê ne azad in, nikarin bi zimanê xweyî zikmakî di warê devkî û nivîskî de xwe îfade bikin, xwediyê kultureke hêjar û jihevketî ne. Çimkî zimanê wan hatiye qedexe kirin, bi vî awayî ji van netewan tu fersend nedîtine ku xwe fêrî zimanê xwe bikin da ku karibin huner di hemû warê jiyane de pêşve bibin.

Ji ber vê yekê jî, peywendiyên polîtîka kolonyalîstî û ziman him li hember hev û him jî bandora wan li ser berhemkirina berhemên hunerî/edebî ji bo rexne madî xwediyê giringiyêke bi reng dîrokî ye. Çi ma? Ji ber ku polîtîka dagirker bê berhema edebî bi çî awayê zimên têt berhemkirin nameyîne, ji vê yekê wîrdetir bê berhema edebî bi kîjan zimanî têt afirandin bûye mijar ji bo polîtîka kolonyalîstan re di herikandina konaxên dîrokî yên kevnar û nûjen de. Ji bilî vê jî, her çiqas ziman wekî organeke danûstandinê û bêguneh bê xwiyakirin jî, di aslê xwe de rola ziman bi guhertina polîtîka dewletên kolonyalîst re hatiye guhertin, ji bo cîhkirina polîtîka xwe li ser netewên çawsawa û belengaz zimanzanî bûye aletekî bêhempa. Edebiyat bi xwe jî him dibe sêsebebê van pevçûnên bi reng polîtîkî, him jî dibe encama

Edebiyata Netewî

wan. Çi ku dewletên kolonyalîst ji bo ku di hemû warê jiyanê de karibin bandora xwe ya îdeolojîkî û zimanekî li ser welatên ku di bin destên wan de hatine kolonîzekirin, zal bikin, edebiyat ji bo wan mekanîzmeke jiyanî ye. Ji alîkî ve neteweyên çawsawe li ber xwe didin ku bi alîkariya zimanê xwe yekîtiya xweyî netewî di warê hemû jiyanê de - çi di warê aborî, polîtîkî û çi di warê kulturî de- damezrênên, lê ji aliyê din ve jî dewletên Împeryalîst û kolonyalîst bi hemû awayî hewl didin ku yekîtiya gelên bindest bi bandora xweyî zimankî û îdeolojîkî ji hev tarûmar bikin.

Her çiqas pirsgirêk ne aloz û vekiriye jî, hê hinek heval di girîngîya zimên ji bo dahatûyê (pêşeroj) gelê bindest û hêjar baş tenegehîştine. Ji bo vê yekê jî, ev birader li dorbera zimên û edebiyatê bi normên akilmendariya berê mijûl dibin. Beriya niha bi çendekî rojnama **'ROJ'**ê hejmar 12an ket destê min. Di vê hejmarê de nivîsek bi zimanê tirkî ku ji aliyê hevrê **Elî Bîçer** ve hatibû nivîsandin ber çavê min ket. Di vê nivîsa xwe de hevrê Elî Bîçer dibêje ku: *"Li ber me romanek heye. Bi Kurdî hatiye nivîsandin, lê divê romanê de çoxraya Kurdî û karektêra netewayî, psîkolojiya wê ya mirovên Kurd ya bi taybetî nîne. Tîpên di romanê de jî bi mirovên Kurd re naguncin. Nivîser ji bilê zimên bi temamî ji civata Kurdî hatiye biyanîkirin. Di vê rewşê de, ji bo ku ev roman bi Kurdî hatiye nivîsandin ma emê dê wê ji edebiyata Kurdî ya neteweyî bihesibênin? Ji xwe na! (1)*

Li bin van rêzên jorîn, nivîser weha didomîne: *"Li ber me romaneke duyemîn heye. Tîpên di romanê de halên giyanî (rihî) yên cûrbicûr yên mirovên Kurdî didin. Lê ev roman ne bi Kurdî, bi tirkî hatiye nivîsandin. Ma em dê niha vê romanê ne ji edebiyata Kurdî bihesibênin? Ji xwe em dê bihesibênin."* (2)

Di van rêzên jorîn yên ku ji aliyê hevrê Elî Bîçerî de hatina nivîsandin gelek tiştên balkêş têde hene. Ji ber wî qasî jî divê mirov li ser wan raweste. Ya yekemîn divê ku mirov bibêje ew nivîserê ku hevrê Elî Bîçer li ser diaxîfe mirovekî çawa ye. Ew nivîser dê romannivîser be, wê baş bi Kurdî zani be, belkî Kurd be jî, lê her çi hîkmet e, wê ew nivîser di romana xwe de bahsa mirovên Kurdî, civata Kurdî neke. Lê nivîserê duyemîn her çiqas bi Kurdî nizanibe jî, bela ku romana xwe li ser civata Kurdî dinivîsîne, rewşa giyanî (rihî) ya mirovên Kurdî baş di romana xwe de vedibêje, ji ber vê yekê jî berhemên wî ji lîteratûra Kurdî têde hesibandin. Bi ya min na! Çi ku serpêhatiyên civata Kurdistanê lê nêrîna /hîpoteza hevrê Elî Bîçer serrast nake. Lewra em baş dizanin ku gelek nivîserên ku bi eslê xwe Kurd in—mîna **Yaşar KEMAL**, **Ahmed ARIF**, **Selîm BEREKAT** û yê din.— lê belê van nivîsaran bi zimanê tirkî an jî bi zimanê erebî dinivîsînin û herweha baş

Edebiyata Netewî

tête zanîn ku mijarên berhemên van nivîsaran di gelek waran de serçaviyên mijarê xwe ji civata Kurdistanê digrin jî, mirov nikare **Yaşar KEMAL an jî Selîm BEREKAT** wekî nivîserekî Kurdistanî bihesibîne. Bêguman **Selîm BEREKAT û Yaşar KEMAL** xwe Kurd dibînin, ji tevgêra rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê re jî dibin alîkar, lê mirov nikare wan weke nivîserê Kurd bipejirîne.

Ya duyemîn ew e ku hevrê Elî Bîçerî, bi awayê vê aqilmendiya xwe ku di mînyaya yekem de dibêje, bela ku zimanê romanê bi Kurdîye, lê belê mijara vê ne ji serçaviyên civata Kurdistanê hatiye girtin şêwa (şikl) dibe bigoriya navrokê. Herweha di minaka din de jî ji bo ku mijara romanê ji serçaviyên civata Kurdistanê hatiye girtin, lê zimanê wê bi zimanê biyanî ye jî, dîsa şêwa dibe bi goriya naverokê. Baş e, divê ku ji şêwa çî bê fehmkirin. Ji şêwa awayên (tarz) nazmî, uslubî divê ku bên têgihîştin. Her çiqas uslub û ziman hinekî ji hev cûda dibin jî di bingehê xwe de ziman her dem xwediyê îstikrerek e serekî ye. Çi ku nivîser bi alîkariya nazmê kabîliyeta îfadekirina zimên zêdetir dike, ji bilî vê jî bê çawa şêwa naverokeke li gor xwe dixwaze, her weha naverok jî her şêweyî naxwaze, şêweyê ku lê digunce dixwaze. Lê belê ku mirov dibîne ku peywendiyên şêwa û naverokê ne bi awayekî diyalektîkî, belkî bi awayekî metafizîkî ye. Lewra baş tê zanîn ku şêwa û naverok an jî bi gotinek din mijara berhemên edebî ku ji wan re dibin naverok mirov nikare weha bi kesanî ji şêwa wan qut bike. Ji hev cudakirin bi xwe re aqilmendariya mekanîkî diafirîne.

Aqilmendariya balkêş ya sêyemîn ku hevrê Elî Bîçer li ser mijul dibe, kar û barê wergerandinê ye. Gelekî rast e ku mirovên **welatparêz û demokrat wekî Firat CEWERÎ** dixwazin ku bi dilekî pak berhemên Rusî verdigerînin Kurdî an ji tirkî, mirov nikare bi nivîserên ku berdevkiya hêzên dagirker dikin, mukayese bike. Ji bo ku mijar baş bê têgihîştin, divê ku dîse mirov li ser rewşa civata Kurdistanê rawest e. Her kes dizane ku ji damezrandina komara tirkîyê virde hêzên kolonyalîst yên tirk bi serkeşiya Kemalîstan hebûna gelê Kurd digel çanda û welatê wî înkâr û qedexe kirin. Di vê pêvajoya înkarkirinê de, berdevkên hêzên kolonyalîst yên bi unîformê dengbêj an jî dîroknas folklor û muzîka Kurdî vedigerînin tirkî û bi vî awayî didizin û asîmîle dikin. Heger ku mirov vê karûbarê wergerandinê di kîjan şert û şûrutan de û ji aliyê kê û bi çî amançê têt wergerandin li ber çavan negre, hingane mirov kare bi hêsanî bikeve nava çewtiyan. Bi gotineke din; weke her karî, karûbarê wergerandinê jî ne karekî abstrak e. Têkiliyên wê û kesên din nava jiyana civakî de cîh digrin digel zeman û cihê wî bi awayekî organîk girêdaye.

Edebiyata Netewî

Aqilmendariya çarem ya ku hevrê Elî Bîçer ew e ku “Nivîskarên ku bi yek (eyni) zimanî bikartînin jî dibin nûnerê edebiyatên netewî yên cûr bi cûr.” Bi peyveke din zimanê ku li Dewletên Yekgirtî yên Emerîka, Avusturalya û Îngilîstanê têt axaftin, zimanê Îngilizî ye. Li gel ku li wan welatan ziman hevbeşe jî. Di bîr û baweriya min de ev mînaka ku hevrê Elî Bîçer dide, ji çareserkirina pirsgerêke virdetir, mixzewirandinê bi xwe re diafirîne. Lewra tu peywendiyên van welatan bi hevdu re jî dîr an nêzîk tune ne. Her mirovê ku haya wî ji herikandina dîrokê di nava pêvajoyê de hebe, dizane ku pirraniya gelên van welatan—ji bilî netewa Îngilîstanê— penaber an jî koçberên ji welatên Ewropî ne. Ji bilî peywendiyên koçberiya bi reng dîrokî tu têkilî di navbera van welatan de nîne.

Ji bo vê yekê jî ku mirov di cihê van welatan de serê xwe li ser Erebiştanê biêşîne bedewtir e. Çimkî em dizanin ku li Erebiştanê zêdetir ji 24 dewletan ji aliyê Brîtaniya ku “roj lê nediçû ava” hatin damezrandin. Di navbera van dewletên ereban de yekîtiya aboriyê tune ye. Ji bilî vê jî dîroka van welatan jî çî di serdema dîroka kevnar (antîk) de û çî di serdema dîroka nûjen (modern) de ji hev dîr in jî lewra em baş dizanin ku dîroka Misrê ya kevnar ku bi destê Fîravûnan hatiya pê û her weha dîroka Irakê ya ku li ser bingehê dîroka Asuriyan hatiye damezrandin gelekî ji hev dîr in. Dîse edebiyata van welatên ereban hevbeşe e. Digel gelek faktorên din yekîtiya edebiyata ereban bi saye zimanê wan yên kevnar û pirr fireh têt bi goşt û xwînkirin.

Aqilmendariya pêncemîn ku hevrê Elî Bîçer li ser mijûl dibe ew e ku dema dewletên dagirker welatan kolonîze dikin—mîna Hîndîstan ji aliyê Îngilîstanê ve hat kolonîzekirin û Cezayîr ji aliyê dagirkerên Fransa va hat kolonîze kirin û ed.- zimanê wan, folklorê wan, dîroka wan bi gotinek din kultura wan qedexe, asîmîle û talan kirin. Di vê pêvajoya zehf dijwar û aloz de birrek ji rewşenbîrên wan welatan ji bêçareyî û bi darê kotekê fêrî ziman dibin û bi zimanê wan dixwazin ku li ser pirsgerêkên hunerî, edebî, civakî û bi giştî neteweyî rawestin da ku karibin rê li ber polîtîkaya dagirker û dirînde (zalimane) bigrin. Ji xwe ev karûbarekî pîroz e. Lê ya ku bi mirov seyr (acêb) tê awayê aqilmendariya hevrê Elî Bîçerî ye. Weke ku ji aqilmendariya wî têt fêmkirin ew vê pêvajoyê weke pêvajoyeke normal dibîne. Bi ya min çewtî di vir de ye. Lê ya rast ew e ku ev pêvajoyeke awarte (îstîsna) ye. Ji bilî vê jî têkiliyên di navbera Îngilîstanê û Hîndîstanê an jî Fransa û Cezayir de mirov nikare weke peywendiyên normal û bi reng mirovantî pesend bike. Ji ber coxrafya nêzîk ya Îrlanda bi Brîtanya mezin ve, pêkoliya kolonyalîzmên Brîtaniyê birînen reş di laşê Îrlanda de vekirin û bi vî awayî hişt ku gelê Îrlanda zimanê xwe yê netewî jî bîr bike. Ji ber vê yekê ji ede-

Edebiyata Netewî

biyata ku divê pêvajoya zor û sext de ji aliyê rewşenbîrên van welatan hat afirandin “Di warê zimên de Fransî, lê di warê vegotinê de Cezayirî an jî Irlandî bû” mirov kare bi hêsanî bibêje.

Karê bê gotin ku ma qey ev netewan bi carekê ra hatin windakirin? Bi ya min na! Lê belê him di warê edebiyat û zimên de -mîna Irland e- him jî di warê coxrafya de -mîna Wîetnam û Kurdistanê- hatin seqet kirin û perçekirin. Ji bo vê perçebûn û seqetbûnê jî ji edebiyata Cezayirîyan ya dema ku Cezayir ji aliyê dagirkerên Fransî ve hatibû dagirkerin jê re digotin edebiyata bi “ziman Fransî lê di vegotinê de Cezayirî”. Ango şêwa Fransî bû, lê naverok Cezayirî dihat pejirandin.

Aqilmendariya şeşemîn ya hevrê Elî Bîçer ew e ku dibêje “Li Efrîqa ji hezar zimanî bêhtir ku têt axaftin, bi ser de jî piraniya van zimanan di rewşa ku hêj bi ser zimanê êlan/bavikan neketine, zimanê dagirkeran dibe xwedyê taybetiyeke berhevkar.” (3) Bi rastî mirov hinekî şaş dike. Dibe ku zimanên welatê Afrîkî mîna zimanê dagirkerê ku ew welat kolonîze kiribûn geş nebûbûn, lê li kîjan welatê bindest zimanê kolonyalîstan roleke berhevkar leyistine. Em jiyana welatê xwe Kurdistan baş dizanin ku bandora zimanê tirkî, erebî û farisî li ser civata Kurdistanê tesîrek e zehf negatîf kiriye. Çi ku mirovên me dibin tesîra zimanê tirkî de dimînin û bi çî awayî zimanê xwe ji bîr dikin. Ev yeka ha jî dibe asteng li pêşberî geşbûna edebiyata me.

Di vê pêvajoya ku gelê Kurdistanê li welêt û dervayî welêt berxwedaneke man û nemanê li dijî hêzên dagirker li dar dixê, dive ku em weke rewşenbîrên Kurdistanê ji afatên ku hatine serê gelê bindest û hêjar îbret bigrin, da ku em karibin di warê hemû jiyana de saziyên xwe yên netewî damezrînin û bi vî awayî ziman û edebiyata xwe ji bîr nekin. Di vê warê de wê gelek gavê hêja bîn avêtin ku rewşenbîrên me dev ji zimanê tirkî berdin û hêdî hêdî bi zimanê xwe hînbibin û pê binivîsînin.

Çavkanî :

- 1— **ROJ** - Hejmar :12 - Rûpel:9
- 2— **ROJ** Hejmar : 12 - Rûpel:9
- 3— **ROJ**- Hejmar : 12- Rûpel:9

JI EDEBIYATA KLASÎK HELBESTÊN KURDÎ

“ÇARDEHÊ NÎSAN”

Hîmdar û westayê edebiyata Kurdî
EHMEDÊ XANÎ

Di fesle çardehê nîsan
me dî bû dilberek dîsan

Di dil meş'el çira îsan
me can da şîbhê perwanê

Me dil da dilberek sade
letîf û şox û begzade

Ji qeyda kirme azade
nihanî birme dîwane

Nihanî xilwetek da min
ji le'la şerbetek da min

Bi weslê suhbetek da min
kirim bendê di fermanê

Di fermanê ku hadir bit
we naxwazî munafiq bit

Divê her dem miwafiq bit
wekî şêxê Sen'anê

Wekî şêxê di hadir bit
li fermanê ku nazir bit

Bi emrê dostê kafir bit
bi sojî sihfê Qur'anê

Di sojim sihfê mektûbê
bi emrê yar û mehbûbê

Dema dil dim bi metlûbê
di dim ez dîn û îmanê

Eger dîlber mecazî bit
ji rengê libsê xazî bit

Bela sofî ne razî bit
bimînî ew di heyranê

Binê sofî qewî dîne
wekî xeffaşê miskîne

Li nik wî roj çî reng nîne
xwe nabînî ji i'myanê

Dilê wî kore e'maye
ji weslê dûrî damaye

Li ber wî derge dadaye
nehîşte bête dîwanê
Ezim serxweş ji wê camê
ezim zilfa ser xalan danê

Bi zilfa hate ser xalan
binefşa çiçek û alan

Dil û canê me evdalan
di bir dîsan bi talanê

Di talana ku sexweş çûn
hezaran qenc û gewher çûn

Dilê sed pare ker ker çûn
tu XANÎ beske efxane

Têbinî: Me helbesta **Ehmedê**
Xanî ji kovara **SÎRWE** hejmar
95/96 wergirt.

JI EDEBIYATA NÛJEN HELBESTÊN KURDÎ

(Ji bo bîranîna Ehmedê Xanî)

SÊ KULM AX

DAWÊ XANÊ

Sê kulm ax,
Sê kevirên qûçkirî....
Ez li wir bûm,
Li ber serê te.
Tu li wir bû,
Li ber serê xwe.
Me lihev nihêrî;
Ne min tu dîtî,
Ne te ez...
Tiştekek hebû,
Tiştekek negofî.
Di nav lêvên te de
Bi sedsalan veşartî,
Bi sedsalan hefskirî...
Belkî sirra Zînê bû;
Bi sedan rûpel.
Ne min pirs kir,
Ne te beyan kir.

Ew dîwarkê xerabe yê li ber serê
te,
Xwe xwar kir,
Toza xwe dawşand
Li min
Û li te.
Tiştekek hebû,
Tiştekek negofî.
Ji sirra Zînê mezintir.

Belkî dîrok bû,
Dîroka daliqandî,
Qeydkirî.

Min ax mizda;
Gote "Av !..."
Me lihev nihêrî,
Ne min tu dîtî,
Ne te ez...
Tiştekek hebû,
Tiştekek du felqe,
Nêvî rizyayî,
Nêvî ew bû,
Ew ê negofî,
Ew ê liser zimên.
Min kir ez pirs bikim,
Tu rabû çû
Ji ber serê xwe.

Bayê liwan da,
Leqîyan ew kevirên kevnare...
Tiştekek hebû,
Ji min û ji te,
Ji axê û ji keviran
Û ji dîwêr mezintir.
Ew bû,
Ew ê negofî,
Ew ê di siya ewran de,

Helbest

Ew ê bêav û bêav,
Ew ê bêdê û bêbav,
Sêwîkê li ber dîwaran.
Ne min got "Kî ye ?"
Ne te beyan kir.

..../....

Mêşa hingiv xwe danî ser heniya
min.

Me li hev nihêrî,
Ne min ew dît,
Ne wê ez...

Destê min çû heniya min,
Şewtek hênîk berba bû.

Tîştekek hebû,

Tîştekek negofî.

Nêvî xwelî bû

Li ser rîya min,

Nêvî ew bû;

Ew ê di kortala meteorê de,

Ew ê li serê Agirî.

Belkî sirra Memê bû,

Belkî mezintir...

Ez li wir bûm,
Bê hal, bi qudûm.

Tu li wir bûyî,

Li ber serê min.

Me li hev nihêrî,

Ne min tu dîtî,

Ne te ez.

Tîştekek hebû,

Tîştekek nedîtî,

Belkî mirin bû,

Belkî jîyan bû,

Belkî jî wan mezintir.

Ne min pirs kir,
Ne te beyan kir.
Şewqa hîvê li axê da,
Berd û kevir teyisîn.

Ez li wir bûm,

Tu li wir bû.

Mem û Zîn hatin.

Li me nihêrîn, derbas bûn.

Mem stûxwar,

Zîn bi keder bû.

Me lihev nihêrî,

Ne min tu dîtî,

Ne te ez...

Tavê lime da.

Mîro, dûpişk, mar,

Mişk û kîvroşk û rûvî,

Hemû şahidên şevên tarî

Derhatin ji kunên xwe

Bi tirs,

Bêxew,

Bêxwarin.

Du morîkên çavên min

Axa zuwa şil kirin.

Me lihev nihêrî,

Ne min tu dîtî,

Ne te ez...

Tîştekek hebû,

Tîştekek negofî.

Belkî sirra Siyabend,

Belkî ya Xecê...

Belkî jî qesîde bû,

Qesîda Feqyê Teyran,

Belkî mezintir.

Ne min pirs kir,

Ne te beyan kir.

BILBIL Û GUL

Oscar WILD

"Ez dê dîlanê bi te re bikim ku tu guleke sor ji min re bîne" keça mamoste gote xwendekarekî xort.

Xort xemgîn vegeriya mal û ji xwe pirsî : "Gelo ez çi bikim? Gulên sor di baxçeyê min de nîn in!"

Di hêlîna xwe de, li ser dara beruwê bilbil deng kir û li dora xwe dinêrî.

"Tu gulên sor di baxçeyê min de nîn in" xwendekar di bakir û çavên wî yên xweşik hestiran dadigirtin.

"Şahî bi tiştên gelek piçûk ve girêdayî ye! Min gelek nivîsandinên kevnara xwendine, û felsefe kûr naskiriyê, lê jîna min ji bo guleke sor bi xem e." xwendekar ji xwe re digot.

"Dawî, vaye evîndarekî rast" Bilbil rast:

"Şev li pey şevê min jê re distirand, digel ku min nasnedikir; çîroka wî min ji stêran re digot û niha ez dibînim pora wî weke guleke reş e, lêvên wî sor in weke kulilka gulê, lê evîne temarî bi serde aniye."

"Îşev na şeveke din, wê mîr şahiyekê deyne, û evîndara min wê bêyê." Bu piste-piste xwendekar.

"Eger ez gul sor jê re bibim wê dîlanê heya şefaqê bi min re bike, ez dê destên xwe lê bipêçim, bidime ber singa xwe, serê xwe wê deyne ser milê min û destên wê, wê didestê min de bin." Lê tu gulên sor di baxçeyê min de nîn in; loma ezê bitena xwe rûnim, pêça xwe wê nede min û dilê min wê bişkê." Xwendekar ji xwe re digot. "Dawî vaye evîndarekî rast" Bilbil dibakir "Ez li ser çi distirênim, ew li ser dinale; çi min re şahîye, jê re xeme. Evîn tiştêkî giranbiha ye, hin ji zêr û peran bihatire û kes nikare bi peran bikire."

Xwendekarê xort dîsa ji xwe re digot:

"Sazbend wê li ser textikê xwe rûnin û bêjin. Evîndara min wê li ber helbest û mûsîqa wan dîlanê bike. Evîndara min wê dîlanêke

Bilbil û Gul — Oscar Wild

sivik bike, ku lingên wê negihêjin erdê û hemî xort wê bixwazin dîlanê di destên wê de bikin. Lê destên min nagire û dîlanê bi min re nake, ji ber ku gula sor nîn e da ez bidimê.”

Xew avête ser geyê, ruwê xwe xiste nav destên xwe û dest bi girî kir.

“Çima ev xortê rind digrî?” Çûk dûvê xwe li pey xwe dikişand û pirsî.

“Bi rastî çima digrî?” Pirpirîk li dora xwendekar dizîvirî û dibakir.

“Bi rastî çima?” Gula baharê bi dengê xweyî zirav dixiste piste-pist.

“Li ser guleke sor digrî” Bilbil ji van re got.

“Li ser guleke sor?” Bi hev re bakirin. “Ev çi bêmejiye!” Û çûkê biçûk kenekî bilind kir.

Lê Bilbil derdê xwendekar naskir, û bê deng li ser dara berûwê rûnişt, kûr kete mitala evînê û xwendekar.

Ji nişkava Bilbil perê xweyî rengîn ji hev vekirin, xwe hilda ezmana û nav daran û ser beçan re firî.

Di nava beçekî de Bilbil dareka gula dît, firî balê û got: “Guleke sor bide min û ez dê ji tera straneke xweş bêjim.”

Lê dara gula serê xwe hejand û got: “Gulên min hemî sipîne weke nîvişkê biharê û ji berfa serê çiya sipîtirin; Lê meyzeke! ha waye xuha min here balê, gereke daxwaza te bide te.”

Bilbil firî serê dara din û weke gotî xuha wê gotiye:

“Guleke sor bide min ezê strana xweyî herî xweş ji te re bêjim.” Dara gulê serê xwe dîsa hejand û got: “Gulên min zerin, zerin weke pora bûka biharê. Û ji nergizên beriyê zertirin. Lê here cem xuha min dara gula, li ber pencera xwendekare, gereke daxwaz te li cem peyde bibe.”

Bilbil firî û giha dara gulê li ber pencera xwendekar. Û bakir: “Guleke sor bide min ezê ji te re strana xweyî herî xweş bêjim.”

Lê darê serê xwe weke herdu xuhên xwe hejand û got: “Gulên min sorin, sorin weke lingên kevoka û ji mircanan sortirin lê zivistanê kulfîkê min qerîşandine. Û ba çuqîkê min şikandine. Ji ber vê yekê ez tu kulfîkan nagrim.”

Bilbil bi şewat bakir: “Ez bi tenê gulkê divim, bi tenê gulsorekê!

Bilbil û Gul — Oscar Wild

Çawa ezê peyda bikim?"

Darê lê vegerand: "Çareyek bi tenê heye, lê belê çareke pir zor e. Ez ditirsim ji te re bêjim."

— "Bêje min!" Bilbil bakir. "Bêje, ez natirsim"

Dara gulê bakir : "Eger tu guleke sor divî, divê ku stranan bi tava heyvê bêjî û bi xwîna dilê xwe gulê sor bikî. Divê ku tu ji min re bistrînî û singa xwe di sitrîkî min re bikî. Divê tu şevê tevî bistrînî û striyê min di singa te ve here, da çûqliyên min xwîna dilê te bimi-jin."

— "Mirin bihakî mezin e ji bo gulekê. Jiyan xweş e ji bo herkesî. Pir xweş e ku yek li ser çûqliki şin rûne û li rojê û heyvê binêre. Lê tim evîn ji jiyane xweştir e û dawî dilê Bilbilekî ma li ber dilê mirovekî çi ye?" Bilbil ji xwe re digot. Perê xwe ji hev vekirin û da xwe weke periyekê li nav baxçe û nav daran re firî.

Xwendekarê ciwan hê li ser geyê xwe avêtibû, hêstir ji çavên wiyên delal diherikîn.

— "Şahîya xwe bîne" Bilbil bakir. "Gula sor wê bibe ya te. Ezê gulê bi strana xwe li ber tavê heyvê şin bikim. Lê belê yek daxwaza min ji te ku tu li min vegeîne, û tu bibî evîndarekî rast. Ji ber ku evîn ji felsefê bi ratire û ji zorê bi hêztir e. Laş û baskên wê wekê pêtîne. Lêvên wê hingivîn û şêrînin, û behna wê weke bêhna gula ye."

Xwendekar ji ser geyê rabû û hisand. Lê hîn ne dibû ku Bilbil çi jê re dibêje. Ji ber ku, ji pirtûkan bi tenê hîn di bû. Dara berûwê ji Bilbil hîn bû û xemgîn bû. Ji ber ku Bilbil hêfîna xwe li ser çûqliyên wê çêdikir û li ber dilê wê biha bû.

Darê bakir : "Strana dawî ji min re bêje, gava tu bimirî ez dê bimênime bi tenê"

Bilbil ji darê re strand û dengê wî yê xweş, şêrîn û xemgîn dibû.

Ku Bilbil strana xwe tamam kir, xwendekar pênuş û kaxezên xwe ji berka xwe derxistin û ji xwe re digot: " Ev Bilbil stranbêjeke xweşik e, lê gelo êş û xweşiyên nasdike? Ez ditirsim ku nasnake. Bi rastî ew jî weke hemî dengbêjan distrîne bê ku zanibe çi dibêje! Ew tu caran nikare tiştekî ji kesekî re bike û nake. Bi tenê bi strana mijûl dibe û herkes dizane ku dengbêj xwe perestî. Awazne pir xweş di dengê wî de hene, lê çi feyde ku bê mane ne. Xwendekar

Bilbil û Gul — Oscar Wild

wisa ji xwe re digot û dikete ramanan. Xwe avête ser textê xweyî biçûk û bi evîna xwe mijûl bû. Kêlikek ne çû kete xeweke şêrîn.

Gava heyv derket Bilbil firî serê dara gulê li ber pencera xwendekar û singa xwe bi ser strîkî darê ve bir. Şev diçû û Bilbil li peyhev distrand, û strî hê kûrtir di sînga wî de diçû xwar. Çûqliyên darê xwîna wî di mijîn. Destpêkê Bilbil stranek li ser nûevîna xort û keçikê got. Çawa stranê da pey stranê ûsa gulek e xweşik li ser darê şîn û geş dibû. Pêşî gul bê reng bû. weke rengê nexweşekî, weke rengê avîya sibê li ber çeman. Lê darê bakire Bilbil da sînga xwe hê bihêşîne berbistrîde berî ku roj derkeve. Da gul sor bibe.

Bilbil bi lez sînga xwe bi ser strî de bir. Û dengê strana wî bilind dibû. Strana wî bûbû evîna di canê mirov û miroveke de. Pelên darê geş bûbûn weke rûwê zavê gava lêvên bûkê maç dike. Hê strî negiha bu dilê Bilbil ji ber wilo nava gulê sipî mabû. Bi tenê xwîna dilê Bilbil dikare dilpe gulê sor bike.

Darê careke din bakire Bilbil, da xwe bêhtir bide bi ser strîdê, lê wê roj hile berî ku gul tev sor bibe. Bilbil xwe bi ser strîde dara te giha dilê wî. Êşeke dijwar pê kett. Êş xurt dibû, xurt dibû û stran bilind û bilind dibû. Ji ber ku stran bûbû evîna nemir.

Gul tev sor bu weke Yaqût, lê dengê Bilbil zirav dibû, baskên wî sist dibûn û xeyal diketin ber çavên wî. Stran zirav, zirav bû û bêhna wî teng dibû weke ku destek bikeve qirikê. Dawî, yek awaz ji strana xwe got. Heyvê bihîst şeveq ji bîr kir û ma li azmana. Gulê denk kir, ji serî ta binî heja û rûçkên xwe ji bayê sibêyî sar re vekirin. Newal û Zinaran dengê stranê li hev veğerandin û şivanên razayî ji xewnan şiyarkirin. Deng giha çem, û çem giha Deryayê.

“Mêzeke, mêzeke” darê bakir. “Gul tev şîn bû.” Lê Bilbil lê ne veğerand. Ketibû ser geyê, strî di dilde can berda bû.

Nêzîkî nîvro xwendekar pencera xwe vekir û nêrî.

— “Ev çi ye ez dibînim, ez bawernakim?” Xwendekar bakir.

— “Vaye guleke sor! Min yên wek wê hê ne dîtine.”

Xwendekar xwe nizim kir û gul jêkir. Û piştre kum da serê xwe gul di dest de bazda ber mala mamosta. Keça mamosta li ber derî runişî bû û kûçikê wê yê biçûk li ber lingê wê bû.

— “Vaye gula herî sor di dinyayê de” Xwendekar bakir.

Bilbil û Gul — Oscar Wîld

— “Îşev gulê deyne ser dilê xwe û gava em bi hev re bikevin dîlanê wê ji te re bêje çendî ez ji te hisdikim.”

Lê keça mamoste pêça xwe nedayê. Û bi madekî tirş lê vegerand: “Ez ditirsim ku gula te nekeve rengê kirasê min. Ji alîkî din ve kurê birayê mîr hinek zêrên delal ji min re şiyandine û herkes dizane ku bihayê wan ji yên gulan bêhtirin.”

— “Baş e; Lê xuyaye ku tu ne xwedya soza xweyî. ” Xwendekar bi bêhtengayî got û gul avête sikakê, gul kete riya paytonekê û da ser.

— “Ne xwedya soza xwe” keça mamoste bakir. “Tu pir hişk î, û piştê tu kî yî? Bitenê xwendekarekî şepirzeyî! Ez ne behwerim ku soleke te weke ya kurê birayê min hebe.” Û rabu ser xwe kete hindur.

— “Evîn, çi tiştêkî vala ye!” Xwendekar di riya malê de ji xwe re digot.

— “Ti caran nabe weke locikê û nikare tiştêkî bêne meydanê. Evîn, her dem tiştên ku nayên cih ji me re di bêjin, û dihêle em bi tiştên ne rast bawer bikin. Bi rastî evîn, ne tiştêkî zanistiye. Ji ber vê yekê ez dê vegerim felsefê.”

Xwendekar vegeriya oda xwe, destê xwe avête pirtûkeke toz girtî û dest bi xwendinê kir.

Nîviskar : Oscar WÎLD
Werger : Hevînd

REXNE Û REXNEGIRÎ

Mehmed UZUN

Sê xwediyên kitêbeke edebî hene; nivîskar, xwendevan û rexnegir. Nivîskar kitêba xwe diafirîne û diweşîne. Piştê ku kitap weşiya, ew xwedî diguherîne û xwendevan dibe xwediyê kitêbê û bi xwendin û dîtinên xwe li kitêbê xwedî derdikeve û wê dike nemir. Herçî rexnegir e, ew di navbera nivîskar û xwendevan de pireke xurt e. Ew pireke welê ye ku herdu aliyan dike da ku nivîskar hîn çêtir binivîse û xwendevan hîn çêtir bixwîne. Bi vî awayî rexnegir alîkarî li jiyana edebî dike da ku ew hîn geştir, xweştir, pêşkeftir û kûrtir be.

Rexnegir bi karekî weha pîroz radiibe. Bi alîkariya rojname, kovar, radiyo û kitêban, rexnegir dibe ziman, guh û çavên jiyana edebî. Ew kitêba edebî, form û naveroka wê û nivîskarê wê dide nasîn, çavê xwe li kêmaniyan û dîtin û pêşniyarên xwe (ji bo herdû aliyan) dinivîse.

Ji lewre pêşvexistina edebiyatekê, avakirina jiyaneke edebî û perwerdekirina xwendevanan pir bi rexne û rexnegiriyê girêdayî ye. Li cîhê ku rexne û rexnegirî hebe û xurt be, li wê derê, hêdî hêdî, edebiyateke xurt jî tê pê. Lê li cîhê ku rexne û rexnegirî tune be yan jî qels be li wê derê edebiyateke xurt hêşîn nayê û edebiyat û jiyana edebî di nav komeke teng de dimîne.

Gelo rewşa rexne û rexnegirîya Kurdî çawan e? Ez bawer nakim ku kes bika-ribe bibêje ku rewş baş e. Ji bervajiyê, rewş kambax e. Sebebên vê pir in. Berî her tiştî, zordariya dewletên dijmin, perçebûna welatê Kurdistanê, paştmayîna civatê û bikaranîna sê el-fabeyên cihê (Latînî, Erebi, Kirilî) di warê rexne û rexnegiriyê de jî girêk û bêgavîyên mezin anîne pê. Digel wê yekê, perçebûna civakî û siyasî jî problem zêde kirine. Mîna her tiştê Kurdî, di warê rexne û rexnegirîya Kurdî de jî mesele û zahmetî pir in û kesên ku serê xwe bi wan mesele û zahmetiyan diêşînin, kêmin. Li hemû Kurdistanê û li derveyî welêt, bi tenê çend kes îlmê rexne û edebiyatê xwendine û serê xwe bi meseleyên rexne û rexnegirîya Kurdî diêşînin û gava rê li wan vedibe, dîtinên xwe dinivîşînin.

Li her derî, rexnegir danasîn, rexne û dîtinên xwe li ser sê pirsan ava dike; kî, çima, çawan? Û rexnegir, dîsan li her cîhê bi erînî (konstruktîv) dikeve pey bersîva van pirsan û bi erînî li esera edebî dinihêre...

Heye ku ez şaş im, lê bi qasî ku ez dibînim, li ba me Kurdan ne weha ye. Ji ber sebebên ku min qalê kirin, em Kurd ne bi erînî, lê bi neyinî (destruktîv) dikevin pey bersîva pirsan û bi neyinî li esera edebî dinihêrin. Loma, pir caran, li ba me Kurdan, rexne dibe çêr, qîsên

Rexne û Rexnegirî

bêedeb û dijaminahî. Û dewsa dilopên zêrîn yên danasîn, edeb, perwerî û dostiyê, pêûs dilopên jahrîn yên bedbînî, hesûdî û berberiyê direşînê.

Kî ji vê yekê destkevtî dibe? Heye ku hin kes û hêz jê destkevtî bibin, lê ne Kurd û edebiyata Kurdî. Di vê rewşa kambax de, para nezaniyê pir e. Gava dewsa pisporan, miştan û dewsa nivîskaran xwendevanekî ku çend kitêb xwendine, rahêjin pêûsê, rewş weha dibe. Ji lewre pir girîng e ku nivîskar, hunermend û ronakbîrên Kurd hewl bidin rexne û rexnegiriyê û pêla vî karê pîroz bilind bikin. Ziman, edebiyat û hunera Kurdî hewcedarê rexneya bedew û rexnegirên pispor e.

Edebiyata Kurdî hewcedarê rexnegirên pispor e.

1- Bi ilim, qayide û prensîbên rexne, rexnegirî û edebiyatê perwerde bûye.

2- Pêşvexistina edebiyata Kurdî ji bo wî/wê esas e û ji bo xwendevanan dinivîse.

3- Ji bo kesekî û hêzekê nanivîse û pîvanên bi tenê kesekî û hêzekê ji xwe re esas nagire.

4- Rû ji ehlaq û pîvanên rexnegiriyê ba nade, di nav komên îdeolojî, siyaset, hêz û rêxistinên de xweserîbûna rexnegiriyê ji bîr nake.

5- Bi zimanekî sivik, zelal û xweş li ser kitêba edebî û nivîskarê wê agahdariyên esasî dide xwendevanan û aliyên baş û kêmaniyên nivîskar nîşan dide.

6- Bi zanîna rexnegirî dike û rexneya xwe li ser lêkolîn, lêhûrbûn, agahî,

rexne, şerh û giranbihayiyê avadike.

7- Tu carî rewşa zimanê Kurdî û hêjahiya nivîsîna bi zimanê Kurdî û kitêba Kurdî ji bîr nake.

Wekî, destpêk, di vê hejmara Kurdistan Pressê de em dest bi rexne û danasînen Kurteçîrok û romanên Kurdî dikin û hêvî dikin ku ev gav di xizmeta pêşvexistina rexne û rexnegiriyê Kurdî de be.

Kurdistan Press, 26. Gulan. 1990

Têbînî: Ev nivîsa birêz Mehmed UZUN 5 sal berê di Kurdistan Pressê de hatibû weşandin. Ji ber ku mijara vê nivîsê rexnegirî bû û diînen, nêrînen ku di vê nivîsê de hanîbû ziman hêj jî rastîya xwe didomîne, loma me ev nivîs carekî din weşand. Ji bo ku kovara Helwest li ser hîmê zanîstiya îlmî ya rexne û rexnegiriyê çandî, edebî û munaqeseyên li ser çand û edebiyatê hatiye honandin, loma jî em bi giranî nivîsên mijara wan rexne û munaqesene diweşînin. Helbet kovara Helwest ne tenê van nivîsan, li gel van nivîsan nivîsên zanistî yên çandî û edebî jî dê biweşîne. Nivîsên ku xwendevan bixwînin û jê tiştan fêr bibin, jê tiştên nûh bihewisin. Em dê nivîsên lêkolînê yên li ser çand û edebiyata Kurdî jî biweşînin.

Kovara HELWEST

NIVÎSKARÊN SIRGÛNÊ

Senar ŞAHÎN

Di cîhanê de ji gelek welatan, nivîskarên wî welatî ji ber sedemên sîyasî ji welatê xwe bazdane û çûne welatekî din û wî welatî ji xwe re kirine cîhê jîyanê, li wê cîh û war bûne. Dîroka ronakbîr û nivîskarên Kurd dîroka sirgûnê ye. Gelek rewşenbîrên Kurd di xerîbiyê de, di welatên biyanî de serê xwe danî ye, çûye ser heqîya xwe. Gelek ronakbîr ji malbata Bedirxaniyan û ji mala Cemîlpaşa di biyanîtiyê de wefat kirin. Nuredîn Zaza, Nurî Dêrsîmî, Îhsan Nurî Paşa û gelekên din, ên dawî jî Mihemed Bekir li welatên xerîb koç kirin çûn ser heqîya xwe.

Nivîskarên Kurd yê penaber li welatên biyanê ji bo doza neteweya Kurd gelek kar û xebat kirin, xizmetên mezin kirin, berhemên giranbiha afirandin. Ew perçeyek ji dîroka têkoşîna neteweya Kurd in. Pirtûkên dîrokî ku wan nivîsiye (Binêrin Nurî Dêrsîmî - Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsîm, Îhsan Nurî - Dîroka Kurd, Zinar Silopî - Doza Kurdistan û herweha bi dehan pirtûkên din) beşek ji dîroka neteweya Kurd ronahî dike. Berhemên wan di hêla dîrokî, zimanî, çandî û edebî de serçavî ne, ji bo ronakbîrên Kurd yê nûha çavkanî ne. Kovar û rojnamên ku di wê demê de hatine weşandin, qîmet û rûmeta wan îro jî li cem ronakbîr û nivîskarên Kurd yê wê demê gelek bi qîmet e. Kovara

Hawarê hêj jî di hêla rêziman û rast-nivîsa Kurdî û Alfabeya Kurdî de rê nîşanê me dide. Em di gelek warên nivîsandinê de hîmên xwe ji Kovara Hawarê digrin. Wê ji xwe re dikin rêzan. Li ser wê şopê dimeşin.

Wexta ku di 12 Îlonê de li Tirkiyê derba askerî ya faşîst çêbû û cunta askerî a faşîst hat ser hikûm, piştê derbê gelek ronakbîr, nivîskar, welatparêz û şoreşgerên Kurd derketin derveyê welat û piraniya wan çûn di welatê Ewropa de cîh û war bûn. Ev penabirên Kurd yê sîyasî li sirgûnê çapemenîya Kurdî û edebîyata Kurdî ya sirgûnê afirandin. Piştê 1980î û vir ve ji 200î zêdetir kovar û rojnamên Kurdan li Ewropayê hatine weşandinê. Gelek pirtûkên edebî piştê dema 80yî hatin weşandin. Gelek nivîskarên Kurd yê penaber pirtûkên xwe yê yekem li ewropayê çap kirin û weşandin. Edebiyata Kurdî ya nûjen di vê demê de dest pê kir. Çend nivîskarên Kurd ku pirtûkên xwe yê yekem bi zimanê Kurdî weşandibûn, pirtûkên xwe yê din êdî bi Kurdî nivîsîn û weşandin. Nivîskarên Kurd yê ku di sirgûnê de dijin bi dehan romanên Kurdî û bi sedan pirtûkên helbest û çîrokên Kurdî weşandin. Di hêla çand, ziman û edebiyata Kurdî de nivîskarên sirgûnê yê penaber xizmetên gelek hêja kirin û dikin. ❦

PIRSGIRÊKÊN ZIMANÊ KURDÎ Û PÊKHANÎNA ZIMANÊ HEVBEŞ

M. YILMAZ

Pirsgirêkên zaravayên kurdî jî wek problemên civata Kurdistanê piralî û cihêreng in. Çareserkirina wan, bi pirsra yekbûna neteweyî û serxwebûna Kurdistanê ve girêdayî ye.

Gava em li ser vê pirsgirêkê hûr dibin, dibînin ku pirsra herî giring, pirsra zaravayên kurdî û dijiwariya yekîtiya zimanê nivîskî ye.

Carna ferqa zimanê fermî û zaravayan ew e ku, zimanê fermî ne tenê li ser variantekê erdnasiyê ava dibe, ew hin taybetiyên zaravayên xwe yên din werdigire û êdî ew dibe zaravayekî nûh.

Pêkhanîna zimanê swêdî yê fermî, li ser swêdiya navçeya Stockholmê hatiye avakirin. Ji ber ku dewlet jî aliyê rêzanvanên Stockholmê ve hatiye îdarekirin. Heger em dîsa vegerin li ser pirsra zimanê swêdî, zaravayê Svealandê anku yê Stockholmê gelek peyv û forman jî zaravayên din girtiye.

Demeke dûr û dirêj kesên ku bi almanî deng dikirin, hebûn, ji yên swêdî pirtir bûn. Piştî, kesên dewlemend bi fransî dipeyivin. Paşê li ser giringiya zimanê hevbeş hate rawestandî.

Di 1300- 1400ê de, Norwêj kete destê Danîmarqayê. Zimanê fermî bû danîmarqî. Ev dem heta sala 1800î dom kir. Di vê demê de, di navbera Brîtaniya Mezin û Fransayê de şerekî dijiwar hebû.

Danîmarqayê piştigiriya Napolonî dikir, lê ew jî bi serneket. Ji ber vê yekê, şahs kete destê Norwêjê, ew ber bi serxwebûnê ve çû, azadiya xwe bi dest xist. Îro li Norwêjê du zimanê fermî hene; "Norwêjî û norwêjiya nûh Anku "Norsk" û "Nynorsk". Li Hindistanê, hejmara ziman û zaravayan derbasî 100î dibe. Li Albaniyayê du zaravayên sereke hene. Li Fîlîpînê gelekî zimanên cuda hene, ku rê li ber pirsra neteweyî nagire. Li Swîsê sê-çar zimanên fermî hene. Îro bi sedan ziman hene ku hêj rizgar nebûne. Bi taybetî li Asya, Afrîka û gelekî welatên paşvemayîn, ew hewl didin ku xwe ji bin nîrê kolonyalîzmê rizgar bikin. Heger em vegerin ser pirsra yekbûna zimanên Ewrûpayî; "Piraniya welatên Ewrûpayê, bi alikariya zaravayan, zimanên xwe yên fermî pêkhanîne". Pêkhanîna zimanên Ewrûpayî wek zimanên fermî di navbera 1600- 1900 de pêkhatiye. Li Rojhilata Afrîkayê, carna yek ziman du awayan hatiye nivîsandin. Çima? Ji ber ku welat hatibû dagirkirin, nivê welêt koloniya Fransayê û nivê din jî di bin nîrê Brîtaniya Mezin de bû. Ev tişt jî bo Kurdistanê jî derbas dibe. Ev yeka han, karê yekgirtina zimanê kurdî dijiwartir kiriye.. Bi baweriya min, yekbûna zaravayên kurdî, bi gelemperî bi pirsra serxwebûna welêt ve hatiye girêdan. Ji aliyê din ve jî,

Pirsgirêkên Zimanê Kurdî

piraniya kovar, rojname û pirtûkên perwerdekirinê, ji aliyê partî û rêxistinên rêzanî ve têne weşandin û belavkirin.

Hemû partî û rêxistinên kurd, bi çavekî sîyasî li pirsên rêzimanî û rastnivîsê dinêhêrin. Lê ew bixwe jî lihevna kin. Lihevnekirina wan geş û problemên zimanê kurdî diwartir kirîye. Ji bo çareserkerina vê pirsê pêwîst e ku rewşenbîr û zimanzanên kurd li hev bikin, bibin yek hêz û bi hev re bixebitin...

Alfabeya kurdî bi alfabeyên pircure û cihêreng hatiye nivîsandin. Ev yeka han ne bes bû; bi alfabeyên sûryanî, ermenî, kirîlî û h.w. jî dihate nivîsandin.

Di sala 1911-1912an de alfabeyêke ezîdî-kurdî hatiye çapkirinê, mîna tîpên erebî ji aliyê çepê ve ber bi rastê dihate nivîsandin. Ev karê han, ji aliyê Ebdîrrezaq û Simkoyî ve dihate meşandin. Dr. Celîlê Celîl di pirtûka xwe de nivîsiye; "Ji bo bicîhanîna vê armancê Ebdîrrezaq du şertan pêşkêş dikir ew jî ev in: Yekem alfabeya erebî, ji bo ku hinek dengên zimanê kurdî têde nîn in, gelek bi kêrî kurdan nahê. Ya duwem hewceye alfabeyêke kurdî-rûsî bê danîn." Paşê, naskirina Ebdîrrezaq û Simko bi Y. Mar û Orbelt re çêdibe û ji wan alîkarî dixwestin ji bo ku dibistanên kurdî vebikin. Orbelt dinivîsîne ku pêwîstiyêke bi alfabeya kurdî- latînî heye. Anku li gorî dîtina wî alfabeya kurdî-rûsî li zimanê kurdî nahê. Abdullah Cewdet weha nivîsiye; "Pêwîst e ku kurd alfabeya xwe biguhêrin. Ji ber ku alfabeya Osmanî li zimanê kurdî nahê." Salih Bedirxanî jî weha nivîsiye; "32 herfên ku di zimanê

tirkî- Osmanî de hene ji bo zimanê kurdî ne bes in." Paşê Salih Bedirxanî heşt tîpan li ser alfabeya Osmanîyan zêde dike û pêşkêşê kurdan dike. "Abdirreman Bedirxanî jî wisa nivîsiye; "sîstema dengên zimanê erebî ji bo kurdî bi kêr nahê û ji ber vê yekê ji danîna pêwîstiya alfabeya kurdî hatiye holê." Dîsa li gorî dîtina Mesut Silêmanî jî pêwîst e careke din li ser alfabeya kurdî bête rawestandî. "Ev pirs alfabeya Kurdî hîn jî têt munaqêşekin. Zimanê Kurdî zimanekî fireh e, dewlemend e, di alfabeyekî teng de nayê bi cîhkirin. Hinek bijin 28 tîp nîşana alfabeya Ewropîye, lê alfabeya Kurdî di alfabeyekî wisan de bi cîh nabe. Bi bîrûbawerîya min, pirs herî giring pirs alfabeya kurdî ya hevbeş e. Ya duwem jî, pirs gramatîka kurdî ya hevbeş e. Di 7ê meha kewçêrê (çiriya pêşîn) de li Swêdê civîneke li ser gelşên zaravayê kurmançî hate çêkirin. Di civînê (panel) de çend berpirsiyar û nûnerên kovaran jî deng kirine. Di vê civînê de, li ser pêwîstiya alfabe û gramatîka kurdî ya hevbeş nehate rawestandî.

Di warê pirsnasî, rêzimanî, morfolojî, fonolojî, etîmolojî û termînolojî, assîmîlasyon û semantîkiyê de jî, di zimanê kurdî de xebateke bi rêkûpêk nehate kirin. Ev yeka han çareserkerina hin pirsan diwartir kiriye.

Digel vê yekê jî, heger bawerîya me, bi yekbûna hêzên Kurdîstana bakûr û başûr hebe, hingê bawerîya me bi yekbûna zimanê me yê hevbeş jî divê hebe. Yekîtiya zimanê fermî li her wela-tekî bi awayekî cihêreng pêkhanîye. Di

Pirsgirêkên Zimanê Kurdî

dema çûyîn de bi darê zorê, lê niha bi metodên zanistiyê. Yanê zimanê hevbeş bi zorê çênabe. Divê ew li ser xeta reyalîzma civakî bête avakirin. Bi bawerîya min, pêkhanîna zimanê hevbeş bi yekbûna hêzên bakûr û başûr ve jî girêdayî ye.

Gava mirov bixwaze behsa rêzimanê kurdî bike, hingê navê çend kurdzanên ewrûpayî têtê ser zimanê mirovî. Ji ber ku wan berê kurdan bingeha rêzimanê kurdî daniye. Di vî warî de, di çavkaniyekê swêdî de weha hatiye nivîsandin: " Karê gramatîka zimanê kurdî ya pêşîn ji aliyê Garzonî ve hate kirin, lê paşê ev karê han kete destê Rodiger û Pottî. Dîsa di hin çavkaniyên swêdî de behsa giringiya lîteraturên jêrîn têtê kirin; Lech, "forschungen über der kurden"(1857-58), Muller, "Kurmancî dialekt der kurdensprach"(1864), "Zaza-dialekt der kudensprach"(S. A.), A. Jaba "Dictionnaire kurdenfançais"ji aliyê Justî ve amadekirin û derxistin, Justî "Kurdcsh gramatîk(1880), Yusuf El-chalîdî", Kurdîsch- arebîch ordbok"(1892) Prym û Socîn, " Kurdîsch samlungen" (1887-90) De Mongon, " Mîscion(...)En perse V. : Etdes lîngusques" (1904). Dîsa di çavkaniyekê swêdî de weha hatiye nivîsandin; " Kurd di nav xwe de dibin pênc bir: Kurmanc, kelhur, lor, goran û dimilî ne. Nivîskar li ser nêzîkbûn û dûrbûna lorî û goranî radiweste, dibêje herdu zaravayên hanê di nav zimanê kurdî de ne.

Di derheqa zaravayên kurdî de, di kovara "Hêvî" de(di kovara înstutuya kurdî ya Parîsê de) hatiye nivîsandin ku sê zara-

vayên kurdî hene, ew jî ev in: "Kur-mancî, kurmanciya xwarê(soranî) û dimilkî. Lê heger mirov bi çavekî vekirî li zaravayên kurdî mêze bike, çar- pênc zaravayên kurdî hene. Di derheqa binavkirin û hejmartina wan de hevbiyeyekê tevayî nîn e. Ji ber ku zaravayên kurdî ji aliyê zanistiya zimên ve nehatine vekirin û munaqaşekirin. Lewra jî, carna zazakî di nav goranî de anku goranî di nav zazakî de û carna jî soranî di nav kurdiya bakûrî de dibînin û carna jî zazakî, goranî û soranî wek zaravayên serxwe bi nav dikin.

Lêkolinên ku ji aliyê gelek zimanzanên ewrûpayî ve hatine çêkirin nîşanî me dide ku di zimanê kurdî de çar- pênc zaravayên kurdî yên sereke hene. Nivîskarê kurd, Senar Şahîn di nivîsekê xwe de weha nivîsiye: " Li Kurdistanê, çar zaravayên kurdî hene. Kurmancî, Soranî, Dimilkî û Goranî". Ji bo yekîtiya van her çar zaravayan, divê ji niha ve kar û xebat bête kirin. Rast e, divê ji niha ve kar û xebat bête kirin. Bi gotineke din, pêwîst e em xebata xwe ji bo pêkhanîna zimanê hevbeş kom bikin.

Dîsa nivîskarê kurd, Faud H. K. weha dibêje:"Zaravayên kurdî li gora rastiyên erdnasî û zanistiya zimên, di nav çar zaravayên sereke de dabeş dibe:

- 1.kurmancî
- 2.Kurmanciya navîn
- 3.kurdmanciya başûr
4. Goranî

Zimanzanê kurd, Feqî Huseyîn S. di pirtûka xwe ya bi navê "Rêzimanê Kurdî" de weha dibêje:" Piştî hatina îslamîyetê; ji ber zordariya eşîrên ereban,

Pirsgirêkên Zimanê Kurdî

ji bo xwe parastinê kurd carek din ji derketin çiyar û ji nû ve jîna aşîretî destpêkirin. Ji ber vê yekê zimanê Kurdî yê kevin bû çar(4)bir, çar zarava:

1. Soranî
2. Lorî
3. Zazakî
4. Kurmancî

Weke tête zanîn, beriya hatina îslamiyê zaravayên kurdî hebûn. Yanê dîroka derketin û cudabûna zaravayên kurdî, ji dîroka îslamiyê kevntir e.

Zeynelabîdîn Zinar di nivîsekê xwe de weha dibêje; " îcar rastiya meselê ev e: Çi soranî be, çi kurmancî be çi dimilkî be, çi hewramî be çi jî feylî be, hemû hemû devokên kurdî ne. Sedemê ku ew ketine vê rewşa niha jî, dabeşkirina Kurdistanê ya 1639-an e, sîyaset e, bikaranîna sê- çar cure alfabeyan e û tîn û zordariya zimanên biyaniyan e."

Dilê min jî dixwaze ku zaravayên kurdî, devokên kurdî bin. Ev xwestineke ye, nabe em vê xwestinê weke dîtineke zanistî diyar bikin. A. Zinar sedemên derketin û jihev cudamayîna zaravayên kurdî, bi dabeşkirina Kurdistanê ya 1639an ve girêdide. Ev yeka han ne rast e. Dîtinek gelek şaş e. Dîroka zaravayên kurdî pir kevn e. 700 sal BZ. Loristan hebû. Peymana Qesrê Şêrîn ya sala 1639an, di derheqa pêknehatina zimanê hevbeş de roleke leyîstiyê. Lê ew nabe sedemê bingehîn.

Zaravayên neteweyên kolonyalîstan jî hene. Zaravayên wan dewlemendiya zimanên wan in. Zaravayên zimanê kurdî jî weke zaravayên neteweyên din, dewlemendiyan ziman û çanda kurdî ne.

Weke tê zanîn, sedemên derketin û cudabûna zaravayên zimanên cihanê gelek in. Lê çend ji wan sedeman, sedemên sereke ne, ku ew sedem hem ji bo zaravayên zimanên cihanê û hem jî ji bo zaravayên kurdî derbas dibin. Çimkî zimanê kurdî jî beşek ji zimanên cihanê ye. Lewre jî ew sedemên ku ji bo zimanên cihanê derbas dibin; ew sedem jî bo zimanê kurdî jî derbas dibin. Ez dê wan sedeman li jêrê binivîsînim.

Ne rast e meriv bi çavekî fantazî li zaravayên zimanê mêze bike. Tunebûna zaravayên kurdî, tunebûna dewlemendiya zimanê kurdî ye.

Bi baweriya min, hin devokên kurdî ev in: Beyazîdî, Botî, Hekarî, Şemdinanî, Mukrî, Behdînanî, Silêmanî, Germiyanî, Erdelanî, Bextiyarî, Bacelanî... Divê em ji zaravayên xwe netirsîn, ew dewlemendiya zimanê kurdî ye.

Ligor dîtina hinekan zaravayên kurdî ev in:

Kurmancî, Soranî (kurmanciya başûr), Zazakî(dimilkî), Hewremanî(goranî), Kirmanşahî, luri-feyl.

"Kurdî derya ye. Zarava, şêwe, devok, rûbar û çem û newalên vê deryayê ne. Divê, em tu carî mafê miçiqandina çilkek ava wan, di xwe de nebinin."

Nimûneyên ku min li jorê nivîstiyê diyar dike ku zaravayên kurdî jî aliyê zanistiya zimên ve nehatine munaqesekirin. Ji aliyê din ve, di derheqa binavkirin û hejmartina zaravayên kurdî de tevliheviyekê heye. Bi raya min, pênc zaravayên kurdî hene, ew jî ev in:

1. (Kurdiya bakûr(kurmancî): Nêzikî soranî ye.

Pirsgirêkên Zimanê Kurdî

2. Kurmanciya başûr (Sorani)
3. Dimilkî(zazakî): Nêzikî goranî, soranî û lorî ye.
4. Kurdiya rojhilata başûr(Lorî): Li Loristanê tê dengkirin.
5. Goranî(hewramanî)

PÊKHANÎNA ZIMANÊ HEVBEŞ

Kurdiyeye ji zaravayekî pêk bê, wekî merivekî dudest û yekling(pî) e. Yanê zaravayên kurdî weke kok û gevdê darê ne. Bi gotineke din, kurdî derya ye. Zarava û devokên wê çem û newalên wê deryayê ne.

"Hinek nivîskarên me yên ku tenê bi zaravayekî dizanin, dixwazin deryaya avê di çemekî de bixeniqînin". Zimanzanên kurd yên ku bi du zaravayan dizanin, dikarin li ser vê dabaşê rawestin. Yanê kesên ku bi soranî- kurmancî, zazakî- kurmancî, goranî- kurmancî anku soranî- lorî dizanin, dikarin bingeha alfabe û rêzimana hevbeş danin.

1. Têkilbûna zaravayan.
2. Navgihanên ragihanê: Televîzyon, rojnameyên navendî...
. Alfabe ya hevbeş.
4. Gramatîka hevbeş.
5. Desthilatdariya navendî(Dewleta kurdî ya yekbûyî)

SEDEMÊN JIHEVCU- DABÛMAYÎNA ZARAVAYÊN KURDÎ

1. Sedemên polîtîkî...

2. Şer û cîh guhartin.
3. Navenda şahrezayî û jiyana gunditiyê.
4. Danûstandin bi gelên cîran re, wek: Sumer, Yûnan, Faris, Aşur...
5. Li darxistina dewletên piçûk. Her eşîrekê dewletekê li dar xistiye
6. Çend rengên alfabe ya.
7. Kurdên îslamîst û yên din.
8. Erdnasî...
9. Bazirganî-kirinûfirotin.
Bêguman gelekî sedemên din jî hene.

ÇAVKANÎ:

- 1-De Internationella orden- Alvar Ellegord/A. Olofsson
2. 3Combi, Nordisk familjebok presenterar.
3. Grekernas verld, Bonniers verlshistoria3.
4. Senar Şahîn - Roj hejmar. 12.Yekîtiya zimanê Kurdî
5. M. YILMAZ BERBANG, Dîroka Alfabe ya Latînî-
6. BOTAN AMEDÎ, Kurtler ve Kurdistan tarîhî - Cîld - 1
7. U. Şexmus, BERBANG, Hinek dîtin li ser yekbûna ziman kurdî
8. Hemû tîbînîyên ku li ba min hebûn.

GUR Û HEFT KARİK
Amadekar
M. YILMAZ
Weşanên SARA

PESIN Û REXNE

S . MERWAN

Rexne û pesin du aliyê madalyonê ne. Bi hevdu re girêdayî ne, hevdu teman dikin. Çawan ku di jiyana civakan de, ya kesayetiyê de tiştên baş û xirab hene. Gelek tişt jî hene ku li aliyek ve rexne lê tê girtin, li aliyê din jî pesnê wê tête dayin. Hinek tişt hene ku hêjayê pesnê ne. Mirov li tiştêkî rexne bigire, kêmanî û çewtiyê wê bibêje, nayê wê maneyê ku di ew tişt de tiştên ku divê pesnê wê jî bê dayin nîn e.

Wexta ku mirov pesnê karek, xebatek, an jî berhemek dide, ji bo ku ew tişt pesnê heq kiriye mirov pesnê wê dide. Berhemek lêkolînê an jî berhemek edebî li gel kêmaniyê xwe pesnê jî heq kiriye. Wexta ku nivîskarek pesnê berhemeke nivîskarekî din dide, divê kesên din ji vê pesnê aciz nebin û vê pesnê bi hawayekî din şîrove nekin.

Em bibêjin ku yek rabe nivîsek binivîse û pesnê **M. Emîn Bozarlan, Hasan Yıldız, Mehmed Uzun**, yan jî **Rohat Alakom** bide, divê bête zanîn ku van nivîskaran bi xebata xwe, bi keda xwe, bi berhemên xwe vê pesnê heq kirin e. **M. Emîn Bozarlan** 30 sal e ku bê rawestan-

Pesin û Rexne

din xizmet dike, berhemên hêja diafirîne, lêkolînên zanistî dike. **Hasan Yildiz** lêkolînên gelek hêja kiriye û pirtûkên ku nivîsiye ji alî gelek nivîskarên pircure ve wek çavkanî tête nîşandan. Xebat û lêkolînên Rohat li holê ye. **Mehmed Uzun** ji bo pêşketina edebiyata Kurdî xizmetên gelek hêja kiriye. Gelek helbest û romanên Kurdî nivîsiye. Pirtûkxaneya Kurdî dewlemend kiriye. Min van her çar nivîskarên hêja wek minak da nîşandan ku, baş bê fêmkirin carna çira pesin hewce ye.

Di hêla ramanên felesefî de jî mirov mêze bike, hinek tiştan hem divê rexne bê kirin û hem jî pesnê wê bê dayin. Lê li cem Kurdan ev tişt bi hawayekî din hatiye fêmkirin. Kurd heger pesnê tiştê bidin, êdî qet rexne lê nagrin, yan jî heger rexne li tiştê bidin hendî qet pesnê wê nadin. Ev jî şaşîfî û baş ne têgihîştina tiştan tête.

Baş tête bîra min; di civînekî de yekî hem rexne li pirtûkek Mehmed Uzunî girt û hem jî pesnê pirtûkê da. Yekê din jî rabû gote: "Weha nabe tu hem kêmaniyê pirtûkê dibêjî, rexne li pirtûkê digirî û hem jî pesnê pirtûkê didî."

Di danasîna pirtûkeke edebî de, divê hem pesnê wê pirtûkê bê dayin (pirtûkek çiqas qelb e, çiqas xeletiyê wê jî hebe, miheqeq çihên wê ye pesnê jî heye) û hem jî heger hebe kêmanî û xeletiyên wê jî bê gotin.

Metoda danasîna pirtûkan, metoda rexnegiriyên edebî, metoda nirxandina berhemên divê bi vê tewirê be. Metodên weha metodên îlmî-zanistî ne. Di kovara **HELWESTê** de, di hejmara yekem de nivîskarê kovara **HELWESTê N. Zaxûranî** di nivîsa xwe ya "**Huner û Pêvajoya Nû**" de vê metoda zanistî bi kar haniye. Divê nivîskarên Kurd wexta ku berhemek binirxînin yekalî nebin. Bi çavekî objektîf, bi dualî wê berhemê binirxînin.✍

MÎR SUREYA BEDIR - XAN

Û

XOYBÛN

THE CASE OF KURDISTAN
AGAINST TURKEY

BY AUTHORITY OF

HOYBOON

SUPREME COUNCIL
OF THE KURDISH
GOVERNMENT

SARA

B. GORAN

Dîrok

Em kurd, ji ber ku bi kûrahî ji his û bîra xwe ya dîrokî dûrketin, me xwe nas ne dikir û me ne dizanî doza Kurd û Kurdistanê çi ye. Bê guman neteweyek bi vî cûreyî ya parçebûyî, pir bi hêsanî winda dibe. Em hatibûn vê xalê (nuxte) û ketibûn di nav vê rewşê de.

Em Kurd gelek deyndarê vê nifşa nû ya dozkerê serxwebûn û azadiyê ne. Bêyî vê hisyariya netewî ya dawî, Kurdistanê bakur, îro ne Kurdistanê bakur bû. Parçeyek ji Tirkîyê bû. Tirkbûn û kemalîzm di doza xwe ya gemar de biserketibûn.

Kêferateka giranbuha û dîrokiya doza serxwebûnê, di destpêka vê sed-sala ku em têde dijîn, her çend lawaz bû jî, bi rêberiya çend rew-senbîrên wê demê rûda.

Şikestina rabûna Şêx Seîdê Pîran, hêj birîna wê, di dilê welatperweran de kûr bû. Kemal Paşê, li pey têkçûnê, gelek stûyên welatperweran bire ber sêdaran. Yê dikaribûn xwe bidin alî, derbasî "binxetê" bûn. Komeke welatperwer li Sûrî û Libnanê gihabûne hev.

Diviya berxwedan berdewam bûya. Kemal Pasa bi destê xwe yê serbest ne maba. Li dawiya her ketinekê, rabûnek heye. Bi hêviya rabûneke din, biryara bergiriyê hate standin. Ev biryar damezrandina rêxistina XOYBÛNê bû.

Damezrandina XOYBÛNê

Rojek ji rojên buhara Lubnanê, dilê Kurdistanîyên misext û bêwar ji bo geşbûn û rabûnek lêdida. Binemala Bedr Xaniyan û welatparêzan, soza xwe ya dawiyê ji Kemal Paşê re hêj ne gotibûn. Ew buhara rengîn, dê di dilê neteweya me de her bima. Lewra rewşenbîrên weke yên bi navê Îhsan Nûrî, Mewlanazade Rifat, Memdûh Selîm, Mihemed Şukrî Segban, Xelîl Ramî, di gel birayên Bedir Xaniyan Sureya, Celadet û Kamûran, hîmê hisyariyeke neteweyî ya pîrî hêja, ji bo serxwebûn û azadiyê, rêxistina XOYBÛNê danîn. Cih Beyrût, sal 1927 bû.

Dema XOYBÛN hate damezrandin, hingê li Kurdistanê, hêj bîr û hizrên welatperweriyê germ û gur bû. Li Agirî, gelê Kurd bi kirinên komara Tirkîyê pir bi hêrs û fûr bû. Weke dema "fermana filehan" li pey têkçûna Şêx Seîd, vêca dem dema fermana kurdan a bi destê tirkan bû. Îhsan Nûrî, ku yek ji endamên damezrevanên XOYBÛNê, xwe gihan-dibû Serhed û Agiriyê, ku rêberiya rabûna gelê xwe bikira. Pir ne çû, serhildana Agirî rûda. Hemû hêzên leşkeriyên tirk, hajotin ser Agiriyê lê bêkêr bû. Rabûna kurdan vê carê ji rabûna berê pir xurttir bû. Bi mehan Agirî dan ber gulleyên topan û bombên ji firokan bariya ser serbazên leheng ên kurdan. Dijminî rê jî li wan birî bû. Çi xwarinên rohn û rij ne digiha Serhedê. Çarmedora Serhedê ji hêla leşkerê tirk ve hatibû vegirtin, Serhed ketibû binê ablûkayeke (muhasere) bênimûne.

Yên biryara rêxistina XOYBÛNê dabûn, dê kar û barê xwe ne tenê li Rohilata Navîn birêve bibirana. Her wisan jî biryar dabûn ku kar û bare siyasî û dîplomati jî li derveyî welêt bikin. Ji bo vî karî Mîr Sureya cawê birandî bû.



Mîr Sureya Bedir - Xan

Kurê Mîr Emîn Elî Bedr Xan Sureya nêzîkî tevayiya jiyana xwe bi xwendin û perwerdebûnê derbas kiribû. Xwendina xwe ya navîn li xwendegaha Constantinoplê (Stanbol) li "Mekteb-î Sultaniye" biribû serî. Xwendina xwe ya dawiyê jî, weke agronom (endezyarê çandinî) biribû serî. Wî gelek zimanên biyanî, weke îngilîzî, frensî, erebî, farsî û tirkî dizanibû.

Berhema bi navê "The Case of Kurdistan Against Turkey" – Doza Kurdistanê li hevberî Turkiyê

Pirtûka Doza Kurdistanê li hevberî Turkiyê – "The Case of Kurdistan Against Turkey" ji hêla XOYBÛNê ve ku sala 1927 li derveyî welêt, li Lubnanê hatibû damezrandin, çap bû. Nivîsevanê pirtûkê Mîr Sureya Bedr Xan e, ku ew yek ji girîngtirîn servanên li dijî kemalîzmê, yê destpêka vê sedsalê bû. Pirtûk cara pêsin sala 1928 li Filadelfiya, (li Amerîka) têt wesandin. Pirtûka Doza Kurdistanê li hevberî Turkiyê komek ji dokument û belge nameyên kurdî yên destpêka vê sedsalê ye. Dewleta xwînrij û paşdemayî ya tirk gelek hewldanên mezin daye ku ev pirtûk dernekeve ber ronahiya rojê.

Her wisan jî di dawiya pirtûkê de, komek ji dokument û belge nameyên kurdî bi swêdî hatine berhevkirin û serzêdekirin. Li herî dawiya pirtûkê jî, çend wêneyên neçapkirî hene.

Pêsgotina ji çapa yekemîn re, ji hêla nivîsevan û rojnamevanê hêja Herbert Adams Gibbons ve hatiye nivîsîn. Wî di pêsgotina xwe da ku ji vê bi nêzîkî 70 sal berê nivîsiye, dibêje: "It is good for us to know the Kurds and their heroic struggle to save their heritage of centuries. They say they will fight on; and I'm sure that they will." Anku "Me gelek pê xwes e ku em pê dizanin ku Kurd bi têkosîna xwe ya lehengane parastina hebûna xwe ya salan dikin. Kurd dibêjin ku em'ê ji bo vê yekê her têbikoşin; û min bawerî heye ku kurd dê her bi vî karî rabin."

Kêferata Mîr Sureya Bedr Xan û XOYBÛNê, Xebatek ji dîroka berxwedana kurdan e. Pirtûka Mîr Sureya Berir Xan ji nûh ve lê, li ser esasê orîjînalê wê - bi Îngilîzî- ji alî weşanxaneyê SARA ve hate weşandin. 

GABAR ÇIYAN Û ROJNAMEVAN -NIVÎSKARIYA WÎ

Gabar Çiyan, di gulana 1960î de li Tora Evdînê hatiye dinê. Rojnamevaniya wî, bi teşwîkkirina nemir MUSA ANTER, berî sala 1980î dest pê dike. Ew di bin aqilmendiya Musayî de, di rojnameyêke lokalî de dest bi nûçevaniyê dike û dûvre dibe birêvebirê giştî yê rojnameyê. Di ber de jî, nûçe û nivîsên wî di rojnameyên lokalî yên Mêrdînê û Kosarê de derdikevin. Paşê, di rojnameyên rojane yên li Tirkiyê weke nûçevanekî minfîqeyî û serbixwe yê Mêrdînê kar dike. Piştî demekê, li Amedê û Îstembolê jî kar dike. Di sala 1988an de lêkolîneke wî dibe sedem ku ew derbikeve derveyî welêt û li Swêdê bicî dibe. Li wê jî, rojnamevaniya wî dom dike. Ew bi çavekî dostanî li partî û rêxistinên Kurdîstanî dinêre û ji piraniya weşanên kurdî yên mîna Rewşen, Hêviya gel, Demokrat, Berxwedan û Welat re dibe alîkar. Bi derketina rojnameya Yeni Ülkeyê re dibe alîgir û paşê jî dibe berpirsiyarê liqê Swêdê. Ji bilî nûçeyan, lêkolînên wî yên din jî hene; li ser çand û adetên kurdan, di wan rojnameyan de piralî dihên weşandin. Paşê giraniya xwe dide ser karê şanogerî û sînemayî.

Pirtûka yekem ya Çiyanî bi kurdî û di sibata 1992an de derdikeve. "Kerek û heft gur û Mindalekan" ji du şanoyan pêk dihat. Qehremanê lîstîkê Kawa, nêzîkbûna Yekîtiya Miletan, li kurdan ji awira xwe ve rexne dike.

Di pahîza navîn ya 1992an de "Tarihte Kürt Sürgünleri-1" bi tirkî derket. Pirtûk, aliyek ji dîroka kurdan ya nefîkirinê ronî dike. ÇIYAN di vê pirtrûkê de analîza 200 salên dawiyê kirîye. Pirtûk, di "Musabeqeya Musa Anterî, 1993 ya rojnamevaniyê" de, di beşa lêkolînê de layiqî xelata duwem hate dîtin.

Ji bilî herdu pirtûkên wî, 14 berhemên wî yên din jî derketine. Naveroka

pirtûkên wî bêhtir berê xwe didin lîstik û analîzên şano û sînemayê, çanda kurdî, kultur û adetên aşûriyan. Beşek ji lîstikên wî yên şanoyê, ji bo zarokan hatiye amadekirin.

Berhemên wî yên Şano û Sînemayî

"**Bexçeya Zarokan**" bi kurdî û di pahîza paşîn ya 1992an derket. Aliyek ji pirtûkê, şanoyên zarokan hambêz dike. Lîstik li ser çîrokên heywanan hatine avakirin.

Nivîskar, di berhema xwe ya "**Pîrsa Sînema Kurd û Yılmaz Guney**" de dîtînen sînemekarên kurd li ser pîrsa sînema kurd û Yılmaz Guney girtiye û analîzek li ser 113 filmên Yılmazî ji awira kurdperwerî û hunerî ve kirîye. Pirtûk bi kurdî û di adara 1993an de derketibû. Li ser pirtûka wî di rojnameyan de munaqêşe hatin kirin û pirtûk ji aliyê weqfa Yılmazî ve piralî hate belavkirin.

"**Mele Nisredîn**" piştî xwe dide pêkenokên Melayê Meşhûr. Nivîskar, ew pêkenok xistine forma kurteşanoyan. Berhem kurdî û swêdî bû û di firmeha 1993an de hatibû belavkirin. Ev berhem bêhtir berê xwe dide zarokên kurdan yên ku li Swêdê dijîn.

Çiyan, di berhema xwe û Bekîr Yildiz ya "**Şorbe**" de hin bûyerên Kurdistanê berhev kirine û rengê şanoyê dane wan. Şorbe kurdî bû û di îlona 1993an de ji çapê derket.

Rojnamevan-nivîskar Gabar Çiyan, piştî şehîdkirina Musa Anterî biryar da ku bi berhemên xwe yên şanoyî bide pey şopa berhema wî ya bi navê "**Brîna Reş**". Çiyan, piştî vê biryarê hewl da ku her sal di salvegera şehîdkirina nemir MUSA ANTER de berhemeke şanoyî biweşîne. Li ser vê bingehe berhema wî ya yekem "**Êşa Zirav**" bi kurdî di îlona 1993an de derket. Zahîr Kayan, Welat 21-27 de dibêje: "Çiyan bi hêsanî jiyana gelekê bindest û psîkolojiya wî fîne zimên. Di van şanoyan de li ser naverokek herî giring rawestîye, jiyaneke berbiçav û hemdem di şanoyan

Berhemên Nivîskaran

de bersîvandiye. Gava mirov van şanoyan dixwîne, birîndariya gelê kurd, qelsiyên wî, bêkesî û nezantiyên wî dibîne." Di berhemê de du lîstikên şanoyê hebûn ku nexweşiyên di nav civata kurdan de dihanîn zimên. Li ser van herdû lîstikan di kovar û rojnameyên kurdî de munaqêşe hatin kirin û lîstik li hin deveran hate leyistandin.

Berhema duwem "Bîrova Çavan" ji aliyê weşanxaneya JÎNDAN ve, di gulana 1995an de hate weşandin. Weşanxaneya JÎNDAN berhemên Gabar Çiyanî yên kevn û herî baş ji nûh ve raçav kir û weşand. MEHMED UZUN li ser vê pirtûkê dîtina xwe wisan diyar dike: " We pir baş kirîye ku piyesên Gabarî ji nûh ve raçav kir û weşand..."

Berhêmên li ser Çanda Kurdî

Analîza wî ya li ser çanda kurdî li ser pêkenokên kurdî ye. Di berhema xwe ya bi navê "Pêkenokên me" de hewl daye ku cih û nirxên pêkenokên kurdan di civatê de bîne zimên. Pirtûk bi zimanê kurdî û di fîrmeha 1993an de derketibû. Çiyan, di berhema xwe ya "Salvegerên Kurdan" de, rojên dîrokî ku di çand û dîroka kurdan de bi nirxin anîye ba hev. Di amadekirina vê berhemê de gelek çavkanî hatine bikaranîn û berhem kurdî ye û di adara 1994an de weşiyabû. Rojnamevan-nivîskar Gabar Çiyan, bi muzîsyenê kurd nivîskar Beşîr Botanî re di hezêrana 1994an de li ser jiyana hunermendê kurd "Ehmed Salih Siloyî" berhemêke bi kurdî afirandine. Di vê berhemê de stranên wî hatine berhev kirin. Nivîskar, di berhema xwe ya "Kurdiska ordspråk" de nêzîkî 100 gotinên pêşyan yên kurdî kirine swêdî. Berhem di îlona 1994an de derketibû.

Berhemên li ser çand û adetên aşûriyan

Weke li jorê jî hate qalkirin, nivîskar li Tora Evdînê hatiye dinê. Li vê deverê kurd û aşûrî (suryanî/kildanî) cînar in. Bi taybetî jiyana di navbera Mîdyadê, Hezexê, Cizîra Bohtan û Nisêbînê pirkulturî ye. Li wir

Berhemên Nivîskaran

çanda aşûrî, ermenî, kurdên yahudî, êzîdî û yê nî misilman bi hev re dijî. Xweşbûn û nêzîkbûn di nav kulturên Mezotamyayê de hebû. Lê niha jî ber hovîtiya dagîrkêrî û fesadiya olî, ber bi nexweş û xerabkirinê ve diçe. Çiyay, bi berhemên xwe van rengên li Tora Evdînê dide nasîn. Çandên wan gelan li hev nêzîk dike û dixwaze biratiya wan qewîntir bike. Ev berhemên wî weke rêzepirtûk derdikevin. Berhem bi zimanê tirkî, kurdî û hatine nivîsandin. Berhema yekem **"Gelê ku em bi hev re dijîn, Aşûrî-1"** di sersala 1993an de derket. Di vê berhemê de jiyana serokê aşûriyan Metran Paulis Bêdarî heye. Bêdarî, dostê kurdan yê herî nasdar bû. Di vê pirtûkê de lavijên suryaniyan ku bi tîpên suryanî hatibûn nivîsandin, hatine wergerandin bo kurdî. Lawij di salên 1800î jî teref keşeyek suryanî jî bo Mîrê Bohtan hatibû nivîsandin. **"Gelê ku em bi hev re dijîn, Aşûrî-2"** di nîsana 1993an de derket. Berhem jî çend şanoyên zarokan pêk hatiye, ku ew berê xwe didin zarokên aşûriyan. Naveroka şanoyan, xurtkirina biratiya zarokên aşûrî û kurdan jî xwe re bîngeh digire. Di dawiya pirtûkê de gotinên pêşiyên yê kurd û aşûriyan ku dişibîne hev, hatine berhevkirin. **"Gelê ku em bi hev re dijîn, Aşûrî - 3"** an de analîzekî li ser muzîka aşûriyan hatiye kirin. Di dîrokê de çawa muzîka kurdî pêrgî ya aşûrî bûye û çî tesîr li hev kirine, hatiye analîzkirin. Analîz bi gelek stiranên aşûrî û kurdî hatiye xemilandin. Berhem, di tîrmeha 1993an de derket. **"Gelê ku em bi hev re dijîn, Aşûrî-4"** de, dawetên aşûriyan tê analîzkirin. Herwisan tesîra dawetên aşûriyan li ser yê kurdan, digel stiran û cureyên govend û heta guhestina bûkê, di pirtûkê de hatiye dayîn. Berhem, di pahîza paşîn ya 1993an de belav bûye. Pirtûkên nivîskarî ku li ser aşûriyan hatine nivîsandin jî teref weşanxaneyên aşûriyan **"Nsibin"** ve hatine çapkirin.

Bi tevayî 16 berhemên nivîskarî derketine. Rojnamevan-nivîskar Gabar Çiyay li ser lêkolînên çanda kurd û aşûriyan berdewame. Di ber de jî, bi redaksiyonek hevbeş re kovara **"Şano û Sînema"** derdixe.

JI EDEBIYATA NÛJEN HELBESTÊN KURDÎ

RIYA DIRÊJ

XÊZAN ŞÎLAN

Berbangê diavêt
Rêwitiyekê dirêj destpêkiri bû
Ez diçûm di wê riyê de
Di destê min de pirtukek
Pirtuka helbestan
Min hêdî-hêdî
Rûpelên wê werdigerand
Wek gavên xwe
yên ku min pêşde diavêtinin
Giran û giran diçûm
Di wê riyê de.
Riyek, ya ku ber bi azadiya min ve
diçû..
Riyek, ya ku ber bi evîna min û
hezkirina min ve diçû..
Riyek,
ya ku ber bi mirovahiyê ve diçû
Riyek, ya ku ber bi mafê min ve
diçû..
Riyek, ya ku ber bi strana min ve
diçû..
Hemû dibûn yek
Di hedefêkê de
Di riya hurmet û rûmetê de
Riya dirêj
Riya ku min dibirim
Hêviya min
Bêriya min
Ez di wê riyê de diçûm.
Li piyê min ê rastê
Dengê pêlavên behrê
û tîrêjên rojê diçirîsîn
Di nava avê de
Wekî awirên çavên min
yên ku temirîni (vemirîni)
Ji nû ve diçirîsîn
Li piyê min çepê

Dengê pelikên daran
Yên ku dikirin xişş û xuşş
Dengê çûkên ewra
Yên bi dilşewat
Wek strana min
Wek hewara dengê min
Wek sewdaya azadiya min
Ez di wê riyê de diçûm
Riya dirêj bi gavên giran
Carinan mirovên ku
Pît dimeşiyên
Bi gavên lez
Derbas dibûn ji min
Ber bi yek hedefê ve
Wekî bev bi evîna xwe û
Azadiya xwe ve dibezîyan.
Mêrî(gêrik) direvîyan
Ji ber gavên min
Wekî nedixwestin
Di bin lingên min de bimînin
Min gavên xwe
Bi diçet diavêtin
Lê xilasbûna wan tunebû
Ji ber ligan
Wekî dihatin pelixandin
Bêguneh bûn
Bêtawanbar bûn
Dimirîyan
Di bin lingên min de
Bi destê mirovan
Wekî ez bûyî bûm
Qetîlê gêrikan
Hîsa tawanbariyê
Dijîm di nava dilê xwe de
Mêrî yê bextreş
Mêrî yê belengaz
Ez diçûm di wê riyê de

Helbest - Riya Dirêj - Xêzan Şîlan

Riya dirêj
Wek ava lehiyêkê
Ber bi çaralî yên min de biherike
Wekî çaralî yên min
Hawîrdor girtibûn
Riya ku diçû
Azadiya min û evîna min.
Rojê tîrêjên xwe berdabûn
Diçirîstî û germiya xwe belav dikir
Li dora min
Wekî dilê min, evîna min û
Sewdaya min ya sarbûyî
Ji nû ve germ dikir
Wek xwîna canê min
Di damarên min de digeriya
Ez diçûm hêviya xwe
Ez diçûm hesreta xwe
Evîna xwe û strana xwe
Di wê riya dirêj de.
Bayêkî hênîk dihat
Ber bi serçavên min de
Şaxên daran dileviyan
Xiş-xişa pelikên daran
Wekî gewdeyê-canê- darê
Dicirîfiya
Wekî tirsek, êşek, êndîşek
û heyecanekê
Di nava dilê darê de girtibû
Ez diçûm di wê riya dirêj de
Riya hurmet û rûmetê..
Min bi êş û ax
Cixara xwe dikişand
Cîgera xwe
Bi her girtin û berdana
Nefesa xwe re
Germiya sewdayê
Germiya azadiyê
Hîs dikir min di nava dilê xwe de
Di wê riya dirêj de
Di dilê min de
Xem û êş, tirs û xov
Min dixwest bavêjim

Lê nediçû
Wekî di nava dilê min de zeliqîbûn
riya dirêj
wekî ez bi tenya serê xwe ma bûm
Wekîez hatibûm terikandin
Dijîyam di xeyala xwe de
Di dinya xwe ya biçûk de
Ez diçûm di wê riyê de
Riya dirêj ya ku di xeyala min de
bû
Ya ku min dibir ser riya bişeref û
azadiyê
Tiştê hebû di dilê min de
Wekî rik, nefret û tolgirtin
Dijîya di serê min de
Nefreta însanan xwe dagirtibû
Di mêjûyê min de
Wekî ne bidestê min bû
Min nedikarî ji nava dilê xwe
Ji serê xwe bavêjim
Min awirên çavên xwe
Berdabûn niqtekê
Wekî ew awirên çavên min bûn
wekî ew hîsên min yên şeşan bûn
Riya azadiyê û sewdayê
Nîşanî min dida
Hîsên min,
Yên ku bi evînê, bi sewdayê
Bi êşê, bi derd û kulan û bi azadiyê
Hatibûn dagirtin
Ez diçim di wê rîya dirêj de
Bi gavên giran
Roj dibiriqî, ez digeriyam li evîna
xwe
Li azadiyê, li sewdayê, li strana
xwe
Li govenda xwe, li axa xwe,
Di wê riyê de, diçim
Riya azadiya KURDISTANÊ.

Xizan Şîlan

LI SER REWŞA EDEBÎYATA KURDÎ

Bi Medenî FERHO re

HEVPEYVÎN

Nasnameya Kurdî zimanê Kurdî ye
Romana Kurdî divê bi Kurdî bête nivîsandin
GELÊ KURD LAYIKÊ ROMANA BI ZIMANÊ XWE YE

Pirs – Rewşa edebîyata Kurdî a nivîskî çawa ne?

Medenî FERHO: Belê, wêje û nivîsandina Kurdî di çeperek pîrr dijwarde ye. Li ber xwe dide. Ji ber ku ev pirs li masetê di awaza neteweyî de hêj pirs-girêkek bê çareserî ye. Bi axîn û lorîn deng dide. Zelalî û paqijîya rêgirtina pêşveçûnê di astengiyê de ye. Gav avêtine..... Lê, gavên laşê nexweş in. Gav, nebûye dudu. Bi gava pêşî re di keve..... Zarokek di dema çalepkê de ye.... Hêj nerabûye ser lingan. Piştî 80 yî ku koma xwendevanên Kurd mecbûrî reva Ewropa bûn, (ne bi derbekê re be jî, ew toz û remedilka polîtîka dev-jenkê ji ser xwe weşandin) têkiliyek hampa bi nivîsandinê re çê bû. Nivîsandin û axaftina Kurdî... Rewşenbîrî hate bîra wan. Hinekî, sedema aborî jî têde hebû. Ji hêla nivîsandinê, çand û wêje de, dergehên meferê li Ewropayê vekirî bûn. Çelengên Kurd, ev mefer û ferezende xweşik û delal bi kar anîn. Ev jî, bû sedema xilmetkirin û çîrisandina cewherên mirovan. Heya îro jî berdewam e.

Belê, mêrên xwedî cewher û dilovaniya hunerî mane li ser piyan. Ê din, mîna dara bê ax bi mîne, berê xwe nefiland û ketin rêçikên din. Ev demek - eşqedînî- bû. Ji tirata polîtîk ketina tirata nivîsandinê bû. Nivîsandin jî, xwendevanî jî mîna hobiyekek pîralî di nava Kurdan de xwe dîyar kir. Nivîskaran dinivîsî, xelkê dikirîn, dewletên Ewropî jî alîkarî dikirin. Her sê rex, bi vê danûstandinê dilşad bûn. Razîbûnek hember hevûdu pêk hatibû.

Heger ev dem, demek kin bû jî, ji bo wêja Kurdî bû gavên bingehîn. Kes nikare vê rastiye înkâr bike. Destavêtina klasîkan heya bigihe berhemên hemdemî jî, li dûv hevûdu hatin hilkişandin. Li ser wan hate axaftin. Kovar û rojname derketin. Rojnamegerî, nivîskariya profesyonel derkete meydanê.

Hevpeyvîn

Dewletên Ewrûpî çavkanîyên diravan, ji ser wan qutkiribin jî, Kurdan ev karûbar bi evîndarî berdewam kir. Kovarek mîna Nûdem berhemê van salan e ku di wêja Kurdî ya hemdemî de cîh girtiye, nivîskar derxistin, klasîk wergerandin, serdariya nûjeniyê dike û hwd.

Bi rastî gavên girîng hatine avêtin, berhemên çê û berçav jî derketin meydanê. Îro em dikarin bêjin - Kurd xwedî wêje ne... Lê mixabin, ev gav zû westiyan, ev berhemên çê û berçav zû rawestiyan. Xwediyê pênuşan bi demê re gav navêtin, ji nava tevgera koman de cîh ne girtin, li paşya tevger û guhertinan man. Sedema vê rawestandinê, bingehêk pirr misrî man. Ew bingeha ku wêja cîhanê di nava reş û geşiya wê de hate guvaştin. Mîna romantîzmê, klasîzmê, dadaîzmê, realîzmê û hwd. Rewşenbîr ne di nava gelê xwe de bûn. Ne li nava gelê xwe dest bi vî karê neteweyî kirin. Ev dûrî, bu sedema berhemên dûrî tevgerê jî. Ku hêrişên rêxistin û koman bi dijwarî çû ser rewşenbîran jî, rewşenbîr tertûbela bûn, dûrî tevgera gel jî ketin. Xwe spartin deverin din. Xwe spartin hundiruwê rekiha hesinî., xwe spartin hundiruwê qaqlîkê hêkê. Wilo girtî û dûr man. Sedema duyemîn jî Ewropa bû. Rehetî û xweşî.... Rewşenbîriya Ewropa hêsa ye, xweş e.... Sazî û dezgehên xwe ava nekirin. Ê ku hatin avakirin, karê polîtîk bû tercîha wan. Sedem kursî bû.... Sedemek din: Şertên nivîskariyê, destpêk, şagirtî û hostatiyê bi cî nehatibûn. Nivîskarî ne karekî akademîk û pêşeyî ye. Dibîstana nivîskariyê tune ye, dîploma nivîskaran tune ye! Ked û wext jêre divê. Belengazî, şepirzeyî, stuxwarî û nazdilî jî, devê derî û pêpelûkên kovar û weşanxanan in. Mixabin ev şert hêj, ji bo nivîskarên Kurd nehatine cî. Digel tunebûna dewletê ev dergehên pêwîst girtî mane. (ku sazî û dezgehên Kurd çêbûbin jî, dûrî vê bersîva min in.) sedemek din ku pirr girînge: Nivîskariya Kurdî di dem û dewranên -îzm-an de ne bihurtiye. Ew qalib û rendekirin ne dîtîye. Ew dem û dewranên ku li ser nivîskariya cîhanê pir tesîr kirî, romantîzm, realîzm, komaleyatîzm, fictivîzm, sembolîzm û hwd. nivîskariya Kurdî di nava tevgera reş û geşiya xwe de ne guvaştiye. Tehlişk û tirsî xamîtî û gihaştina mêwa xwe di wan waran de diyar nekiriye.

Nivîskar nikare xwe di nava qaqlîkê hêkekê de, ku ew hêk zêr be jî, nikare xwe bi parêze. Nikare bikeve rekihek hesinî.... Nikare xwe ji jîyana gelê xwe dûr bike. Ku gelê nivîskar bête qirkirin, pêwîstiya nivîskar ew e ku li ser gelê xwe bixeyide. Pênuşa xwe bike -zulfiqarê- gelê xwe. Nivîskar berpirsiyarê gelê xwe yel.. Nivîskar nikare ji rewşa gelê xwe derbikeve. Kêlîka ku ji wê

Hevpeyvîn

çarçewê derket, gerek e navekî din li xwe bike. Romannivîs, çîroknivîs, helbestnivîs, berê her tiştî tewanberê gelê xwe ye. Hebûn û têgihîştina nivîskar kûraya jiyana gelê wî ye. Huner ew e dê ji sêndera devê deriyê mala xwe bi rê bikeve, ber bi cîhana fereh biçê, li nava kuraya gerdûniyê bela bibe.

Nivîskar ku ne bi gelê xwe re gavan biavêje, nikare kuraya xelkê xwe zemt bike. Em dikarin bêjin bê yek nivîskarê Kurd, îro, kûraya xelkê xwe zemt kiriye?.

Pirs – Romana Kurdî divê ku bi Kurdî bê nivîsandin?

Medenî FERHO: Bêşik.... Pirs, bersîve jî.....

Gelo zimanê kê ji zimanê me dewlemendtir e?

Gelo, ji bo zimanê cîhanê teva danûstandina demedoran ne guneh e, ne tewanbarî ye, ne şermezarî ye, bes ji bo zimanê Kurdî ev heye?

Gelo, kîjan zimanê cîhanê bi heft ava Newala Bûnisra, xabûrê hatiye şûştin?

Gelo, ziman ne bi xilmetkirin fireh û dewlemend dibe?

Ev pirs hêj zêde dibin. Her pirs jî di nava xwe de bersîvên fireh û dirêj di hilgire.

Bextreşiyek mezin heye li holê.

Bextreşiyek mezin heye ku ev pirs her dem tê hemberî me. Weke her gelî, gelê Kurd layikê romana bi zimanê xwe ye. Weke her nivîskarên cîhanê, nivîskarên Kurd jî pêwistî romannivîsandina zimanê xwe ne. Gotin û temena romana Kurdî bi zimanekî biyanî tê wê manê ku romannivîsên Kurd nikarin vî barî hilbigirin. Nivîskarên Kurd hewl di vî karî nînin şermezariyek pir mezin e....

Nivîskarên Kurd pêwist e ku vê şermezariyê ji ser xwe rakin. Nivîskarên Kurd pêwiste ku cepha nivîsandina zimanê Kurdî fireh, xurt û rêkûpêk û bi hêz bikin. Di gel cepha ku gelê Kurd di şertên îro têde cenga hebûn û nebûnê didin de..... Bê gotin!.....

Bê xilafî, di mercên îro de ku di rojhilata navîn de guhertinên pir mezin çêdibin. Ew zarokên ku teliya rîs û navîn dikine darikê qewsik, îşareta xelasîyê çêdikin, gelo çi dibêjin, çi daxwaz dikin?. Di nava tevgera ava mêjî û hewn de pir pirsan di rikinênin? Bersîvê dixwazin.... Xelasî nîn e!.... Nivîskarê bersîva wan her du teliyan nede, bila pênûsa xwe têxe çavikên masa xwe de. Computera (Data) xwe jî, bo leyistikên Batman bi kar bîne.

Hevpeyvîn

Romana Kurdî divê bi Kurdî bête nivîsandin.

Ku ne bi zimanê Kurdî be, pirtûk li ser Kurdan e û bes. Nivîskarê wê jî Kurd be romana Kurdî nayê hesibandin.

Nasnameya Kurdî zimanê Kurdî ye.....

Pirs – Ji bo nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên xwe bi zimanê neteweyên serdest (Tirkî, Erebî, Farisî) dinivîsîn, tu çi di fikire? Berhemên wan yên edebî di nav edebiyata Kurdî de têne hesibandin an na?

Medenî FERHO: Ku nasnameya Kurdî be... Bersîva vê pirsê jî ev gotin e. Karûbarên wan nivîskaran, bêgoman xizmeteke, lê ne ji bo wêja Kurdî, ji bo têgihîştin û fêrbûna demê... Bila kes xwe ne xapîne. Nivîskarî karekî neteweyî ye. Dema nivîskar bi zimanekî biyanî di nivîse jî karê neteweyî dût dikeve. (Nivîsandinên politîk ne di nav de, ev karûbar di roja îro de pêwîstî zimanê biyanî ne. Têkiliya hemberî, di vê navê de pîkola xwe pêwîst dike. Ji bo çerxa aborî, dîrokê, biyolojî, jeolojî, cografya jî ev rastî cih nagire. Dive ku teva bi Kurdî be.)

Çi ekol û çi stîl û çi beş û mijar be jî, ku bi zimanê Kurdî be karê neteweyî tede heye. Ku em dêhnê xwe didine nivîskarên cihanê, yên bi navûdeng, teva di nava germiya neteweyî de, di nava pevçûna politîk de cihên xwe girtine. Ji Viktor Hugo bigrin heya bi Şolohov, Maksîm Gorkî, heya bi Byron û Nerûda.... Teva jî, berhemên xwe bi zimanê gelê xwe nivîsîne.

Gelê Belçîkî, heya berî çend salan di bin bandura Frensîyan de bûn, di her war û beşên xwe de bi zimanê Frensî xilmet dikirin. Gelê Belçîkî ku bi navê Fleman tê naskirin (piranîya xelkê ew in) di warê zimanê xwe de dest bi berxwedanê kirin. Xortekî ku bi navê Başoke -uilenspiegel- xelatgîr dikin, navê gund û bajaran yên li ser sêlik depik û hêtan nivîsî xera dike û bi zimanê gelê xwe dinivîse. Frensî dinivîsînin ew diçe xeradike bi zimanê xwe dinivîse. Herwiha dom dike. Berxwedana navan hin bi hin dibe berxwedana gel teva. Heya ku xwe jî, zimanê xwe jî, ji bin bandura Frensîyan xelas dikin. Dawî xwe neteweyek didine qebûl kirin. Îro jî şerê wan dom dike. Di her war û mijarî de pirtûk bi zimanê xwe nivîsandine. Di demeke kin de tu kêmasî di warê nivîskî de nehêştine. Lê, hê jî vî şerî didomînin. Şerê xwe bi piralî kirine. Romana xwe jî, çîroka xwe jî, dîrok û cografya, rojname û

Hevpeyvîn

kovarên xwe jî bi zimanê xwe dinivîsîn. Ez ne bes di hêla roman û nivîsandinên Kurd de difikirim. Pewistî bi hemberiya nijadperestiya sedsalan heye. Erebi, Tirk, Faris.... Heya bi nav û gav û baweriya me jî wêran kirine. Navên mirovan, navên gundan, bajaran, navên cîh waran, heya bi deşt û mesîlan tevan guhartine. Ji nava zimanê Kurdî, gotin û gotar birine, kirine mal ji xwe re. Berî Îsa bi sedsalan ku Zerdeşt (637) di nivîsên xwe de behsa -dîn- (Behdîn-ronahiya dîn), -zamên- (dem û wext), -hastîşû- (xulqet, ev gotin heya îro jî bi eynê manê di zaravê Kurdmanckî(Zazakî) de bi -estîş-tê gotin) û hwd. (pir gotin hene ku bêne hejmartin.)

Ereban, dîn, zaman û şems ji xwe re birine. Şems, yan jî şeşims, yan jî şemîstan (roj).... Roj ji rojhilat heya rojava ye û wext e. Şesims- Şems-Şemîstan jî, (her sê nav jî têne xilmetkirin.) Şahê şeş rojan e, şahê gerdunîyê ye... Ev teva hatine talankirin û ji xwe re birine. Di Quranê bi xwe de gotinên Kurdî hene. Hember vê talaniyê yek dikare bêje romana Kurdî jî bila ne Kurdî be. Nivîskar pêwist e li zimanê xwe bi tevayî xwedî derbikevin. Ji bedêla ku nivîskar di guftugoyên pûç û vala de guhên hevûdu bi qulqulênin berdin, karûbarên bingehîn, nivîsandinê bikin.

Mêrê çê ew e ku hember hewqas xwîna xortên devrût ku di oxira stana Kurdan de hatiye rijandin, hê jî dirijihe, bi gotin û hevokên xwe mîna lewleba jiyane bi nixandînin li ser kaxezan rêz bikêye. Gelo, stuna welatên cîhanê teva ne xwîna mirovan e?

Sedema girîng, kesên bi eslên xwe Kurd, lê bi zimanê biyanî dinivîsin, tevî tevgera Kurdî û berxwedana Kurdî jî nabin. Rastî ev be, em teva dizanin ku ev e: Bi xwe ve, bi berhemên xwe ve ji wêja (edebîyata) Kurdî nayên hesibandin. Em maşokîya kesan nekin çêtire. Bo em dikaribin berhemên çê û hêja derbixin meydanê. Em nikarin li bendeyî wan kesan bimînin.... Vala ye, boş û rawestandinek xerbende ye, fikir jî çewt e. Ibn - el Esîr, bi eslê xwe Cizîrî ye, 12 cîld dîroka cîhanê nivîsîne. Lê tu pêwendiyên wî bi Kurdî re tune ne. Cemal Sureya jî Kurd e, helbestvanekî serxwera ye... çima ne ev herdu kes, lê bes Yaşar Kemal û Ahmed Arîf? Çima em dê hinek kesan qebûlî nava xwe bikin hinek kesan durî xwe bikin? Ev niheqiyê.... Ew kesên ku em berbixwe dikişînin jî qîma xwe bi me nayênin. Wan berê jî gavên xwe ber bi Kurdewariyê ne avêt, niha jî navêjin. Wê jî nakin. Selîm Berekat heya îro çi gav avêtiye? Bar li ser milê nivîskarê Kurd e. Divê ku di bin barê xwe de rabin, romana Kurdî jî, helbesta Kurdî jî, çîroka Kurdî jî, dîroka

Hevpeyvîn

Kurdî jî binivîsin. Bingehîn ev e ku wêje ne bi girêdana xwînê, bi girêdana zimên ve têt pîvan û wezinandin.

Pirs – Tu berhemên nivîskarên Kurd (yên ku xwerû bi Kurdî dinivîsin) yên nûh çawa dinirxînnî?

Medenî FERHO: Di hêla pirtûkan de du pîvanên min hene. Yekemîn naverokek e!... Duyemîn mîzampaj e!... Her du hevûdu temam dikin. Di vî warî de ez xwedî tecrûbe me. Bilî vê, di şertên Ewropa de, ku teknolojiya pîr pêşketî ye, gereke nivîskar û weşanxanên Kurdan hewl bidin mîzampajê. Pirtûk yekemîn çandî ye, duyemîn ticariye.... Ne li cem Kurdan bi tenê, li cem weşanxanên cîhanê teva wilo ye. Pirtûkên darîçav balkêş in, bazarê dibînin. Eger nivîskar be, eger edîtor be, pêwîstî hember xwendevanan birêziyê ne. Ev qelsiyek e di mijarê pirtûkan de.

Em bêne beşek din. Kurd di axa xwe de bêzar in. Di nava livîn û cîhên xwe de şityar in. Di hindiruwê xwe de bê star in. Hember şerekî neqam de bi tenê ne. Xwîn!.. Têra xwe xwîn hatiye rijandin. Têra xwe!.. Erdê têr xwîn vexwar... Mirovan têra xwe kul û derd, merez û xem hilgirtin. Jinan têra xwe hêstir barandin. Dayikan, xuşkan têra xwe dilojarê gotin. Şîn û weyn bû tovê jîyanê....

Gelo, nivîskarên vî gelî ne pêwîstî hîn gavavêtinan e? Bêdengî û razana di rekiha hesînî de, ketina hundiruwê qaqlîkê hêkê, çareseriyê? Ku, hêj niqasha li ser romana Kurdî bi zimanek biyanî bête nivîsandin dibe. Rewşa nivîskar û berhemên nivîskarên Kurdî di van her çend gotinan de, bê ku li ser kesan û berhemên kesan bi rawestim diyar dibe.

Pirs – Romana Kurdî divê di kîjan xetî de pêşbikeve? Tu ji bo -rastiya civakî- çi difikirî?

Medenî FERHO: Nivîskar, ji danûstandina xwe ya cîhanê avaniyên nûjen derdixe û pêşniyazî xwendevanan dike. Xwendevanan bi cîhanên nûh dide naskirin. Rastî û rêçikin rastiye dike pêpelûk. Ji bo mirovan dergêhen nûh, nûh dide vekirin. Bilî van, nexweşî û şikestîkên cîhanê, qirêj û gemara jîyanê, talanî û wêraniya bi destên mirovan, kevneperestiyê, zilmê diyar dike. Nivîskar her dem di guhertin û gerînên nûh de ye. Nivîskar ku di

Hevpeyvîn

berhemên xwe de guhertin û dergêhên nûh vekirin, bersîva demê dide. Ku kûraya xelkê xwe xwe jî, zemt kir, mezin dibe. Nivîskar, ku ji palik û sêndera devê deriyê xwe dest bi kar kir, ber bi kûraya dilê gerdûniyê gav avêtin, dibe awaza gelê xwe. Nivîskar, ku ji folklor, ji efsanan, ji destanan (epîk-epope) û tevgera gelê xwe ya rojane di berhemên xwe de bi rewşa hunerî cîh bike, dibe vijdan û berdevk û zimanê gelê xwe.

Stana Kurdan bi her awayî zengîn e. Dergûşa destpêka jiyane û dîrokê ye. Şoreşa axê di wê naverokê de çêbûye. Kurdistan pêgiha gelên cîhanê ye. Kurdistan goristana gelên cîhanê ye. Tu gelê cîhanê tune ye ku bavûkalên wî di vê axê de ne razayî ye. Kurdistan gorîstanek navneteweyî ye. Ne Kurd bi tenê, gereke ku gelê cîhanê teva li van mextelên wînda û bê kêl xwedî derbikeve. Kêmasîyek pir mezin di hêla nivîskarên Kurd de heye ku gorîstana navneteweyî bi cîhanê nadin naskirin û heya îro jî nedane qebûlkirin. Ev sedem bendeyî danûstandin û axiftina nivîskî ye. Gelo, karê nivîskar û berpirsiyariya nivîskar û rewşenbiriye, ne ev in?

Ji bo nivîskar, çanda biçûk û mezin çênabe. Dîroka mezin û biçûk çênabe. Her bûyer, her çalekî, her serpehatî ji bo nivîskar hêjayî xizmetkirinê ye. Nivîskarên çê ew ku biçûk mezin bike, gerdûnî bike, rê û rêçikên mirovanî, dergêhên rastiye ji wan bûyer û serpehatiyên derbixe

Nivîskar berpirsiyarê demê ye. Berpirsiyarê welatê xwe ye. Berpirsiyarê gelê xwe ye. Nivîskar ji rewşa gelê xwe, ji rewşa welatê xwe nikare derbikeve. Kêlika ku ji wê çarçewê derket gereke ku navekî din li xwe bike. Roman-nivîs, çîroknivîs, helbestnivîs berî her tiştî tewanbarê gelê xwe ye. xet û rêçik ev e. Bê rastiya civakî gelo, nivîskarî çi ye?

Pirs – Di nav nivîskarên cîhanê de tesîra nivîskarek li te bûye? Tu kîjan nivîskarî nêzîkî xwe dibînî? Tu berhemên (roman, çîrok û helbest), kîjan nivîskarê cîhanê hez dikî?

Medenî FERHO : Bêşik, di nîşandan û hereketên mirovan de Dostoyevskî, di tevger û pesindana mirovanî de Şolohov, di awaz û pirdengiyê de Tolstoy, di aşîtiyê de Dîdo Sotiriu, di destan û girêdana kevnan û nûjenî de Yaşar Kemal, di çavdariya gundîtî û danûstendinên mirovan û axê de Juan Rulfo.... Lê, piranî di hêla nivîsandinê de Yaşar Kemal pir tesîr li min kiriye. Sedema ne rastiya bûyer û efsanên Kurdî ku di berhemên wî de cîh girtin jî

Hevpeyvîn

li ser min heye. Lokman Hekîm, ji ser çiyayên Kurdistanê tîne li serê çiyayên Torosê bi cîh dike. Ocaxa malbat û pîroziyên ola Kurdî dike malê Tirkan û hwd. Her nivîskar tiştêkî dide min. Ji bo min her berhem nûjeniyek e, dergehekî nûjeniyekê ye. Nivîskarên Kurd û biyanî teva nêzîkê min in û di tevgera mêjiyê min de, di nava wê ava kîmyewî de îşaretên pirsê dihêlin. Lê, nivîskarê xwe pêwîstî nûneriya pêşengî û rêberiya nûjeniyê bibîne hê bêhtir nêzîkê min e.

Pirs – Rewşa çîrok û helbestên Kurdî yên nivîskî çawa ne? Di vê hêlê de pêşketin hene an na?

Medenî FERHO : Çîrok û helbest.... Helbest di xwîna min de, di germiya dilê min de ye. Her roj ku ez nexwînim, nenivîsim ew birîna dilê min dijenê. Çîrok jî, em bikin û nekin di jiyana rojê de dijî. Ez bixwe çîrokên dirêj dinivîsim. Hêj min hewl nedaye ser kurteçîrokan û nivîsandinê. Lê belê, kurteçîrokên têne nivîsandin taqîp dikim. Ne li qasî helbestê be jî gavên girîng têne avêtin. Cewher diçirise. Roj nîn e ku ji hêlekê ve navek nûh xwe diyar neke. Hêvî mezin e!.. Ber ku nivîskarên kurteçîrokan weke **Firat CEWERÎ û Lokman POLAT** jiyana rojê, tevgera têr qerqêşûn tênine berçavan. Di wê baweriyê de me ku xortên din jî, di vê mijarî de wê gavên fireh û hêja biavêjin. Bingeha helbestê kevintir e. sedem ew e ku ji kurteçîrokê bi hêztir e. Yekî mîna Ehmedê XANÎ, Meleyê CIZÎRÎ, Cegerxwîn, Şêrko BÊKES û Eskerê BOYIK derketine meydanê. Xortên nûh jî pir hêviyên me xurt û mezin dikin. Ne di kovaran tenê de, bi berhemên xwe jî vê hêviyê li ser piyan disekinînin. Weke Ehmed HUSEYNÎ... Hejmara van helbestvanan jî ne hendik e. Ev, hêviyê hê bêhtir mezin dike.

Pirs – Hetanî nûha çend berhemên te hatine weşandin? û di pêşerojê de, dê kîjan berhemên te bîn weşandin? Ji kerema xwe re navên wan binivîsîne.

Medenî FERHO : Belê, heya niha 8 berhemên min hatine weşandin. 2 roman, 3 helbest, 2 çîrok, 1 mesele, salife.... Roman: Berxwedan Jiyana e, Hades Îş Başında... (Mixabin romana duduyan bi Tirkî ye, ji ber ku min ev roman di girtîgehê de nivîst.) Helbest: Hey Gerîlla, Mapusluk Gerçegim,

Hevpeyvîn

(ev pirtûk jî bi Tirkî ye, ev jî di girtîgehê de hatibû nivîsandin.), Topragin Tutkusu, (Bi Tirkî ye, ev helbest jî nêzîkî bîst salane ku hatiye nivîsandin.), Çîrok: Kaytan Osman, (Bi Tirkî û berî bîst salan hatiye nivîsandin.) Beranê Kovî..

Îsal, hêvî heye ku bi kêmanî dudu, gelek gelek jî çar pirtûkan derbixim. Ku xopana abortî ferezendê bide. Dudu, her wê derbikevin. Yek helbesta ku li ser mextelên winda û bê kêl e, ya din jî Xaltîka Zeyno ye, ku di heştê saliya xwe de, bi têgihîştina xwe ya gundîtî hember dijminên kevneperest û kedxwar tevî berxwedanê dibe ye. Çîrokek dirêj e. Du roman jî di destên min de hene. Yek ji wan xelasbûyî ye. Lê, hêj li ser radiwestim bo haveyn û hevîrê wê qenc û xweş bigihije, tîrş bibe, bite xwarin.

Zîrekiya min ji umrê min ku teva di karûbarê nivîsandinê de bûriye tê. Piştî vê salê ku ez, di rojnameyek herî mezin ya Tirkan de bûme rojnamevan hosteyiya min bi derbekê re dest pê kir. Ew dergehên heya wê rojê jî li ber min girtî bûn, bi yek carê vebûn. Heya îro jî berdewam e.

Gotina min ya dawî ji bo zimanzanên Kurd e.

Çend gotinên min ji wan kesên xwe zimanzan dihesibînin re heye. Bêgûman, ev kes zanayê zimanê Kurdî ne. Lê belê, roviyek gerhok, çêtire ji şêrekî razayî..... Van xweşmêran heya îro çend berhem li ser zimanê Kurdî weşandine? Çi kêmasî ji nava zimanê Kurdî derxistine, çi li zimanê Kurdî zêde kirine? Yan, zimanê Kurdî û gelê Kurd ne hewceyî ku ev zimanzan hewl bidin û li ser zimanê Kurdî hin karûbar bikin, berheman li ser bi weşînine. Ew zimanê ku hêj ferhenga wê bersîva demê nedê, tê wê manê ku zimanzan tê de tune ne. Li gorî min, zimanzanê ku li ser ziman ne xwedî berhem û gotar be, ne zimanzan e. Zimanzanê mal û demadorên xwe ye.

B
I
X
W
Î
N
I
N

Medenî FERHO
HEY GERÎLLA
- Helbest -
BERXWEDAN JIYAN E
- Roman -
Weşanên ABeCe
Derket Bixwînin!

B
I
X
W
Î
N
I
N

ROZA

Wergêr : Robîn REWŞEN

ROZA

Hêza baranê min tîne
Bêhna axê dibe
Lûleyên tîfingan dibin Roza
Tu hezar baranên biharê
Tu di rojekê de çar demsal
Di lûtkeya çîyan de kozikek
Di lûleyê de beriyek
Û di bahozan de hêzek
veşartî
Çavên te, porê te hela porê
te
Awirên te dijmin diqehirand
Erê; Roza mîlîtanek bû
Dê ji kude bizanibûya bi
rindbûnê re
Dê dijmin har bibe
Û bi topekê hawarê ya ku
qasî dijminî zikreş
Bihata lêdanê
Ji bo te dinivîsînim, Roza
Û Çavên te, hêrs û evîna te
dinivîsînim
Û di rojekê de, tu çawan
çar demsal jiyabûyî?
Bila li ber xwe bikeve
ezman, li ber xwe bikeve roj

Bila li ber xwe bikeve me-
rivahî
Bila tirsonek li ber xwe bi-
kevin
Û Roza dîsa di kozikê de
ye
Bi çavên ku dikeniyan
şeh kir porê xwe
Bi tiliyên xwe yên piçûkîn
Bi kenîna xwe ya zaroka-
ne şeh kir
Hevnasîneke sê deqîqeyî
bû bi te re
Bi hêjayî dîroka sed salî
Hêrsa te çiqas dişibiya
hêrsa min
Stranên me jî deveke
hevpar
Çawan olan didan
Û bi lêdana nabizan re
hewarên me yên ku hev
hemêz dikirin
Çawan dihatin jibêrkirinê
Guh bide min Roza!
Te çawan cilên bûkaniyê
li çîyan dikir
Sînor dê nikaribe te dîl
bigire

Helbest – ROZA

Kozik dê bibin warê
xoşewîstiyê
Cîhan dizane
Min bi destên xwe tu veşart
î, Roza
Bi destên xwe yên
bêbawerî, bi kelegirînî
Bi hûrê nanê ku tevlî xwînê
bûye.
Di bêrika êleke te ya çepê
de
Di parsûyên te yên çepê de
bûn
Perçeyên şarapnelê yên
namerd
Li erdê dirêjbûyî ser devî
bêcan
Te bi laşê xwe hemêz kir
dilê min
Evîna te ya ku te hişk
hemêz kiribû
Û di stûyê te de gerdanka
te ya sonxwarî
Tilîsma wê çi bû, Roza?
Çavên wan barneda em têr
bijîn
Kenîna laşên bêcan bi bîr
bîne
Liv û tevgêrên dergûşan
Ji bo ku te hemêz bikin

Çavên wan li rê ye
Çima ewçend zû Roza,
çima?
Dibe ku te arama xwe bi
diranên xwe
Li çiyên kolabû
Li wir şev pir sar û bi hêrs
in
Bayên xwînê dihejîne ser
laşê min
Ez bi rewşa xwe ya
şaşbûyî, westiyayî
Û perîşan diqêriyam bi
çavên te re, Roza
Li laşê te digiriyên bi
çavên te re Roza
Li laşê te digiriyên
Ji xwedayan re bêrî
Venusa bedewiyê
Kleopatrayê hanîn ji me
re, Roza.
Tu ewçend bedewî ku
şewateke bêdawî
Bêriya te geliyeke bêbinî
Min bi destên xwe tu
veşart î, Roza
Bi destên xwe yên
bêbawerî, bi kelegirî
Wergêr : Robîn Rewşen

ROMANA GERÎLA Û SERÎHILDANÊN NETEWÊYÎ DIVÊ BI KURDÎ BÊ NIVÎSÎN!

Lokman POLAT

Rojnameyên Kurdan yên hefteyî û rojane di rûpelên xwe yên çandî de, ji pirtûkên Kurdî pirtir pirtûkên tirkî didin danasînê. Li ser berhemên nivîskarên tirk gelek nivîsên danasînê tête nivîsandin. Bi raya min ev xelet e. Divê di van rojnameyên Kurdan de pirtûk û kovarên Kurdî û berhemên nivîskarên Kurd bête danasîn.

Rojnameya hefteyî **RONAHÎ** gelek kêr cîh dide danasîna pirtûkên Kurdî. Zêdetirîn pirtûkên tirkî û berhemên nivîskarên tirk dide danasînê. Pirtûkên Kurdî yên ku dide danasînê jî yên der û dora xwe, yên nivîskarên rojnameya xwe dide danasîn. Kovarên edebî yên tirkan dide danasîn, lê kovarên Kurdî yên edebî nade danasîn.

Rojnameya hefteyî **RÖJ** jî di hejmarên xwe yên pêşîn de bi giranî pirtûkên tirkî û berhemên nivîskarên tirk dida danasînê. Lê van hejmarên wê yên dawî ber bi başiyê ve diçe.

Rojnameya rojane **YENÎ POLÎTÎKA**

û niha jî **OZGUR POLÎTÎKA** jî sedî nod pirtûkên tirkî dide danasîn, anonsa kovarên tirkî yên nûhderkefî dike. Di rûpela çandî ya **OZGUR POLÎTÎKA** de li ser çand û edebiyatê gelek nivîs (hemû jî bi tirkî) derdikevin. Di van nivîsan de pir tişt tene munaqesekirin. Di van nivîsan de hem dîtînen rast û hem jî dîtînen çewt hene. Nivîskar **Şerefxan CIZÎRÎ** çend nivîsên baş û balkêş nivîsiye. Wî di nivîsek xwe de got ku: "Divê mirov nebêje îlla bila nivîskar romana gerîla binivîsîne." Ev dîtîneke rast e. Bi zorê tişt nabe. Divê nivîskar azad be. Mijara çîrok an romana xwe ew bi xwe bi seriyekî azad tespît bike. Nivîskar li ser kîjan babetî bixwaze dikare li ser wê binivîse. Helçinandina bûyeran di destê nivîskarî bi xwe de ye.

ROMANA ŞER Û TÊKOŞÎNÊ DIVÊ BI KURDÎ BE

Tiştêkî herî girîng jî ev e ku; yên ku dibêjin bila romana gerîla bête

Romana Gerîla Divê Bi Kurdî Bê Nivîsîn

nivîsandin, nabêjin îla bila bi Kurdî bê nivîsandin. Ji bo wan qet firq nake, ha bi Kurdî û ha bi tirkî. Daxwaza wan tenê ew e ku bila romana gerîla bê nivîsandin. Romana gerîla bila bê nivîsîn lê ne bi tirkî, bila bi Kurdî bê nivîsîn.

Ev du sed sal e ku gelê Kurd ji bo rizgariyê têdikoşe. Gelek serîhildan çêbûn û têk çûn. Hetanî niha romana serîhildanên neteweyî bi zimanê Kurdî nehatiye nivîsandin. **Yilmaz Odabaşî** bi navê Rojvanê Ciwan destana serîhildana **Şêx Seîd** nivîsand, lê bi tirkî nivîsî. **Cemşîd Mar**, destana serîhildana **Dêrsimê** bi tirkî nivîsî. Nivîskar **Munzur Çem** - digel ku Kurdî nivîsînê dizanibû jî - romana serîhildana **Dêrsimê** 3 cîld (Gulumse Ey Dersîm) bi tirkî nivîsî. Niha jî nivîskar û rojnamevan **Abdulkadîr Konuk** romana gerîla bi tirkî dinivîsîne. Cîldêkî vê romana wî hate weşandin, ew dixwaze du cîldên din yê berdewama cîlda yekem binivîse.

Romana gerîla bi tirkî hatiye nivîsîn. Damezrevanê hêza gerîla **Abdullah Ocalan** bi xwe hem romana jîyan û têkoşîna xwe û hem

jî romana gerîla nivîsiye. "Kurdîstan Roman Taslagi" her çiqas nehatibe weşandinê jî romana **Abdullah Ocalan** û ya gerîlan a bi tirkî ye. Heger mabest bi tirkî nivîsandina romana gerîla ye ev tişt ji alî **Abdullah Ocalan** ve pêk hatiye. Ku bi tirkî be tu nivîskarekî Kurd bi qasî wî nikare binivîsîne. Her axaftineke wî dibe romanek. Tiştê ku **Abdulkadîr Konuk** an jî nivîskarekî din bike ew e ku vê "taslag"ê berfireh bike. A girîng ew e ku romana gerîla bi Kurdî bê nivîsîn.

Romana Kurdî divê bi Kurdî bê nivîsandin. Romanên serîhildanên Kurdan, romanên leheng û şexsiyetên Kurdan, romanên şerê gerîla, bi gelemperî edebiyat divê bi Kurdî bê afirandin. **Abdulkadîr Konuk**, **Munzur Çem**, **Yilmaz Odabaşî**, **Alî Bîçer** û yên wek wan bi dehan pirtûkên roman û helbestan binivîsînin jî, berhemên wan aîdê edebiyata tirkî ye. Erê, ew bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên wan di nav edebiyata Kurdî de nayê hesibandin. Em bibêjin **Alî Bîçer** û **Yilmaz Odabaşî** bi Kurdî nizanin loma berhemên xwe bi tirkî

Romana Gerîla Divê Bi Kurdî Bê Nivîsîn

dinivîsinin, lê bi Munzur çem çi bûye? Ew bi Kurdî (Kurmancî û Zazakî) dizane, di gelek kovarên cure de bi Kurmancî û Zazakî gelek nivîs nivîsiye, çira romana serîhildana Dêrsimê bi tirkî nivîsiye? Çira bi Kurdî nenivîsiye?

Romanên şerê netewayî yên Kurdan, romana serîhildan û berxwedanên Kurdan divê bi Kurdî bê nivîsîn. Di zindana Amedê de wahşetek mezin hate jiyandin, berxwedanek bi pîroz hate kirin, lê romana berxwedana zindana Amedê bi Kurdî nehate nivîsandin. Divê bi Kurdî bê nivîsîn. Kurdên soreşgêr û welatparêz yên ku bi salan di zindana Amedê de razan hemû nikaribin bi Kurdî binivîsîn jî, gelek ji wan yên ku dikarin bi Kurdî binivîsîn hene. Paşa Uzun ji wan yek e. Ew di nav berxwedana zindana Amedê de bû. Ew bi xwe bû şahîdê gelek bûyeran. Heger ew bixwaze dikare bi Kurdî (Paşa Uzun di gelek kovaran de bi Kurdî nivîs dinivîse) berxwedana zindana Amedê binivîse.

Digel van tiştan divê romana şerê Kurdan yên nav xwe, şerê

birakûjiyê, şerê xwekûjiyê jî bi Kurdî bê nivîsîn. Bi hîsa neteweyî, bi fikirandina Kurdî ancax dikare romana şerê birakûjiyê bê nivîsandin. Bi tirkî fikrandin romana şerê birakûjiyê nayê nivîsandin. Di avakirina berhemên edebî de fikirandina bi Kurdî an ya bi tirkî, erebî, farisî gelek girîng e. Li ser eynê babetê, li ser şerê birakûjiyê bi tirkî fikrandin û roman nivîsandin û bi Kurdî fikrandin û roman nivîsandin dê ji hev gelek cuda be. Eynê, yek nivîskarek be jî wexta ku bi tirkî bifikire û romanê binivîsîne dê bi hawayekî din binivîse, wexta ku bi Kurdî bifikire û romanê binivîse wê gavê jî dê bi hawayekî din binivîse. Ferqek mezin di nav bi zimanê neteweyî fikrandin û nivîsandin û bi zimanekî biyanî fikrandin û nivîsandinê de heye. Helbestên bi hestên Kurdî û yên bi hîsên tirkî bê nivîsîn dibe wek hev? Na!..

Mehmed UZUN
SIYA EVÎNÊ
Romana Modern a Kurdî
Bixwînin

Nivîskarê Navdar YAŞAR KEMAL

A. MÎRAN

Yaşar Kemal nivîskarek bi nav û deng e. Ew bi eslê xwe Kurd e. Lê hemû berhemên xwe bi zimanê tirkî nivîsîye. Gelek pirtûkên wî hene. Roman, çîrok, destan û hevpeyvînê wî hatine weşandinê.

Nivîskarê navdar Yaşar Kemal, di vê demên dawî de li doza gelê Kurd xwedî derket û bi mêrxasî dengê xwe bilind kir. Wî nivîsek di kovara Almanî Der Spiegel de weşand. Ev nivîs bû hedefa êrişên şoven û nîjadperestên tirk. Ew nivîs li ser zilm û zordariya dewleta tirk û direwên dewletê yên dîrokî bûn. Ji xwe navê nivîsa wî jî **“Sefera Direwan”** bû. Piştê ku ev nivîs hat weşandinê, masmedîya tirk a şoven û nîjadperest êrişê Yaşar Kemal kir. Dadgehên dewletê jî derheqê wî de mehkeme vekirin, dixwazin wî bixin zîndanê.

Yaşar Kemal di pirtûka bi navê **“Duşunce Ozgurlugu - Azadiya Ramani”** de nivîsek din nivîsand. Di vê nivîsa xwe de, ew dîsan li ser pirsê neteweya Kurd rawest û kirinên dewleta tirk mehkûm kir. Ji bo vê nivîsa Yaşar Kemal ew pirtûk hat qedexekirinê û polîsan pirtûkê civandin, dadgêr ji bo pirtûkê mehkeme vekir. Yaşar Kemal di mehkemên tirkan de jî pirsê neteweya Kurd hanî zimên û doza gelê Kurd parast. Mehkemên wî hêj dom dîke.

Yaşar Kemal, bi berhemên xwe yên hêja bûye nivîskarek navneteweyî. Ew Homerosê dema me ye. Di berhemên wî de destanên Kurdî û mîtolojiyên dîrokî hene. Çend nivîskarên Tirk û Kurd li ser wî pirtûkan nivîsîne. Di van pirtûkan de jîyan û têkoşîna wî, xebat û berhemên wî tête danasînê. ☛

Yaşar Kemal

Nivîskarên ku li ser wî pirtûk nivîsandine û navê pirtûkên wan ev in:

- 1— Yaşar Kemal Qala Xwe Dike— Alan Bosquet
- 2— Di Romanên Yaşar Kemal de Realîta Kurd— Rohat
- 3— Yaşar Kemal Romannivîsê Mezin Yê Dema Me— Alpay Kabaçalı
- 4— Fotobîyografiya Yaşar Kemal— T. Çandar
- 5— Yek Çîrokvan û Yek Romanvan— Fethî Nacî
- 6— Ferhenga Yaşar Kemal— Alî Puskulluoglu

Hemû pirtûk bi zimanê Tirkî hatine weşandin, min navê wan tenê bi Kurdî nivîsand.

Niha, ez dixwazim li ser pirtûka wî ya bi navê **“Baldakî Tuz— Xweya Di Hengiv De”** bi kurtayî bisekinim.

Di vê pirtûkê de 102 nivîs û axaftinên Yaşar Kemalî hene. Di pirtûkê de dîtin û ramanên wî, dinya (cîhana) wî bi hawayekî eşkera xuya dike. Cîhana Yaşar Kemalî gelek dewlemend e. Wî her tim bi xelkê (Gel) û bi xwezayiyê bawerî kirîye. Ew tim li aliyê kedê bûye, piştgiriya kedkaran kirîye.

Di destpêka pirtûka xwe de Yaşar Kemal weha dibêje:

— «Hunera xwe bi gelê xwe re çêdikim. Bi gelê xwe re dibim yek. Sîyaseta min ji hunera min ji hunera min nayê veqetandin. Kî li pêşberê dilşadîya gel bisekine ez dê bi hunera xwe û bi hemû jiyana xwe li dij wî derkevim.»

Yaşar Kemal pirtûka xwe ya **“Xweya Di Hengiv De”** li ser van hîmên ramanî ava kirîye û li gor vê bîr û baweriyê ev pirtûk hatîye amadekirin. Di pirtûkê de Yaşar Kemal li ser gelek babetan bi berfirehî dîtinê xwe tîne zimên. Ew dibêje:

— «Mirovê kû tirsonekîya xwe bişkîne, ber bi ronahiyê ve diçe.»

Yaşar Kemal di vê pirtûka xwe de di sernivîsa **“Dema Nivîskarên Mêrxas”** de ji bo nivîskaran weha dibêje:


— «Nivîskar zimanê gelan in. Nivîskar berpîrsîyarîya ku girtine ser milê xwe, ji binî rabûne, radibin.»

Yaşar Kemal di nivîsek xwe de ji bo pêşevayê Afrîkî yê navdar Lumumba dibêje

— «Lumumba Afrîka ye. Ew rûmeta mirovahiyê ye.»

Yaşar Kemal ji bo nivîskarê çîrokvan Saît Faîk jî dibêje:

— «Yên ku çîrokên Saît Faîk xwendine mirovan nakujin. Bi mirovan xirabî nakin. Nabin kedxwar. Bi mijokan re nabin yek. Li ko li ser mirovan zilm hebe, li dijê wê derdikevin. Lê yên ku bi dil û can van çîrokan xwendine...»

Pirtûka Yaşar Kemal **“Baldakî Tuz— Xweya Di Nav Hengiv De”** di nav weşanên CANê de derketîye. Ev çapa 5'a ye ku hatiye çapkirin. 

EDEBIYAT Û BERHEMÊN NIVÎSKARÊN KLASÎK YÊN CÎHANÊ

Berhevkar : Z. ŞÊXMÛS

Edebiyat di hemû dewr û dewranan de ji bo guhartinên civakî rolekî mezin leyîstiyê û her tim tesîrek xwe li ser civakê hebûye. Edebiyata kurdî jî beşekê ji edebiyata cîhanê ye. Ew weke şûrekî tûj li ser singa dijminê ye. Edebiyat wisan jî çeka pêşkeftina guhartinên çandî û neteweyî ye. Pêşketina edebiyata kurdî bi gelemperî bi pirsra zanebûna edebiyata cîhanê û azadkirina welêt re girêdayî ye.

Edebiyata kurdî hatîye îzolekirin. Tiştên ku nivîskar û rewşenbîrên kurd ji cîhanê hîn bibin pir in. Yanê em dikarin jihevûdu fêrî tiştên bibin. Lê mijara vê nivîsê li ser epos, dîroka lîteraturê, meyl û stîl e.

Gelekî celebên edebiyatê hene. Lê di nav wan de du celebên sereke hene, ew jî ev in: Edebiyata perwerdekirinê (facklîteratur, pirtûkên dersan û hwd) û edebiyata neperwerdekirinê (roman, helbest, novell, şano...) Helbestekê pir anku hindik li ser fantaziya nivîskarî ava dibe. Lê pirtûkên dersan li ser fantaziya nivîskarî avanabin.

Gava mirov bixwaze behsa şaxên edebiyatê bike, hîngê sê nav tene ser zimanê mirovî, ew jî ev in:

1-Epîk: Poesiya devkî, hunergotin anku pexşan, destankî, desttanwarî, nesir ...

Berê: Çîrokên helbestkî
îro: Novell, roman...

2-Lîrîk: Nivîskarî(hozan, helbestvan) hest û xwestinên xwe anku yên kesên din dide der. Lîrîkê bingeha xwe ji poesiyê girtiye. Yanê mîrata poesiyê ye.

3-Dramatîk: Forma dîalogê ...

Lîteratura Mezobotamî, li ser hîmê lîrîkê şax daye.

Lê lîteratura yûnanî li ser epîkê avabûye.

700- 500- (700- 400) BZ:

Antîk

Peyva antîkê tê wateya kevn û navê dema kevn ya rojavayî ye. Ew dem bi eposa Homerosî ve dest pê dibe û bi têkçûna împêratoriya Romê ve dawî lê hat. Di vê demê de bingeha edebiyata ewrûpî ji aliyê nivîskarên yûnanî ve û paşê jî ji aliyê nivîskarên Romê ve hate avêtin. Edebiyata yûnanî di sala 400 ya Bz. de pir geş bû. Dramatîka yûnanî şax dabû, hem jî bi tragediyê. Herçiqas dîroka încîlê berê antîkê be jî; ew di wê demê pêşket û bû çavkaniyek ji yên herf mezin ji bo ewrûpiyan, ku drama, dema navîn(400-1500 -s PZ.) li ser nave-roka încîlê hate avakirin. Heger em dîsa vegehin ser edebiyata yûnanî ya epîkê, hîngê navê Homerosî tê ser

Edebiyat û Nivîskarên Klasîk

zimanê me. Navê herdu berhemên wî ev in: Îlîaden, Odîse. Ev herdu çîrok jî li ser kevneşopiya yûnanî ya tore û hîwûşiyê hatine nivîsandin.

Stîl û zimanê Hemerosî:

- Epît
- Hexameter
- Allegorî
- Xweşlihevhanîn
- Dubarkirin

600-s BZ: Lîrîk,

Sapfo: Lesbos

Navero

1. Epîgram
2. Helbestên polîtîkî
3. kûrlîrîkî (stran ji bo xwedeyan)
4. Suggestîf...

400 - s BZ: Dramatîk

Aîskîlosî Aîskîlos, Sofokles, Eurîpîdes Arîstofanes.

Aîskîlos: avakarê tragediyê ye.

berhema xwe li ser nakokî û xirûcîriya navbera mirov û yezdanan nivîsiye.

400-s BZ.

Sofoklos: Qiral Oyîdîpus, li ser eşqa du kesan e. Odîpus kurê Laîos û Lokastesî ye. Dilê Oîdîpus dikeve diya wî.

400-s BZ.

Eurîpîdus: Mediya

Bêbextiya eşqê, mêrê Mediyê dixwaze bi keçekê maldar re bizewice.

400-s BZ.

Arîstofanes: Ewr, Lîsîstrate.

Berhema wî ya binavê "Lîsîstrate", li ser organizekirin û dawihanîna şerê navbera Atenê û Sportayê ye.

Berhema wî ya din "Ewr" Behsa

fîlosofên navdar Sokratesî dike.

Lîteratura romanî

100 -s BZ:

Epoka Augustusî

Augustu li ser xalên jorîn radiweste.

-Polîtîka çandî

-Welatperwerî, mêranî û hezkirin ji bo welêt...

65-8- s BZ.

Horatîus: Oden

Wî Helbestên perwergeriyê û

heskirinê nivîsiye.. Ev nivîskar di bin hîkariya keyê Romaniyayê maye. Wî li gorî xwestin û daxwaza serokê dewletê nivîskariyê dikir.

70-s. BZ: Vergîlius Eposa neteweyî-Eneîden.

43- 17- s BZ: Ovîdîus Metamorfoz-novellên helbeskî-

1300-1500 :

Ronesans

Dante, Petrarca Boccaccio, Rabelaîs, Erasmus, Bruno.....

Navbenda ronesansa îtalî li Florensê bû. Ronesansa îtalî di sala 1300î de hate pê û di sala 1500- 1600î de li hemû Ewrûpayê belav bû. renesans, gotineke îtalî(latînî) ye ku tê wateya ji nûh bûyîn ve û vejîn. Di bingeha xwe de ji peyva "rînascîta"(rinascimento) tê. Bi gotineke din tê wateya ji nûh ve zayîn. Anku înriseyeke ji bo çanda yûnanî û romî. Mirov dikare bibêje çîhana kevnare xwe quliband ser dewr û dewranên nûh. Ronesansê çîhana kevn ku ji aliyê dîtinên teng ve

Edebiyat û Nivîskarên Klasîk

pêkhatibû pêçandin, çirand û cîhaneke nûh avakir. Berê ronesansê mirov ne mirov e. Çimkî mirov bi serê xwe nedihizrî . Ronesans azadiya mirovî wek mirovekî serbixwe hanî holê. Di wateya nûjen de ronesans vejîn û peydakirina kesaniya mirovî ye. Yanê kesaniyeke humanîst û mirovhez. Heger em behsa ronesansa kurdî bikin; . Nivîskar û rewşenbîrên kurd li Swêdê(li Ewrûpayê) tevgera çandî, şanoyî, sînemayî, hunerî, edebî û zimanê kurdî ûhwd. pêşxistine.

Dante: (1300-s): "Dîvîna Commerdiâ", stran

Petrarca: Laura, li ser eşqê ye.

Boccaccio: Decameron, novellên realist, eşqên piralî, li wir keşîş û kesên olperest hene. Sedemên dîrokî jî hene ew jî ev in: Heft jin û sê mîrên ciwan ji xelaya Florensê direvin, diçin gundekî û li wir li ser jiyana xwe dinivîsînin.

1300:

Chaucer : Berhema wî ya herî navdar "Canterburî Tales" e.

Novellên helbeskî(vers)(24 novellên vers nivîsîye.)

1400 :

Villon: Stran, kilam

Villon bi awayeke subjektîv berhemên xwe nivîsiye. Ew hevalên serxweş, xwîndar, henekok û dizekan bû.

1500: 1600

Rabelaîs (fransî)

Pênc pirtûkên li gargantua û kurê wî Partagruel nivîsîye.

Cervantes (Spanya)

Ew bi romana xwe ya bi navê " Don Quijote" navûdeng daye.

1600- s PZ:

Barock Stîrnheîelm, Bernînî... Peyva barockê ji . baroqueyê tê. Mirov dikare barockê wisan şirovebike:

1. Allegorî
2. Memento morî
3. Întrese ji bo tarîxê
4. Xemildariya peyvan
5. Bifikire tu dê bimirî.
6. Pîrxweşbûn û hestên hişk û zêde.
7. Dîtinên hişk, mîstîkî, tarî...
8. Wênepirî.

Perspektîfa ronahîkirinê.

Barockê formên renesansa îtalî bikardihanî.

1750- 1775:

Rokokon huner, konst fr.)Li Fransayê destpêkir û welatên din bando ra xwe kir.

Rokokon ji peyva fr. rocaçîllê tê.

1. Tiştên mekanîkî ên lîstokan
2. Şopa nerm û hêsan.

1750- 1800: Klasîzma nûh

Klasîzma nûh meyleke huner û lîteraturê bû. Mirov dixwest ku bide pey ronahî, harmonî û formxweşiya antîkê. . Klasîker nûh yên herî navdar ev in:

Tegner, Runeberg, Thorvaldsen...

Nivîskarên klasîzma nûh li ser girîngiya peyvên jorîn radiwestiyan:

1. Hêsanî, gengazî , neçetinî.
2. Bi hişkiya doxmatîk li pey şopa antîkê.

1700:

Destpêka romantîkî

Rouseseau, Goethe, Macpherson...
Rouseseau romana xwe ya herî navdar "Emîl" ku wî ew li ser perwerdekirin û mezinkirina zarokan nivîsiye.

Nivîskar bi taybetî li ser û giringbûn xweşbûna xwezayê radiweste. Bêşik gelekî berhemên wî yên din jî hene.

1800: Romantîk

Birayê Grîmm, Byron, Keats, Schîller, Goethe, Atterbom, Stagnelîus, Holderlîn, Poe, Vîctor Hugo...

Hinek ji van nivîskaran hem romantîker hem jî realîst bûn. V. Hugo wek nivîskarê romantîkî tê naskirin. Lê wî berhemên realîst jî nivîsiye.

Romantîker li ser peyvên jorîn radiwestin:

1. Hest (hîs)
2. Fantazî
3. Xwezayî(natur)
4. Hîstorîzm(dîrok)
5. Exotîzm
6. Pantelîzm
7. Jîndariya xwezayê

1800: Reyalîzm

Nivîskarên realîst berhemên xwe li ser temaya jiyana rojane avadikin. Bi gelemperî pirsên civakî, polîtîkî û hwd. dihanîn zimên. Di nav realîstan de yên herî navdar ev in: Dostojevki, Balzac, Tolstoj, Dîckens, Maksîm Gorkî û hwd.....

1860-1890:

Naturalîzm

Zola, Strîndberg, Maupassant...
Hinek nivîskarên naturalîzmê, hem realîst û hem jî sembolîst bûn. Strîndberg yek ji wan kesan bû. Ferqiya navbera realîst

û naturalîstan ev bû ku naturalîst bi metodên zanistî li probleman dinihêrtin. Wan xwe berdida bingeha probleman û lê dikolîyan. Berhe- ma Zola ya herî navdar " Karberdana ocaxa madenê" ye.

1700:

**Dema agehiyê-
(Upplysning, 1700-s)**

Locke, Volîtare, Rousseau...
Nivîskarên dema agehiyê çend peyvên giring didîtin, ew jî ev in:

1. Mirov dikare cihanê xweştir bike.
2. Renesans: li dijî desthilatdaran (auktorîteran)
3. Bawerî bi rastiya xwezayê...
4. Hizra antîkê li pêşerojê.
5. Tolerans.
6. Rationelîzm,
7. Utîlîzm
8. Emperîzm(serpêhatî, tecrube)
9. Deyîzm

1600:

Klasîzma Fransî

Lîtteretura klasîkî li Fransayê dest pê dike. Nivîskarên wê demê berhemên xwe mîna tore û helbestên yûnanî dikirin û şertên giran dida ber nivîskaran, ew şert jî ev in:

1. li gorî demê.

Edebiyat û Nivîskarên Klasîk

2. Lêhûrbûnê, hildestkirin.
3. Cîh û war. Lîtteratur divê tragedî anku komedî be.

Herçiqas navê Corneille û Racînf hat gotin jî hîmdarê Klasîka Fransî Boileau ye. Ew ji bo rêvekirina li kesan li ser peyvên jêrî radiweste.

1. Tehamul(tolerans)
2. Rasteqînî
3. Xwezayî
4. Formxweşî
5. Ronahîkirin

1500- 1600:

W. Shakespeare

Berhemên wî yên herî navdar ev in: Hamlet, Remoe û Julîet...

Avakarî û piralîbûna wî bûye sedemên matmayîna nivîskarên navdar. Ew çavnebarî û kumreşiyê dikin, dibêjin berhemên wî , ji aliyên hevalên ve hatine nivîsandin. Qey hevalên wî jê pêşvetir bûn ? Gengaz e ku ev pirs bersiva rastiya nivîskariya wî dide. Di berhemên wî de em rastî pîrsekê sereke tên, ew jî ev e:"

Karakterên kesên lîstikvan û armancên monologan çi ne? Sê tişt bersîva vê pîrsê didin ew jî ev in:

1. Bûyerên kesan.
2. Dengkirin, bi der û dora xwe re...
3. Monolog- kesên bêdeng in. Ew hest û dîtînen xwe yên hundirî dide der.

Ji bo têgihîştina naveroka berhemên Shakespeareyî divê zanebûna mirovî di derheqa şerê Troyayê de hebe.

Ji ber ku çavkaniyên BZ. giring in.

Em di bin hîkariya nivîskarên antîkê yên mîna Homeros, Sapfoyê de mane û me berhemên wan paşve wergerandiye. Shakespeare behsa şerê Troyayê û sedemên têkçûna wî dike. Wisan diyar e ku Shakespeare berhemên Homeros û çend kesên din xwendine û di bin hîkariya wan maye. Ew ne tenê di bin hîkariya nivîskarên yûnanî de maye.

Bi taybetî di bin hîkariya Homeros, Sofokles, Sapfo, Aîskîlos, Vergîlius û Chaucer, Bacon, Marlowe de maye. Heger wî naveroka pirtûkên Homerosî nexwendaye dê çawa navên Troilus û Cressîdayê nivîsiye. Cara pêşîn, Benoîyfî çîroka senantîkî ya şerê Troyayê bi eşqê ve girêdide. Di vî warî de, mora xwe li dîrokê dixê. Boccaccîo berhemên evîndariyê pêşxist, lê Chaucerî mora xwe li berhemên evîndariyê xist. Shakespeare dikaribû berhemên baş ji Chaucerî bigire, lê herwisn jî ji yên Lîdgates, Caxtonî jî, bigire ku wan nivîskaran çîrokên ku li ser şerê Troyayê hatibûn nivîsandin, komkiribûn. Ji ber ku şerê Troyayê pîr populer bû. Heger em dîsa vege- rin mijara xwe; Di berhemên Sha- kespeare de sîretên gernasên Home- rosî yên mîna Achîlles Patroclus û Thersîtes hebûn. Shakespeare, di demeke de ku dîtînen pîrcure derdi- ketin ser rûyê erdê, berhemên xwe nivîsiye. Çawa ku me li jorê jî got, di wê demê de dîtînen kevnerest di- hatin rexnekirin.

ANALÎZA

FÎLMA XWÎNÊ

M. BOZAN

Osman Şahîn filma xwînê kiriye pirtûk. Ev pirtûk li ser çîrok û senaryoya filmê ye.

Ji ber ku filma "Kan - Xwîn", an jî ev pirtûka li ser kurteçîrok û senaryoya filma Xwînê li ser bingeha jiyana kurd û Kurditanê ava bûye, min xwest ku xwendevanên me yên hêja ji vê agahdar bin.

Di filmê de sê tiştên bingehîn hene. Ew jî adetên kurd, tolhildan û tirs in. Camêrî, mêrxasî û li sozê xwedîderketin jî bi wan ve girêdayî derdikevin pêşiya mirovî.

Dibe ku xwendevan tirsê piçkî xerîb bibînin, lê bi rasfî, giraniya vê filmê û mesaja wê li ser tirsê ye. Çima tirs bûye jî sê tiştên bingehîn? Em ê bersiva vê pirsê di herikandina şîrovekirina filmê de bibînin.

1- Adetên kurd yên di filmê de derdikevin pêşiya me :

Dawetên bi def û zirnîk. Di vira de daweta sunnetê heye. Mehmûd Axa kurê xwe sunnet dike. Gazî hemû maqûlên kurdan yên li herêma dike. Di sîtilên mezin de xwarin çêdibin. Xort û keç dîlanê digirin. Mêhvan xelatan didin lêwik.

Daweta maqûlekî, bi maqûlî berdevam dike. Lê tiştê heye; xwediyê dawetê gazî Seyid Axayî nekiriye. Seyid Axa mirovekî girs û bi xof e. Piçkî dînok e jî. Mehmûd Axa, xediyê dawetê, bi zanebûn gazî wî nekiriye. Hevza xwe jî Seyid Axayî dike. Ji teşqeleyekê ditirse. Seyid Axa bihîstiyê ku dawet heye. Ew û kurê wî Kazim dikevin rê û diçin dawetê. Nêzî dawetê radiwestin. Seyid Axa debança xwe derdixê û çend derb berdide hewayê. Dawet radiweste. Mêhvan û mazûban tev li Seyid Axayî dinihêrin. Mehmûd Axa ditirse. Tîrsa wî jî ber derketina teşqeleyekê ye. Peyê xwe dişîne pêşiya Seyid Axayî û wî di ezibîne. Lê Seyid Axa dixwaze ku Mehmûd Axa bixwe were pêşiya wî. Mehmûd Axa diçe û bi rişma hespê Seyid Axayî digire û wî fîne. Ev yek ne li gorî adetê ye, lê jî Seyid Axayî re tiştêkî bi taybetî ye.

Seyid Axa tê rûtînê. Lê mîndera wî ku dane wî piçûk e. Li zora Seyid Axayî diçe. Mînderê davêje û perê xwe dixê bin çoka xwe. Bi vê yekê Mehmûd Axayî dide şermê. Ji ber

Analîza Fîlma Xwînê

ku armanca me ne nivîsandina çîroka fîlmê ye, em ê bi kurtî di ser dan û standinan de re derbas bibin:

Seyid Axa bi her tewr û hereketên xwe dixwaze Mehmûd Axayî biçûk bixe.

Du musabeqeyên di navbera xortan de heye di fîlmê de. Yek ji wan di nava avê de û bi hespan çêdibe û ya din jî cirîd e. Ew jî bi hespan çêdibe. Ev yek tiştekî nîşanî me dide. Di jiyana kurd de hesp cihekî girîng digire. Ji xwe gotineke heye ku têtê gotin; hesp, jin û çek....

Li ser vê yekê gotineke kurdan heye ku dibêjin: "Divête ku mirov destê xwe nede dûvê hespê, porê jinê û simbêlên meran." Ev her sê tişt bedelên giran bi xwe re fînin. Ji xwe avahîya fîlmê, li ser vê gotinê bilind dibe. Mirovekî dilxirab (ku di dîroka kurdan de hertim hebûne û eşîran berra hevdu dane) dûvê hespê Seyid Axayî jî kokê de jêdike û ji paşî de pê ve dadliqîne.

Li jor me behsa musabeqeyan kiribû. Di herdu musabeqeyan de jî kurê Mehmud Axa Battal, zora kurê Seyid Axa Kazimî dibe. Seyid Axa pê biçûk dikeve û ew bi xwe dixwaze bikeve cirîdê û bileyîze. Kes nikare wî rawestîne. Hespê xwe dixwaze. Hespê fînin û çî dibe, ew çax

çêdibe. Seyid Axa dibîne ku dûvê hespê jêkirîye. Mehmûd Axa dike nake Seyid Axa serwest nabe. Seyid Axa debançaxwe derdixe. Berê hespê, dûvre Mehmûd Axayî dikuje. Battal, kurê Mehmûd Axa, Seyid Axayî bikuje, lê maqûlên li wir nahêlin. Ji ber ku ne li gor adetên kurdan e.

2- Tolhildan:

Piştî demeke kurt Seyid Axayî dikujin. Her tişt bi dorê ye. Ev tolhildan di navbera eşîretên Seydo û Devecel de diçe û têtê. Hemû qaîdên tolhildanê pêk tên. Yek ji wan qaîdeyan jî ev e ku kes destê xwe nade jin û zarokan. Lê mixabin zarok û jin jî têtê kuştin. Ji ber ku çavê tivingan kor e. Lê car din jî ew eşîreta ku dibe katilê jin û zaroka li ber xwe dikeve, şerm dike. Kirinekî Battalî jî di be sedema li berxwe ketinê. Battal yekî dikuje û bi mirî dileyîze. Cendekê mirî serserkî bi darve dike. Hasilî, herdu eşîr jî hevdu pir mêran dikujin û her kes li dora mirina xwe ye.

Di vîra de mêranî jî xwe dide pêş. Carekê Kazim Battalî bi tenê digire. Battal cot dike. Dema ku hevûdu dibînin Battal bi mêranî xwe dixê ber cot û xwe bi erdê ve berdide. Kazim şaş û heyrî dimîne û Battalî

Analîza Fîlma Xwînê

nakuje. Car din Battal bi mêranî diçe heta ber deriyê Kazimî.

Tirs:

Di filmê de tirs, bi taybetî û bi zanebûn derdike pêş. Her mirov xwedî tirs e jî. Tirs mirinê û wekî din...

Kazim jî ber tirsê jî nava gund derdikeve û diçe cihekî dût. Lê Battal cihê wî dibîne. Tê heta ber deriyê Kazimî û qalibekî sabûn û kefenêke datîne ber deriyê wî û diçe. Ev bûyer tirsê Kazimî zêdetir dike. Dikeve nava xewn û xeyalan. Ji pirsê dipeyive. Jiyane li xwe jî, li jina xwe, Besrayê jî heram dike. Rola jinê di filmê de pir kêr e. Psîkolojîya jinê bi ya mêr ve girêdayî ye. Xweşî û nexweşîya wê jî.... Lê car din jî Besra dixwaze Kazimî veqerîne jiyane. Lê Kazim tirsê dixê navbera xwe û jina xwe jî. Hezkerin, evînî tev dikevin talda tirsê. Kazim jî tirsê xwe dixê paş heft qulan.

Dawî:

Şeveke bi baran e. Xurmîniya esmên e. Besra jîbîr kiriye ku kevirî dayne paş derî. Kazim dixwaze bi tevbîr be. Diçe ku kevirî dîne paş derî. Besra jî bi wî re diçe û di ber re jî behsa Battalî dike. Kazim naxwaze ku jina wî bi xirabî behsa

Battalî bike. Ji jina xwe re dibêje: "Neyar be jî Battal mêr e." çend tiştên din jî dibêje û pesnê Battalî dide. Tu nabêjî Battal jî li paş derî ye û li wan guhdarî dike. Bi van gotinên Kazimî re şa dibe. Êdî biryar dide ku vî şerî rawestîne. Qasekî din li deriyê wan dide. Derî vedibe. Herdu neyar çekên xwe davêjin û destên xwe dirêjî hevdu dikin. Me dawî li goriya pirtûkê nivîsiye. Dibe ku di navbera pirtûkê û filmê de cudahî hebe.

çend gotin:

Ev film beriya tekoşîna gelê kurd geş bibe hatiye kişandin. Ji wê demê û vir de li Kurdistanê pir tişt guherîne. Di navbera êl û eşîrên kurdan de tiştên weha êdî bi hêsanî çênabin. Şerê di navbera hêzên kurd û artêşa tirk de vê yekê pûç kiriye û avêtiye. Êdî gel di vî şerê dijwar de cihê xwe girtiye.

M. BOZAN
AV ZELAL BÛ
Cîld - 1
Weşanên Jîndan
Derket
Bixwînin

CÎHANA PIRTÛKÊN EDEBÎ
(Kovar û Pirtûkên Kurdî)
“ HEBÛN - Dîwan ”
Taha Mezher MAYÎ

Pirtûka helbestan e. Ji alî weşanên Medya ve hatiye weşandin. Ev pirtûk, pirtûka yekemîn e ku vê weşanxaneyê weşandiye. Di pirtûkê de, derheqê nivîskar Taha Mezher MAYÎ de tu agahdariyek nehatiye nivîsandin. Weşanxanê pêşgotinek nenivîsiye. Çapkirina pirtûkê bêqalîte ye. Baş zemaq nekirine. Pelên pirtûkê ji bergê jêdibe, derdikeve. Di pirtûkê de gelek şaşiyên rêzimanî jî hene. Ji alî nivîsandina teknîkî ve jî gelek çewtî hene. Yên ku pirtûkê di datayê de nivîsîne, piştê nivîsandinê qet qontrol nekirine.

Pirtûk 148 rûpel e. Di pirtûkê de 34 helbest hene. Helbestên evîni û welatparêzî ne. Hinek helbest xweş in. Lê gelek helbest jî li gor form û pîvana helbestê qels in. Mirov dikare bibêje ku qet helbest nînin.

Di nav helbestan de helbesta Ala Kurdî xweş e. Em vê helbestê livir diweşînin. Nivîskar vê helbesta xwe a bi navê “ALA” di sala 1943 an de nivîsiye. Helbest weha ye:
Kesk û sor e roj li nav e
spîye befra li welat

Rojeka per-zîv, belav e
wextekê zêrîn xelat

Hinde sor e xwîna Kurd e
Kesk jî dext e û gîya
Ala min herdem li jor e
şox dibin pê serçiya

Em dixaznin bo te îro
tu bi jî bo vî nijad
Helbikê keyfê bê giro
rabikê bivz û înad

Qiblegeha hemî Kurda
bêgoman herdem tuyî
Xemla banê xurt û merda
sor - gula baxê meyî

Çend dinêrim, tu bilindî
nagehim bême silav
Tu bi xude key tu bi merdî
bêle da ez bêm tewaf

Bo te (Mayî) her xebat e
nav û dengê te raket
Merg û jîna wî xelat e
hêj deynê te naraket

WERIN EM VÎ TIŞTÎ JÎ MUNAQEŞE BIKIN

B. ŞÎRO

Mirov tişteker meraq neke, li pey nakeve, li ser nafikire. Întresa mirovî bi tişteker re tune be, mirov qet tîkiliyê wî tiştî nabe. Her mirovek întresyê xwe yê cuda heye.

Mirovên ku ji xwendinê hez dikin, gelek bi balkêş li qalîta pirtûk û kovaran, li naveroka wan dinêrin. Ji bo wan ev tişt gelek girîng in. Lê mirovên ku ji xwendinê hez nekin, nexwînin, bi wan re kultura rojname û kovar xwendinê tune be, ji bo wan rojname an kovarek çawan e, bi naveroka xwe xurt e, an qels e, mîzampaja wê baş an xirab hatiye çêkirin qet girîng nîn e.

Di jiyana mirovî de întresa mirovî ya li hember tiştan girîng e. Întresa min, an jî bi gotinekê vekirî hezkirina min ji xwendinê re gelek heye. Pirtûk, kovar û rojname hevalên min ên yekemîn in. Pêwîstiya wan ji bo min, wek nan û avê ye, wek kişandina cixarê ye.

Ev bîst sal e ku ez hemû kovar û rojnameyên Kurdan dixwînim. Çiqas pirtûk, kovar û rojnameyên

Kurdî û yên Kurdan ên bi Tirkî derketine hejmar bi hejmar min xwendîye û hêj jî ez vê xwendina xwe berdewam dikim. Niha jî ez hemû kovar û rojnameyên hemû partî û rêxistinên Kurdan dikirim û dixwînim. Ji sala 1979an virve, bi giranî jî ji sala 1984an ta îro di gelek kovar û rojnameyên Kurdî û yên Kurdan ên bi Tirkî de gelek nivîsên min hatin weşandinê. Hêj jî di gelek kovarên cure de nivîsên min tene weşandin.

Di vê pêvajoya jiyana weşanî de tişteker gelek bala min kişand. Min meraq kir, ez li ser fikirîyam û loma min vê nivîsê nivîsand. Bi nêrîna min, gelek tiştên Kurdan wek kirinên Melayê meşûr in, kes zû bi zû jê fêhm nake. Kurd wexta ku qels in, jîr in, wexta ku xurt in, bi hêz in ne jîr in, tiral in. Ez çend mînakên bidim: Partî û rêxistinên Kurdan wexta ku bi serê xwe kovar an rojname derdixin, kovar û rojnameyên wan baş in, hinek jê ji alî naveroka xwe ve jî gelek dewlemend in. Lê gava ku tîr

Munaqêşe bikin

cem hev û bi hev re kovar an jî rojnameyek derdixin, ew kovar û rojnameyên wan gelek qels in, ji yê wanên berê bi her awayî paşvetir in.


Wek têt zanîn di wan salên çûyîn de 5-6 partî û rêxistinên Kurd hatin cem hev bi hev re li gor hinekan cephe, li gor hinekên din jî Hevkarî çêkirin û bi navê “**Tevger**” rojnameyek weşandin. Wexta ku van partî û rêxistinan bi hev re, bi şîrîgatî -ortaxî- rojnameya “**Tevger**”ê derdixistin, wê gavê kovar û rojnameyên xwe -yên partî û rêxistinên xwe- jî derdixistin. Rojnameya “**Tevger**” jî hemû kovar û rojnameyên wan partî û rêxistinan qelstir bû. Hem ji hêla naveroka xwe ve, hem ji hêla mîzampajê ve, hem jî ji hêla teknîka çapê ve ji kovar û rojnameyên din paşvetir bû.

Kovara **Hevdem** jî weha bû. Ji çend alîyan ve li ser hev kom bûn û kovara **Hevdemê** derxistin, lê ev kovar ji yê berê ku wan koman bi serê xwe derdixistin qelstir bû. Du kovarên cuda bûn yek û bi navê “**Hêviya Gel**” kovarek nûh derxistin, lê kovara “**Hêviya Gel**” jî herdu kovarên berê qelstir bû.

Vê demê dawiyê rojnameya hefteyî “**ROJ**” derket. Hinek hejmarên wê ne tede, lê bi pirranî hejmarên wê ji yê kovar û rojnameyên ku mil dane **Rojê** qelstir e. Rojnameya “**Jiyana Nû**” jî alî na-

verok û teknîka mîzampajê ve ji **Rojê** baştir bû. Rojnameya “**Medya Guneşî**” jî alî nivîs û şîroveyên sîyasî ve ji **Rojê** dewlemendtir bû. “**Vatan Guneşî**” û “**Serketin**” jî alî nivîsên teorîk-polîtîk ve ji **Rojê** xurttir bûn.

Gelo ev tişt çima weha dibe. Belkî jî kultura şîrîkatiyê di nav kurdan de tune ye. Yan jî Kurd fêrê xebata kolektîfîzmê nebûne, yan jî tiştan hêviya hev û du dihêlin, an jî çî? Gelî xwendevan hûn çî dibêjin? De werin em vî tiştî jî munaqêşe bikin. Lê divê munaqêşe ne ji alî sîyasî ve bê kirin, ji alî kulturî ve bê kirin. Helwestên weha bi çandê ve girêdayî ne. Gava mirov binê tiştên weha dikole kultur derdikeve pêşberê mirovî. Di çanda hemû gelên cîhanê de tiştên, ananeyên, tradîsionên pozîtîf û yê negatîf hene. Di her kulturî de tiştên baş û xirab, tevgerên pêşverû û paşverû, tiştên pozîtîf û negatîf hene. Di nav civakê de hinek tişt diqewimin bi kulturê ve girêdayî ne. Li gorî kultura demokrasîyê civaka Kurd û hemû civakên rojhelata navîn binirxînin, binêrin çî derdikevê pêşberê we?

Kultura bi hevdu re karkirinê, kultura biratiyê, dostaniyê, alîkariyê çiqas bi Kurdan re heye? Divê bê nirxandin û li ser vê tiştî guftûgo bêkin, lêkolînên îlmî bîne weşandin. 

Di Kovar û Rojnameyên Kurdan de DANASÎNA KOVARA HELWESTÊ

Kovareke nû: HELWEST

Kovara **HELWEST** 52 rûpel e. Bergeya pašîn bi wêne ye. Kovar, li ser navê Weşanxaneyê Çanda Nûjen û ji sê mehan careke dê derbikeve. Birêvebirê kovarê Lokman POLAT e. Helwest, kovareke Çandî û edebî ye. Hejmara ku di destê min de hejmara yekemîn e. Ev hejmar di meha îlonê (meha nehan, 1995) de derketiye. Li gorî şaxên edebî yê taybetî weşandina kovarên wisan karekî hêja û giranbiha ye.

Di kovarê de, weha hatîye nivîsandin; "Çawan ku kovara "Şano û Sînema" kovara "Berhem" û kovara "Nûdem" li gor şaxên xwe kovarên taybetî ne, kovara **Helwestê** jî dê li gor xwe kovarek li ser hîmên rexnegiriyê û munaqêşê kovarek taybetî be."Roj bi roj hejmara weşanên kurdî zêdetir dibe û ber bi avakirinê diçe.

Weşanên neteweyên ku xwediyê dewlet in pir in. Herwisan jî li gorî her mijarê weşanên wan hene. Lê kovarên me kurdan hem kovarên siyâsî ne, hem jî edebî ne û hem jî çandî ne. Di van salên dawiyê de bi derketina kovara Şano û

Sînema hinek zelalî çêbû. Yanê kovara "Şano û Sînema li ser xeta xwe diçe. Kovara **HELWEST**, di vê hejmara xwe de piraniya rûpelên xwe, ji pirsên rexnegiriyê re veqetandîye. Kovara **Helwestê** jî aliyê naveroka xwe ve, jî kovarên din cihê ye. Birêvebirê kovarê diyar dike ku ew bi piranî nivîsên munaqêşe û rexnegiriyê diweşîne. Di hejmara yekemîn de nivîsên nerexnegiriyê jî hene. Kovar jî derê rexne û munaqêşeyê nivîsên fêrbûna lîteratura edebî jî diweşîn e. Naveroka kovara **HELWEST** bi gelemperî li ser rexnegirî û berhemên klasîk e. Kovar, bi nivîsên pîrcure ve hatîye honandin û xemilandin. Ev kovar valahîyekê tijî dike, jî aliyê din ve, dê mîna çekekî li ser singa dijmînê be. Ji ber ku çand û edebiyat, di şerê neteweya kurd de ciyekî giring digire. Divê em bi vî çavî li kovara **HELWEST** binêrin. Bi gotineke din, divê kes vî karî piçûk nebîne. Ev karekî mezin û giranbiha ye, hem jî pir mezin e. Nivîskarên kurd li Swêdê pênûsên xwe mîna şûrê Hazretî Elî tûj kirine û pê şer dikin. Yek ji wan pênûsûran jî Lokman POLAT e, ku birêvebirê kovarê ye,

Danasîna Kovara Helwestê

ku ew di gelek kovar û rojnameyên kurdî de dinivîsîne.

Kovara **Helwestê**, li ser mijara rexnegiriyê radiweste û belavkirina metoda rexnegiriyê ji xwe re bingeh digire. Bêrexne edebiyat û çanda kurdî pêş nakeve. Birêvebirê kovarê Lokman Polat weha dibêje: " Edebiyat bi rexne xurt dibe, dewlemend dibe. Rexneyên pircure hene. Rexneyên pûç û vala, rexneyên xerabkirinê, tu fedeyê nade edebiyat û hunerê." Weke tê diyarkirin rexneyên hîsî(hestî) û subjektîf tu sûdê nade edebiyatê. Lê rexneyên zanistî û objektîf rê vedike ji bo pêşveçûna edebiyata kurdî. Di karê edebiyatê de rexnegirî karekî sereke ye. Bêrexnegirî çand û edebiyat pêşve naçe. Li hemû welatên paşvemayî kesê rexnegir mîna kesekî nedost tê dîtin. Bi bîrûbaweriya min, mirov dikare bi metodên baş rexnegiriyê bi nivîskarên kurd şêrîn bike. Divê mirov pirtûkeke baş, ku mirov jê hez bike hilbijêre û aliyên pirtûkên yê baş derbixe pêş û aliyên wê yê çewî û kêmaniyê wê îndîrek binirxîne û hevî bike ku , ew aliyên ku çewî û kêmasî têde hene ji holê rabe û careke din baştir bibe. Divê rexne îndîrekt bin. Bi gotineke din rexneyên rasto-rasto cîhana nivîskarî dihejîne û tu fede

jî nade edebiyata kurdî. Niha rexne tal e, tîrş e û kesê rexnegir dijmîn e. Lê bi hawayekî çêker li ser mijara rexnegiriyê bê rawestandî, dê rexnegir jî mîna kesekî dost û mirovhez bête pejirandin. Ev kovara ku, di destê min de bersîva vê demê dide û neşterê li vê mijara rexnegiriyê dixe û bala xwendevanan dikişîne ser pêwîstiya rexnegiriyê. Bi hêviya ku ev kovar rexnegiriyê şêrîn bike, ez ji kovara **Helwestê** re di jiyana weşanê de serkeftinê dixwazim. Nivîsên ku di vê hejmarê de hene, ev in: Rexneyên Edebî û Valahiya Rexnegiriyê- Lokman POLAT, nivîsek balkêş e, li ser pêwîstiya rexnegiriyê radiwest e. Huner û Pêvajoya Nû - N. Zaxûranî, Muzîka Kurdî- Senar ŞAHÎN, Rewşa Nivîskarên Kurd- Cîhan DİLŞAD, BEXÇEYÊ EVÎNÊ- BAWER DELÎL, M. Emîn BOZARSLAN Û BERHEMÊN Wî, Postmodernîzm- Burhan Gunel, Hîmdarê Edebiyata Kurdî- M. YILMAZ, Ziman û Zimanê Kurdî- Sîpan-Medenî Ferho, Nivîskarî û Berpirsiyarî- Z: ŞÊXMÛS û ji bo Nameyên xwendevanan, û Xelata Kurteçîroka Kurdî.

Merwan JÎNDAN

Têbinî: Ev nivîs di rojnameya ROJ û WELATÊ ME de hate weşandin.

ÇEND PIRS JI BO NIVÎSKARIYÊ

Em van pirsên xwe yên li jêr ji hemû nivîskaran pirs dikin. Me ew pirs bi xisûsî -taybetî- ji tu nivîskarek re neşîyandiye, em neçûn me li cem tu nivîskarek hevpeyvîn jî çênekir. Pirsên me bi gelemperî ji bo hemû nivîskaranin. Yên ku xwe nivîskar dibînin, divê van pirsan bibersivînin. Pirs bi rewşa wan ya nivîskariyê ve girêda ye. Divê ew bersivên wan pirsan bidin ku, xwendevan wan baş binase. Bersivên ku ji kovara Helwestê re bèn, em dê dor bi dor biweşînin.

Kovara Helwest, bi van pirsan dixwaze nêrînên nivîskarên Kurd ji raya giştî re dîyar bike. Gelek nivîskarên nûh hene ku nikarin nêrînê xwe bi hawayekî azad di kovar û rojnameyên heyî de dîyar bikin. Ji xwe gelek rojname û kovar nivîsên van nivîskarên Kurd yên nûh ku xwerû bi Kurdî dinivîsînin, naweşînin. Kovara Helwest, dê di jîyana xwe ya weşanê de bi giranî nivîs û berhemên van nivîskarên nûh biweşîne. Rûpelên kovara Helwestê hertim ji nivîskarên nûh re vekirî ye.

Çend pirsên me ji bo nivîskaran ev in:

- 1— Nivîskarî çî ye?
- 2— Ji bo çî mirov dibe nivîskar?
- 3— Pîvanên nivîskariyê -li gor we- çî ne?
- 4— Berpirsiyarîyên nivîskariyê çî ne?
- 5— Rewşa aborî û bûyerên civakî li ser xebat û helwêsta nivîskar tesîrek çawan dike?
- 6— Hûn xwe nivîskarek çawan dibînin? Nivîskarekî amator, normal an profesyonel?
- 7— Hûn dikarin qala-behsa- xebata xwe ya nivîskariyê bikin? Hûn di kîjan beşî de berhem diafirînin?
- 8— Ji bo xebata pêşerojê hûn ji nivîskarên Kurd çî hêvî dikin?
- 9— Ji bo weşandina kovara Helwestê dîtinên we çî ne? Kovarek weha ku di gelek warî de muneqeseyan veke pêwîst bû, an na? Hûn ji bo “Kovarek muneqeşe û rexneyan divê çawan be?” Dikarin nêrîn û pêşniyazên xwe bibêjin?
- 10— Ji bo destpêkirina muneqeseyên li ser mijarên cuda divê kovara Helwest metodek çawan bi kar bîne ku muneqeşe geş bibin?
- 11— Muneqeseyên li ser çand û edebiyata Kurdî gelek kêr in. Hûn bixwe dixwazin li ser tiştekî, pirseke çandî, edebî muneqeseyekî nûh vekin? Ji bo destpêkirina muneqeşê hûn dikarin nivîsek muneqeseyê binivîsînin û dest bi muneqeşê bikin? ❧

Kovara Helwest

ANTOLOJIYA EDEBIYATA KURDÎ

Amadekar : Mehmed UZUN

Derket

Bixwînin / Bidin Xwendin

NAMÛSA ÊMO

Kurteçîrok

Şahînê Bekirê Soreklî

Weşanên HAYKURD

SÎNOR

Roman

Xurşîd Mîrzengî

Weşanên JÎNDAN

Bi Pêşgotina Mehmed UZUN

EVÎNDAR

Lokman POLAT

Derdikeve

Weşanên Çanda Nûjen



HELWEST
Kovara Çand û Edebiyata Kurdî
Hejmar / No: 2 — Sal / Year:1995



Lokman POLAT

EVÎN Û JIYAN

Derket / Bixwînin
Weşanên Çanda Nûjen



Helwest = ISSN - 1400 - 9404

Helwest - Hejmar / No: 2 Sal / Year : 1995